

**MEDENİ FERHO**

# BERXWEDAN JİYAN E

ABeCe // roman

www.arsivakurd.org

medeni ferho

# BERXWEDAN JIYAN E

www.arsivakurd.org

weşanên ABeCe
ABeCe yayınları

weşanên ABeCe : 3
çapa yekem 1994

medeni ferho
Adres : Brusselsestenweg, 638
1731 ZELLIK (Asse)
BELÇIKA

wêne yê berge: **JAZA BAKIR**
pergala berg û rûpelan: ABeCe

D/1994/6605/3

www.arsivakurd.org

# berxwedan
# jiyan e

roman

Leuven 1994

www.arsivakurd.org

## pirtûkên medeni ferho

| | |
|---|---|
| Toprağın Türküsü | -helbest/bi Tirkî |
| Kaytan Osman | -çîrok/bi Tirkî |
| Mapusluk Gerçeğim | -helbest/bi Tirkî |
| Hades Iş Başinda (Yaşam Tutsak Ben Tutsak) | -romana girtin û perçiqandinê/bi Tirkî |
| Beranê Kozî | -çîroka dirêj/bi Kurdî |
| Hey Gerîlla | -Helbest/bi Kurdî |
| Berxwedan Jiyan e | -mîtolojî/ bi Kurdî |

www.arsivakurd.org

doza mezin, xebata mezin û xurt
di xwazê. Doz mezin, xebat û daxwaz
biçuk tiştekî na bêjê hev. Tiştekî jî
safî nakê. Divê xwediyê dozê mezin, kûr
û dûr bifikirê. Lê ji wê re jî, merivên mêr û
nêrên xwe bidê ber kêr lazim in.

**Hiseynê FERHO**

www.arsivakurd.org

Nîvro ye!....

Şaxên rojê li ser ruwê erdê pelax bû ne.

Kelkela Havînî ye!... Germ e!... Bênder li erdê ne!...

Qendê gund, weke her roj, li binê dara tuwê av reşandiye... Merşika xwe du tawî raxistiye... Doşeka xwe li anîşka merşikê daniye... Bi tihelkê pal daye ser balgihê xwe. Dara tuwê di ber hêtê dergeh de, li gora nîvaniya hewşê bilind, têr talan, miqambilî bendera wî ye. Hin guhdarê bênderê ye, bo sewal ne kevinê de!... Hin li bin siha darê ji xwe re di rewşa cîhanê di fikirê... Hewş sedik erd heye. Fere, pêgiha wê berdayî, di ser gund re ye. Dora wê bi kevira nijinandiye. Qend di dema kamla xwe de binê darê li kabokê bi kevira li gora dilê xwe bilind nijinandibû. Ser bi zixuran, ser zixuran jî bi ferşikan qenc rast kiribû. Bi roja ji wan teyarê binya gund ax bêjink kir û kişand, heya li gorî dilê xwe sê cara li ser hevûdin seyand. Qatê pêşî ax têr qarsele kir, qatê duduwan bi ka habûbiyan, ya dawî xuru bi axa

têr nikar bi hostayiyeke têr sebir û têr ked seyand. Havînî her roj, bi hînkaya serê sibehî re dora tuwê têr av dikir. Ku roj kete dora nîvro, car din avreşandî dikir û di runiştt. Pirraniya caran li wêderê firavîn dixwar. Siha tuwê hînik bû. Qerebalixa zarokan, ya jin û dotan tune bû. Ji hindirû çêtir e. Hindirû kebs e. Derve vekiriye, ba nerme nerme tê, xweş e. Bêhna wî çêtir derdiket... Kar û barê Qandê gund tune ye. Bes aqil didê, guhdariya şikestîkan dikê, şîret û dîtina di bêjê. Yextiyar bû ye. Sal li ser hevûdin kirine şikêr. Lê hê li ser xwe ye. Ne ketiye ber destan. Hewceyiya xwe teva ew dibînê. Serê wî di berdeye. Kopalê xwe hurik hurik li erdê dixê... Cihê derbê
kopalê wî di erdê de kûr bû ye. Sewîlkê ava wî, di nav kûlavê şilkirî de, li kêleka wî ye. Kûlavê li dora sewîlk pêçayî, têr av e, na hêlê germ bibê. Çawa ji çalê kişandiye wilo sar e.

Car cara serê xwe hurik hurik di hejand.

Serpêhatî û salifên hatî serê kurebavan di hatin bîra wî. Kûr di fikirî, dûr di nêrî!...

Ji nişkê de çar-pênc zarok li cem sekinîn.

Yek ji wan nebîyê wî bû.

Çawa gihane cem, nebîyê wî dest bi axaftinê kir:

-Kalo!... Ez di bêjim, ev zarok ji min bawer nakin.

Qend hêdî hêdî serê xwe rakir....

-Tu çi di bêjê, hevalên te ji te bawer nakin?

Nebî hat û li ber sekinî.

-Kalo, ez di bêjim Çûkê Beytik qeydûmarbet

kirî ye. Ew dibêjin na!...

Ronahiyek pirr geş hat li rûwê Qend rûnişt.

Beşişî!...

Ji wan û wê de Çûkê Beytik, her du lingê xwe bi cotik tavêtin û di çû dihat. Li nêçîrê di geriya.

Qend yek bi yek li zarokan nêrî...

Çavên Qend di çû ser kîjan zarokê, weke ku li cîhaneke nûh bi nêrê. Şahî dikete ser dilê wî de.

Pirr kêfa wî ji zarokan re di hat.

Tim di gote serdorên xwe, zarok fêkîyê jîyanê ne!...

Reşka çavên wî di reqisîn. Pirr dilşa bû.

Bi nermî bakire wan.

Dengê wî ji nava salên kûr û kevnare der di ket.

-Werin, werin li rex Kalê xwe rûnin, bo ji wer salifa Siltan Silêman û Çûkê Beytik bêjê. Salifeke pirr xweş e. Gere Kurd teva vê salifê dizanibin. Exlebe hûn zarok. Hêvî û hawar hûn in.

Qend, lingê xwe ber bi xwe kişandin. Çarmêrkî rûnişt. Mîna merivên mezin qedir da wan. Cihê rûniştinê ji wan re vekir. Bi destên xwe cî şanî wan da.

Zarok li tişteki wilo di geriyan.

Bi lez û kêf li dora Qend rûniştin.

Ji her merivî re nabê qismet, bo li kêleka Qend rûnê, li salife û serpêhatiyê wî guhdarî bikê. Ji şîret û galgalên wî agahdar bibê, aqil bigrê, fêdê bibînê.

Lê niha, wî bi xwe bakire wan, bi devê xwe, wî bi xwe cihê rûniştinê şanî wan da. Got, ezê ji we re salifê bêjim. Pirr kêfa wan hat. Bi bez rûniştin.

Qend yek bi yek li halê wan pirsî. Navê wan fêr bû û dest bi axaftinê kir.

Kopalê xwe bi aliyê Çûkê Beytik ve dirêj kir.

-Dêhnê xwe bidin wî çûkê ha!...

Zarokan bi derbekê re serê xwe zîvirand. Li Çûk nêrîn. Çûkê Beytik bû. Weke waqqas Çûkên din... Dawî Çûkê Beytik bû, her roj, her car, her gav û saet di dîtin, tu ferqî di wan carê din û niha de nebû. Serê xwe dibir û tanî, xwe ji vir zerî dera din dikir, car cara niklê xwe li nava zûrik û axê dida. Ji xwer li xwarinê di geriya. Nêçîr dikir. Hewqas!.. Ku ne li cem Qend ba ne, her yeki ji dehma xwe de wî rahêjin kûçekî, segvaniya xwe bi ceribênê. Belkî çûk kuştibane jî. Lê Qend li ser rawîran di xeyidî. Exlebe li ser çûkan. Di got: Çûk, bang û deng û şenga xuzeyî ne, nîşaniya azadiyê ne. Yek ji wan metrozîyekê bikê, çîrok jî çû, rûniştina tenişta Qend jî çû. Wê qeherê, wê aciz bê, wê berdê wan ji cem xwe, hew salifa Çûkê Beytik jî di bêjê.

Bi çavên vala li çûk û Qend nêrîn.

Zarok di kula salifê de bûn. Qet hajê wan ji Çûkên Beytik û ferîqeta wî tune bû. Li devê Qend nêrîn.

Qend tê gihişt. Dengê xwe nekir.

Lê car din, berê hewnê wan da çûk.

-Dêhnê xwe bidine rêve çûna wî. Çûk teva mîna wî çûkî gavên xwe navêjin. Bes Çûkê Beytik lingên xwe bi cot tavêjê. Xwe di hildê, xwe di qevêzê. Weke ku di pekê... We dît?... We qenc dêhnê

xwe dayê?...

Qend her du tilîyên destê rastê dirêjî erdê kir in. Sekinî, yek bi yek li zarokan nêrî.

-Li telîyên min bi nêrin. Çûk teva wilo di meşin.

Teliyên xwe li duv hevûdin meşandin. Car din destê xwe anî cihê berê.

-Çûkê Beytik jî wilo bi rê ve diçê.

Telîyên xwe bi hevre, cotik bi qevaztin avêtin. Carek, dudu, sisê!..

Zarokan çav li dest û teliyên Qend kirin xarr. Wextê Qend destê xwe ji erdê rakir, zarokan bi derbekê re, berê xwe da ne Çûkê Beytik. Lê nêrîn...

Çûkê Beytik lez dikir. Ji vir di pekî dera din. Serê xwe di vir de bi wir de di bir û tanî. Çavên wî weke du xarikên zazîk biçûk ha ha di geriyan. Li libek zad, li kurmikekî, li kêzikekê!..

Qend kêlîkê sekinî, dest bi salifa xwe kir.



www.arsivakurd.org

X X

X

Dem û dewranê berê!...

Di wextên salê Zivistanî de....

Wan şevên dirêj... Li nava civatên di kuçk û dîwanê kurebavan de, çîrokvan û dengbêjên ji xwe qayîl di rûniştin!... Bo wensa merivan bênin... Çîrok û salife, serpêhatî û dabaşên berê têr şîret in. Meriv ji wan aqil di girê. Neynika tevgera merivan e. Firaze paqij çê nabê. Helbet lib û simbil ji ber dest û dasa palevaniya di filitin. Liqat ew neynik e. Berhevkirin ew aqil e. Aqil û hewn ji ber xwe na kevê serê merivan de. Divê ber hev bibê. Bez û ked lazim e. Xîret hebê!... Bê ked tiştek nayê dest meriv. Bê xîret û bedel jî tiştek nayê destên meriv. Jiyan xwe hêsanî berdest nakê. Lê ku ked hate rijandin, jiyan bixwe xwe berdest dikê. Ku meriv bû palê xîretê, jîyan dergehên rumetê, dergehên xîretê divekê. Lê, berî her tiştî divê qenc û xerab ji hevûdin bê wejartin. Qenc û xerab bi hevûdin re na çê. Hev qebûl nakin. Ya qenc xwedî gotin û qerar e, yan jî xerab. Merivên ked helal, xwedî xîret palê qenciyê, palê rastiyê ne. Cîhan jî bi xêra kesên wilo ciwamêr li ser piya di mênê.



www.arsivakurd.org

Emanetê min li we, palê xerabûnê her tim ji ê avabûnê bêhtir in, heya ku ji we bê, daxwaza kalê we ji we, hûn di umrê xwe yên dirêj de bibine palê avabûnê, yê qenciyê, her tim xêrê bi xwazin. Bo qencî û xêr bê rêya we. Bi xîret û xwedî ked bin.

Erêêê, gelî zarokan:

Hebû tune bû, ji Xwedê mezintir tune bû.

Di bêjin Siltanek hebû...

Navê wî Siltan Silêman bû.

Hakimê Cîhanê bû. Ê erd û avê!..

Ê meriv û cina!... Ê teyrik û tûrikan!... Ê rawîrên bej û nava avê!... Asil ew bû. Ku Cîhan, bi mal û mewdan teve, kiribane nava hêkekê, ew hêk jî li erdê dabane, kesî nikarîbû di devê wî de bêjê qey, çima. Gotina wî destûr bû. Galgalên wî ferman bûn. Xwedî leşker, xwedî wezîr, xwedî al û dahol û boriyên komê bû.

Siltan Silêman qencek ji ê Xwedê bû.

Xwedê, mecal û ferece dabûyê de.

Kilîta devê wî vekir bû. Bi her zimanî şor dikir. Çiqas ziman li ser ruwê erdê hene; bê çiqas şiklên bi can hene; meriv, cin, teyrik û tûrik, rawîrên bej û nava avê, kurmik û kêzik, bi zimanê wan zanîbû. Bi teva re di axift.

Ji merivan: Sor û zer û reş û sipî!..

Ji cinan: Bende û hefrît û mîr!..

Ji teyrik û tûrikan: Ji Teyrê Simur heya bi Çûkên Beytik!..

Ji rawîrên bejê: Ji Kerkidan heya bi Mîrowan û Gumgumokan!..

Ji rawîrên nava avê: Ji Gamasî heya bi Req û Beqê!..

Bi teva re şor dikir.

Axir!... Ez çi serê we ne êşênim!..

Siltan Silêman keça Mîrê Cina jî ji xwere anî bû.

Navê wê Belkîs e!.. Jinek pirr delal e!... Gerden gaz e!... Bejin zirav e!... Çav reş û deng baz e!... Gewr e, parçek ji heyva li çardeha ye!... Nazik e, nazenîn e!... Şêrîn e!... Ziman xweş e!... Şahreza ye!...

Xatûna Belqîs ne hindik e... Keça Mîrê Cina ye... Hikim li hefrît û xewasên cin î bikê. Ku dengê xwe di kir, heya çavên xwe miç û bel dikê; şîrê şêr di eyarê şêr de bê jî, li ber destên wê hazir e. Di devê wê de na tune ye. Bo wê, neçarî çê na bê.

Ziman xweş û pişt hişk e.

Siltan Silêman û xatûna xwe Belkîs, Keça Mîrê Cina, mil da ne hevûdin û hikmê xwe di meşênin. Li ser rûwê erdê... Li bin rûwê erdê... Li hewa û nava avê... Kes bêyî wan nikarê tiştekî bikê...

Leşkerê wan ji merivan teva mêrxas û pêlewan û cengawer in. Ji cina teva Hefrît û xewas in... Ji teyrik û tûrikan Teyrên Baz û Başoke û Kewê Ribat e... Ji rawîrên erdê, Mar û Dûbişk û Ziha ne... Kerkidan, fîl, şêr û piling, heya bi mîrowa ne... Rawîrên avî: Babilyon, gamasî, raq û kêvjalên çilşaxî ne...

Ku daholê lê da, boriyan deng da, ji erd û azman, ji bej û nava avê teva li hevûdin digihine hev. Rawîr, cin, meriv mil didine hevûdin. Li devê Siltan

Silêman di nêrin. Berê wan bidê ser çi, na tuneye. Kelih, bajar, dewlet!... Di bîstûçar saetan de safî dikin. Derya bê, bej bê, çiya, gelî mesîl bê, çi bikevê ber himbêza wan, sekin çê na bê.

Rojekê ji rojên Xwedê, Xatûna Belkîs xwe nexweş kir. Bi axên û nalên kete nava livîna de. Bû ax-ax û zûr-zûra wê, bû nal-nal û bar-bara wê!.. Qîrênê wê li erşê hefta disekinê!.. Heydênî li xizmetçî, berdestîk û qerqaşan ket. Qiyamet rabû!... Her kesî bi deverekê de revîn, hawar gihandine kes û kûsan. Ber bi dîwana Siltan bezîn, hawar gihandine wî jî.

Bû haw-haw û şaw-şaw, qîr û qîyamet, dê weledê xwe avêt. Hina kire hawar, hina şînik kir, hina weyn kir, dilo jarê got. Wey li wî ku dengê xwe bi ser ê din bixê. Bi hawar û gaziyên berdestîk û xizmetçiyan re Siltan Silêman û serdorên xwe bezin. Wezîr bûn, hekîm bû, aqilmend bûn, cengawer û pêlewan bûn, fêris û agît bûn!... Bekçî û qirdik û zirtek bûn!... Bi yek carê bezîn ber bi aliyê malê...

Teva, çûn li devê derî sekinîn. Kes nekete hindirû. Hekîman xwe da pêş!... Berî ku Siltan Silêman bêjê, derbas ne bûne hindirû. Edeb û tol di meşandin. Wan kes û kûsên din jî xwe helicand. Exlebe, qirdik û zirtekan!... Bo bikevine darî çavên Siltan û Key Banû de!... Heya ji wan dihat li nav ser û guhên xwe didan, di kirin halama û car-bar!... Kesî li wan guhdarî ne dikir. Di gihane cem kê dafek li wan didan. Lê wezîran, aqilmendan û hekîman, bo



www.arsivakurd.org

arîkarîyekê, bo dermanekî, bo aqilekî, şîretekê bi maqûltî xwe didane pêş. Çawa Siltan Silêman kete hindirû, Key Belkîs dengê xwe li berdestîkan kir, derî da dadan. Ku derî hat e dadan, Xatûna Belkîs xwe qenc bêhal kir û naland.

Hekîman qasid şand qebûl nekir.

Aqilmendan qasid şand qebûl nekir.

Wezîr wilo!...

Heçî zirtek û qirdik bûn bê bakirina Key Banû, ne wêrabûn bi wan serdoran bikevin. Dur dur diçûne vî rexî û rexê din.

Key Banû serdorên xwe qenc vala kirin.

Ku ma ew û Siltan Silêman xwe kelogirî kir û got:

-Siltanê min, ne hewceyî hekîm û aqilmenda ye. Ez bi êşa xwe dizanim.

Siltan Silêman pirr hej ji xatûna xwe dikir. Gotina wê li erdê ne dixist. Şêrîna ber dilê wî bû. Jinek pirr delal û çê bû. Xweşik û bedew bû. Keça Mîrê Cina bû. Bi aqil û hewn bû. Hefrît û xewasên cin î teva di gotina wê de bûn.

Key Belkîs jî pirr hej Siltan dikir.

Ji dil û mirada arîkariya wî dikir.

Lê, hemberî hefrît û xewasên xwe ne divabû kes li xizmeta seltanetê bi nêrê, ne divabû kes li dora Siltan hebê.

Siltan Silêman bersiva wê da:

-Xatûna min, tu êşa nava xwe dizanibê jî, derman lazim e... Hekîm dermanê derda ne, hostenecarê vî karî ne.



www.arsivakurd.org

Key Belkîs beşişî, bi dengêkî bazî got:

-Siltanê min, şêrînê dilê min, ez dermanê birîna xwe jî dizanim.

Kefa Siltan Hat.

-Hê çêtir Xatûna min. Derdê dilê xwe bêje. Li bin rûwê erdê, li ser rûwê erdê, heya tu çavên xwe miç û bel bikê, ezê bi kar bînim. Tu bêjê Cîhanê xerabike, erd û avê li nav hevûdin bixe, cih û waran kafûkûn bike, na tune ye...

Key Belkîs xwe naland.

Ji kûraya dilê xwe keserên bi axên berdan.

Kevçika dilê Siltan Silêman êşiya.

Bi nalên û wan keserên kûr şor kir:

-Siltanê min, ji te xef dibê, ji Xwedê xef na bê... Kêlîka din, ji nava bexçe dihatim oda xwe. Ez gihame devê derî... Ber pêpelûkan!... Çawa min lingê xwe avête ser pêpelûka duduwan, lingê min ji ber min çû. Ji nişkê de, şemitîm... Berdestîk û xizmetçî jî, wê kêlîkê ne li cem min bûn, bo min bigrin. Ez ketim. Bi ketinek xerab!... Tihêla min kete ser kevîkên pêpelukê de. Du-sê parsuwên min şikestin.

Key Belkîs got û beland, weyn kir û lorand, ay-ûy kir û horand!... Ha ha di nalî!... Ha ha!...

Ku Key Belkîs di nalî, agir bi kezeba Siltan Silêman dikevê. Pişkoka dilê wî ji cih di berda. Ew jî pê re di nalî, di kire axên...

Siltan xwe ne girt.

Gotin ji devê Xatûna xwe girt.

-Zu, bêja xatûna min, bêje bê derman çî ye?



www.arsivakurd.org

Key Belkîs pêşî xwe naland, destê xwe da kêleka xwe, serê xwe li ser zembalîş bir û anî, Bû ay-aya wê, bû wax-waxa wê, xwe kelogirî kir... Tiştek ne got, heta jê hat êşa xwe giran kir.

Hêdî hêdî bi dengekî pirr melûl axift:

-Siltanê min, dermanê min doşeka rehet e. Doşeka ji pirtikan!... Pirtikê çûkan!... Divê ku doşeka min, têra xwe mezin û qalin bê. Nerm bê!... Bo ez li ser wê doşekê rehet bim. Dikaribim xwe dirêj bikim, xwe bi qulibênim vîyalî, wîyalî... Da parsuwê min ne êşin. Zor li wan newê, zu bên cebirandin. Wekî din fêde tune ye!... Dermanê min ew e. Ne tuwî din!... Ez vê ji te dixwazim, bes...

Siltan Silêman da xwe ku rabê... Herê dîwanê, çareserîkê bibînê. Bi wezîr û aqilmend û serspiyên xwe bi şêwîrê...

Key Belkîs bi destê wî girt. Ber bi xwe kişand, danî ser dilê xwe. Çavên xwe girt, keserek kûr, ji nava dilê xwe berda.

-Tu ne bes Siltanê Cîhanê bi tenêyî, tu Siltanê dilê minî jî. Ev dil bo te lê dixê.

Dilê Siltan Silêman ji ber çû.

Key Belkîs di bin çavan re lê nêrî.

Nêrî kû Siltan bi galgala wê re di helê, ji hevûdin de dikevê. Ya dilê xwe got:

–Siltanê min, ne lazim e ku tu bi wezîr û aqilmend û sersipiyên xwe bi şêwîrê. Siltan tuwî, gotina pêşî û paşî ya te ye. Tiştin hene ku tu bi xwe hal bikê. Pirr rû nede wan. Wan bi her tiştî agahdar

neke. Ew kes bere bibine barhilgirê gotinên te, bibine palê bi cî anîna galgal û fermanên te. Tu fermanê bide... Bila delêlî derkevin her çar rexê Cîhanê, li nava şarîstanan, harem û darîstanan bi gerin, gazî û bangê bidin. Çûkan teva ji fermana te agahdar bikin. Da zu bên xwe bidin pirtikandin. Wextê me tûne ye. Ez pirr têşim...

Siltan Silêman xwe qermiçand. Ne bi dilê wî bû. Ji roja bû siltan taca milûktiyê da serê xwe, çû ser text heya îro tiştek bê wezîr û aqilmendê xwe ne kiribû. Tim bi wan di şêwirî. Teva ya xwe dikirin firaxekê de, ji nûh dest bi kar dikirin. Lê xatûna li serdilê wî pirr ezîz û şêrîn wilo di xwest. Bêdiliya wê nekir. Heya îro, ji roja bû jina wî, cilê bûkaniyê li xwe kirin, ser hespê suwar bû hate Qesra Qutsê tiştek jê ne xwest. Nexweş ne ket, bo nexweşiya xwe dermanek ne xwest. Ev xwestek ya pêşî ye. Heye bibê ya paşî jî... Car din dilê wî qêbil ne da. Ma heyîrî...

Belkîs tê anî der.

Fermana Çûkan, ji koç û mal pirtikandina wan ne hêsanî bû.

Xuze bi derbekê di hatê xeyîrandin. Xwestek dijî çêbûn û berdewama jiyanê bû...

Key Belkîs destê Siltan berne da. Di xwesteka xwe de rawista.

-Tu Siltanê Cîhanê tevayî. Ê ser rûwê erdê, ê bin rûwê erdê... Galgala te bê xilafî gere bê cî. Daxwaza Xwedê ev e. Na xwe kîlîta devê te ne di

vekir. Keça Mîrê Cina jî, ne dikire qismetê te. Li ser rûwê Cîhanê, tu meriv, ne dikarin bi cina re bi zewicin, ne dikarin bi wan re bi axifin. Gere tu van tişta dizanibê. Ne hewceye tu xwe aciz bikê. Bi xêro, dêro bi şêwirê. Wextê xwe hunda meke. Tu Siltanî, ew bende ne... Tu qencê Xwedê yî, ew mirîd in. Tu şivanî ew bez in. Bêje bibûre, bike ku bi rê ve herê. Bêje, bila ew bi rê ve bibin. Fermanê bide, xelas!... Qerara xwe bi xwe ser bide. Bi kesî ne şêwire. Bila di jiyana te de, di dema seltaneta te, carek bê jî, qerar ji te bi xwe, bê şêwra dîwanê derbikevê. Carek bê jî!... Bi xwe ser bide!... Lê ew qerar dîrokî bê!... Ev ferezende ye!... Biya min bike, ez jina te me, dilxwaza te me. Her gotina te, her qerara te dîrok e. Kesî ji dîroka xwe re neke şirîk. Tu bêje, bes e! Tu qerarê bide bes e! Bes, gotin ji nava lêvên te derbikevê; hefrît û xewasê min di bîst û çar saetan de wê kar pêk bînîn. Qet xof meke. Bes tû bêje!...

Siltan Silêman ber bi dîwanê lezand. Hêj ne gihayî dîwanê, ferman da.

X X

X

Delêlî li nava welat û bajaran, li nava gund û darîstanan belabûn.

Li dahola dan û bakir in!...

Fermana Siltan Silêman xwendin.

*Hêêêê, gelî merivan, gelî rawîran!...*

*Fermana Siltan Silêman e!... Çûkên Cîhanê te-va, ji hûr û biçûkan, divê herin Qesra Qutsê xwe bidin pirtikandin. Parsûwên Key Banû Belkîs şikesti-ne. Divê ji pirtikê çûkan doşekek jêre çêbibê. Kesê agahdar bûyî, gere kesên agahdar nebûyî jî agahdar bikê.*

*Kesê dijî Fermana Siltan Silêman derbikevê, ji ol û tolê derdikevê. Wê bikevê bîra bê binî, yan jî wê serê wî bê jêkirin. Bila her kes dizanibê...*

Di navbera wextekî pirr hindik de, çûkên cî-hanê teva agahdar kir in.

Heydênî bi Çûkan ket!...

Qîrên û çîrrên kir in!...

Weyn kir in. Jar û şîn kirin. Girîn!.. Li xwe dan!.. Serê xwe li hêt û dîwara dan. Revîn!... Ketin

qulûqewêran!.. Bi serê çiya ketin!... Bi nava çolan de bazdan!... Xêr ne kir!.. Bi neçariya xwe de pûnijîn. Hawar kirin, xêr ne kir. Hêvî kirin, fêde nekir. Ne kesî li girî û weyna wan nêrî, ne kes di neçariya wan fikirî.

Ne kesî guh da hêvî û hawara wan.

Ferman ne ji deverek biçûk der diket.

Fermana Siltan Silêman bû, pêwist bûn, bo bi cî bênin. Pêk neyênin, dijî fermanê derkevin, şerr e... Cîhan teva wê hemberî wan bê. Meriv, rawîr teva wê ji teref Siltan bin, rahêjin çekên xwe kevina nava darîstanan de, qirra wan bînîn. Nexasim hefrît û xewasên Cin î... Çûkek ji ber lepê wan, bo dermanekî ji xelas nabê. Yekî bi tenê li ser piya na hêlin.

Sedem çiye? Qephet ji ku derketiye?... Kê kiriye?... Çi kiriye? Li kû derketiye? Tê ne gihiştin. Pirsîn, bi virde bezîn pirsîn, bi dera din de bezîn pirsîn... Kesî tiştek ne got. Nizanî bûn heya bêjin. Tiştê delêliya got, tê gihiştin bes ew bû. Ji rafê çûkan derketiye ev gunehkarî, yan ji kesan, ew jî nizanîbûn. Sedem hûnda bû. Lê, gunehkarî pirr mezin e û giran e, heya ev fermana zor hatiye dayin.

Dozên mezin zu bela dibin. Hûr û biçûkên Cîhanê... Meriv bê, rawîr bê ji fermanê agahdar bûn. Lê kî wê çi bikê? Mefer û mecal tune bû. Xwediyê fermanê Siltan Silêman bi xwe bû. Ne mohra wezîrên wî, ne ya aqilmendek ji ê wî. Rast û rê ji devê Siltan bû, dibin mora wî de bû. Hêvî û daxwaz divê herê ber destên wî. Ji xwe wî ferman da ye. Kengî



www.arsivakurd.org

xwe derewîn derdixê. Dûrî aqila ye...

Du rê hebûn, yan berxwedan û mirin, yan jî teslîm bûn û pirtikandin. Car din mirina bi rezîlî û gîdîtî!...

Siltan Silêman jî, ji hêla xwe de haziriyek pirr mezin dikir. Vala ne sekinî... Fermana duyemîn da...

Bo leşker, ji merivan, ji cinan, ji rawîran li Newala Mîruwa bi civê.

Ku çûk serê xwe rakin, dijî fermanê derkevin, serhildanê bikin... Bêjin em vê rawşê qebul na kin... Gere ev ferman bê qewirandin. Wilo naçê serî. Nihaqiye!... Mafên me ji destên me tê sitandin, tê perçiqandin û xwarin. Gere ev nebê!... Daxwazên wilo bikin, xwe li kotekiyê deynin, leşker herê ser wan... Da, bîst û çar saetan de wan safî bikê. Bi zor wan bênê rê. Şûr berdê nava wan, bi tîr û kevanan bikevin nava wan, bi kehnîk û qewsikan bidin duv wan...

Wan pêwistî ser tewandinê, pêwistî pirtikandinê bikê.

Çûk jî agahdar bûn ku leşkerê Siltan Silêman li Newala Mîruwa dicivê. Komên mêrxas û pêlewanan!... Komên hefrît û xewasan!... Celebên rawîran!... Ha ha di hilkişin newalê. Bes di nava wan de rafên teyrik û tûrikan û komên mara tune ne. Teyrik û tûrikan xweş fam kir ku Siltan Silêman, vê carê ji hemû carên din bêhtir li duv xwesteka xwe dirawistê. Veger tune ye!...

Tirs li çûkan peyde bû.

Yekî bi vir de baz da, yekî bi dera din de... Fêde ne kir!...

Hin ji wan ketin qulûqewêran de... Xêr ne kir!...

Bi kûde firî bane, çiqas dûr ketibane jî, ji Cîhanê der ne diketin. Pêwistî ser rûwê erdê, ser çûqliyên dar û devîyan, ser kuç û latan deynin bûn. Nikarîbûn heta hetayê li hewayê jî bimênin. Hêl û qeweta wan ne di gihiştiyê de. Bi can bûn!... Di xwarin di vexwarin!... Bê erdê, bê danîna ser dar û deviyan, ser kuç û latan jiyan ne mumkun bû. Wî westin!... Tîî bin, birçî bin!... Li hewayê jî mabane, qet li erdê ne danîbane, ne xwaribane, ne vexwar bane, hefrîtên cina, yeko yeko wî wan neqênin, wî bi qeppira wan bigrin, bînin ber destên Siltan Silêman. Xelasî nebû...

Tevgera tirsê, neçariyê di nava wan de çêbû.

Dê weledê xwe avêt!...

Girî, qîrên û weyn li erşê hefta sekinî!...

Cih cihan li hevûdin gihane hev. Devê xwe xistin ber gûhên hevûdin... Lê kesî tiştek heşkere ne kir. Hev di cewibandin û bes...

Kesî ne wêrabû xwe heşkere bikê. Derkevê meydanê du-sê galgala bikê. Ne dijî fermanê, ne li xêra fermanê... Qet!...

Ji nava çûkan teva yek derket.

Yek bi tenê!...

Ji nişkêde li xwe da, firî çû miqambilê teva... Li serê rizdeke bilind danî. Xwend!...

Çûkê Beytik...



www.arsivakurd.org

Bi girşê xwe biçûk, bi kezeba xwe mêr...
Heya jê hat dengê xwe bilind kir.
Nemerdî nekir got:
-Gelî hevalên hêja, em teva çûk in... Bi çeng û perr in. Ku çeng û perrên me nebin, em jî mîna rawîrên din nabin çûk. Jîyana me firr e!.. Azadiya me firr e!... Firrberamber azadî... Di nava valayiya hewayê de em gurra nedin xwe, li yek firrê em sedên erda şun xwe de ne hêlin kes na bêjê me çûk... Kes na bêjê me teyrik!.. Hemberî vê jiyana têr rûmet û xîret, têr xêr û ber, jiyana têr ger û geşî, ku pirtikên me bên jêkirin, ne ma. Xelas bû!... Ji destên me derket!... Em jî, ji çûkantî ketin, ji teyriktî ketin. Bû ne şipzelûtên ber derî û destan. Pirtikandina çûkan, mirina çûkan e. Jiyana me bi pirtikên me ye. Em ji wan bibin, jiyan bo me na mînê. Mirin ji mer çêtir e. Mirin çêtir e ji bindestiyê. Em bê pirtik dibin girtîyê reş û tarîyê. Em bê pirtik dibin mahkûmê şevê. Bi rojê, em ji qulûqewêran nikarin derkevin. Tava rojê wê me bi şewîtênê. Şeşimstana pîroz me nikarê bi parêzê. Serma zivistanî wê me qufilênê. Barana beharî wê me xaniqênê. Bahoza payîzî wê me li ber xwe bibê. Em nikarin bi rê ve jî herin. Çermê laşê me wê bi sitirîzerkan, bi gûtin û dirrihan ve bi mênê. Çûk ne ê ber derî û destên kes û kûsa ne. Çavên li deriya xwelî li seriya. Ev fermana han, ku ji devê Siltan Silêman jî bê, bi mohra Siltan Silêman bê jî, divê bê qewirandin, divê em dijî wê derbikevin. Mirin çêtire ji pirtikandinê. Mirin çêtire

ji zelutbûnê. Mirin çêtire ji ber destan û deriyan. Mirin çêtire ji reş û tariyê. Mirin çetire ji koletiyê.

Got û hey got!...

Çavên xwe girt devê xwe vekir!...

Bi axaftina Çûkê Beytik re, çûk tevlî hevûdin bûn. Şelq li wan ket. Hina ji wan baz da, firîn çûn. Tirsiyan!... Kezeb li wan qetiya!... Revîn çûn!... Bo, bi gotinên Beytik agah nebin. Ji agahiyê ti zor li wan nebê. Bazdan çun, ketin qulûqewêran de.

Qijikê li xwe qewimand. Henekê xwe bi Çûkê Beytik kir.

-Tu li xwe û girşê xwe na nerê. Tu galgalên ji xwe mezintir dikê. Tu liqasî lepekiyî, gotinê te ji çîyayê Bagokê jî mezintir in. Tu na bêjê emê çawa hemberî Siltan Silêman derbikevin? Tu na bêjê? Bêje, bê emê çawa hemberî hefrîtên cina şer bikin? Tu berê me na dê xêr ê, didê qelandinê!...

Çûkê Beytik bi hêrs bersiva Qijikê da:

-Em li berxwe jî nedin, têne kuştin. Kesî ji we çûkên bê pirtik dîtine? Tu bi xwe jî, hevalê Qijikê, tu bi xwe jî hew dikarê herê ser pişta kerê pişt kurmî. Zarok wê te bi rota, bi tepuska, bi şivên kersivanî kujin. Çûk ne ê ku bibin listîka zarokan... Gelî çûkan, çûkê bê pirtik nabê çûk. Em bê gotin, bê qarastin, bê berxwedan, mîna gidiyan serê xwe bi tewênin herin, xwe bi destên xwe teslîmê qerqaşîyên Siltan bikin, bo me bi pirtikênin... Em bi destên xwe, xwe di kujin. Em bi destên xwe tirba xwe di kolin. Lê, ku em li berxwe bidin. Dijî ferma-

nê derbikevin, helbet hin, helbet kurebavin, kurê ciwamêran, helbet kes û kûs hene di derheqqa vê niheqiya mezin de, ser mafên me şor bikin. Destên xwe bavejin destên me. Piştgirtiya me bikin. Belkî em xwe bi xesarek biçûk ji vê devera teng xelas bikin. Belkî hinga dilopa ronahiyê bikevê dilê Siltan Silêman û Key Belkîs de. Bo jiyanek bi rûmet û xîret divê em berxwe bidin. Berxwedan jîyan e.

Parîkî sekinî, bêhna xwe berda. Dêhnê xwe da çûkan. Nêrî ku ew toza mirinê qet ji ser wan nehat avêtin. Dengê xwe qenc bilind kir.

-Ku em çûk bên pirtikandin, ne em bi tenê dibin girtiyê reş û tariyê, ne em bi tenê dibin êsîrê şevê. Zarokên me, nebî çirçirkên me jî wê vî cezayên me bi kişînin. Heqqê me li me hebê jî, li zarokên me tune ye.

Kesî guh ne da yê.

Metroziyên xwe, henekê xwe pê kirin.

Çûkê Beytik kir û ne kir ra li wan ne dît.

Yek bi tenê jî nanî ser fikrê xwe.

Mefera Çûkê Beytik ma ku yeko yeko bi wan re şor bikê. Kesên darî çav, jiyana rojê pê di dibê, av lê germ dibê bi cewibênê. Wan agahdarî sedemê bikê. Bo berxwedanê qayil bikê. Bênê rex xwe. Bi hev re koma berxwedanê çê bikê. Hember fermana Siltan Silêman derbikevê.

Giha kîjan çûkî got.

Nemerdî nekir, sedem vekirî anî ziman.

-Key Banû deruwan dikê. Ew derew û kezzabî

ji berbetanê ûrê xwe derxist. Meqseda wê tiştek dine. Meqseda wê, ku çûkan ji pirtikên wan bikê. Bê çeng û per bikê. Sêwî, bêxwedî, bêmecal bi hêlê. Ku çûk hatin pirtikandin êdî namînin çûk. Wê bibin parityên lîstika zarokan. Wê bibin girtiyê reş û tariyê. Bibin mehkumê şevê.

-Ber xwe bidin, ber xwe bidin... Dest hilênin...

-Wilo hêsanî teslîm nebin. Xwe ne rezilênin....

-Şerm e!... Ji bav û kalên xwe, ji dîroka xwe, ji nav û dengê xwe şerm bikin.

-Çavên Key Belkîs lê ye ku me çûkan ji ber xwe bikê. Ji firê qut bikê. Da bi hefrîtên xwe hikim li Cîhanê teva bikê.

-Siltan Silêman jî xirrandiye!...

-Aqilê wîn ji rê biriye!...

-Em hevalbendê Siltan Silêman in. Em girêdayê wî ne, ne ê Key Belkîs in. Bes em in firoker. Em çûk!... Di nav hevalbendê Siltan de, bes em tenê hene bi çeng û per. Çavên Key Belkîs lê ye, ku me ji meydanê hilênê. Rabûna me jî pirtikandina me ye.

-Ji hindikayî ve, em li riya axaftina bi Siltan re bi gerin. Bo em vê niheqiya mezin di guhên wî de bêjin.

-Bo em ji azadiyê dur ne kevin. Heya bi nebî çirçirkên me jî êsîr nebin.

-Pirtikandin mirin e!...

-Pirtik bo me çûkan azadî ye... Kes azadî ya xwe bi hesanî ji destên xwe ber nadê.

-Neçin, bi destên xwe berdest nebin.

-Neçin xwe ne pirtikênin.

Galgal û bez û hawar û qîrêna Çûkê Beytik fêde nekir. Bi cem kîjanî de bezî, got û hey got. Xêr nekir... Lê gûhdarî nekirin, bi ser kê de di çû, jê direvîn.

Çûkê Beytik nêrî ku çûk lihevûdin di gihine hev. Di bine raf... Ji hev di veqetin û rêz di bin. Raf li rafê din berê xwe didine Qutsê. Payîtexta Siltan Silêman.

www.arsivakurd.org

X X

X

Firra wî ma cem Kund.

Di wê kêlîkê de hate bîra wî.

Gurr li xwe da, ber bi qûnaxa Kund firî.

Kund aqilmendek ji ê dîwana Siltan Silêman e. Pirr bi aqil û hewn e. Di nava çûkan de jî hew jê zanatir, kohnetir, bi aqiltir heye. Xatir û qedrê wî li cem Siltan Silêman pirr e. Belkî ew!... Belkî ew çareserîyekê bibînê. Belkî ew çûkan ji vê devera teng xelas bikê. Belkî!... Bi xwe, bi dostna ji ê xwe... Bi şîretekê, bi rê û şivîlekê. Hema te dît!... Mefer û mecal ji ser rûwê Cîhanê xelas nabin. Hema te dît!...

Hêvî tucara winda nabê!...

Her tim di dilê merivan de darfêkî ye!...

Her tim bin bar e!... Bê birrîn!... Bê şewitandin jî, qurmik hunda nabê, rayên wê di nava rewa erdê de cihê xwe digirê. Bernadê!... Qet şemirandin li cem tuneye. Tim hesabê xwe dikê. Bo jiyanek bi rûmet karkiriye. Ku ferece dît, kat didê. Kulîlkan di vekê. Reng û banga xwe diyarî cîhanê dikê. Tovê jiyana ciwanik e!... Hew te dît ku di deverekê re serê xwe hilda. Çavên xwe bel kirin. Wan çavên têr ronahî û geş çirisandin. Hin bi hin bal bû, geş bû!..

www.arsivakurd.org

Mezin bû!... Hew te dît fêkî da!...

Mala Kund, miqambilî Beriha Dilopê bû!...

Serê Çiyayê Bagokê!... Payîtexta Şahmaran...

Hemberî Cûdî!...

Pêgiha qesra Kund vekirî bû. Pêgiha têr newal û mesîl û beroj!... Heya bi Şingalê, rêza çiya xûya dikir. Çiya yên têr dar û devî, têr berzehên lata mil dabûne hevûdin. Bes Newala Dodehê, ji serî û binî rut bû. Bê dar û devî!... Têr kûç û lat û kevir!... Jiyanek zelut!... Bê dûnde!... Bê ked!... Xuru lat û şiqê kevirên nehîteyî bûn. Micala jiyanê, micala sitarê ne dida. Serê Newala Dodehê sor dikir. Xalî sor!... Sorek vekirî!... Têr nikar û hişkeber!... Kit şînayî tê de tune ye!... Jiyanek birçî, bê tevger!... Jiyanek arzan!... Jîyanek belengaz!... Jiyanek tarmisî!... Kûloke!... Kambax!... Bê xîret!... Jiyanek bê ked!... Dida xûyakirin. Bê ked, bê rewa, bê hesab, bê qerqaşûn. Jiyan ku qerqaşûn têda tunebê, tevger û xerabûn, avabûn, kem û zêdebûn çênabê. Xaf e, xûrûxalî ye, hêrivtî, xerbende ye!...

Beriha Dilopê, di kêleka Dêrxerapkê de, devê xwe jihev vekiriye. Ber bi Êlînê hilma germ û sar, tevlîhev di berdê. Salewext, ji aqda berihê dilopek av di niqutê erdê. Bes dilopek!... Ne kêm dibê, ne zêde... Havînî, zivistanî, payîz û beharî... Yek dilop!... Bi wezn, bi tiqul, yek dilope bi tenê diniqutê erdê. Dilopê cihê xwe, liqasî mezinbûna xwe di erdê de çê kiriye. Ne mezin ne biçûk!... Ne fere!... Ne

kûr!... Bes cihê dilopekê... Dilop çawa ji aqdê dikevê, wilo, di cih de jî winda dibê.

Aveke tenik!... Zelal!... Mîna çirîska çavên tavê, têr ronahî!... Çirîskek ji sitêrika!... Xal jê diçê!...

Li aqdê bi peydabûna xwe re, di çirisênê. Ku çirisandin peyda bû, yek dizanê ku av ber hev dibê, dilop wê bikevê. Bi ketina dilopêre çirîskên têr ronahî xal didin. Ber bi erdê dadikevin. Xîşkek zirav!... Duvdirêj!... Berjêr dibê!... Çirîsk heya bi erdê dibê xêzik!... Ku dilop giha erdê, dengekî zirav û tenik bi hindiruwê berihê dikevê. Deng zirav dibê, kûr dibê, ber bi kûraya berihê de diçê.

Dilopa avê derman e!...

Dermanê derdê bê derman e!...

Dermanê bawî û tawiya!... Kuloke, şilûşat û kor û kerroke!... Dermanê dîn û dîwana!... Bê zad û zewade!... Dermanê kal û ketiya!...

Dermanê evîndarên bê çare!... Lal û dil şiloke!...

Dermanê birînên iledarî, kurmoyî!...

Şahmaran du zihayê maran li devê merihê danîbûn. Kesî nikarîbû, bê destura Şahmaran, dilopek bi tenê jî ji wê avê vexwê. Heya îro jî, kes ne bûye şahit ku Şahmaran izin da ye kesî... Ne ji rawîran, ne ji merivan, ne ji cinan... Na ji siltanan, ne ji mîran, ne ji mîrekan!... Ne ji key û key banûwan!... Ew her du zihayê maran jî dinav de... Qet!... Nas, biyanî!... Mezin biçûk!... Mîr, Mîrza!... Siltan, Key û keybanû!... Qet!... Nexweş, birîndar!... Iledarî, elemoyî, birînkurmî!... Qet!...

Çûkê Beytik çawa giha qesra Kund dengê xwe kir:
-Qendê min!... Aqilmendê min, tu li malî?...
Bersiv ne hat.
Beytik guhên xwe pêl kirin.
Pêjin tune bû.
Careke din dengê xwe kir:
-Kundê aqilmend, tu li malîîî?...
Ne qenc, ne xerab deng ne hat.

Çûkê Beytik dêhnê xwe dayê ku kes bersiva wî nadê. Tirs kete dilê wî... Xof kir!... Car din dilê xwe xweş kir. Guh ne da dilê xwe... Bê cewibandin çu derî vekir, kete hindirû. Hin bang dikê, hin di gerê...

Hindirû bi qurbana derve ye...
Hindirûkî xirûxalî!...
Benderih tune ye!...
Ne nîşanîk, ne notek!...

Bê dengiya mîrate, bêdûnde, xerab cihan ji qesra Kund di hat.

Heya bi berdestîkên Kund ne li mal bûn.

Niqutî dilê wî. Serê xwe hejand. Hêvîk bû!... Hêvî destpêka jiyanê ye. Nîvê xelasbûna berxwedanê ye. Hêvî xelas nabê. Hêvî di dilê merivan de her tim kulîlka jiyanê ye. Bi van hêviya berê xwe da bû qûnaxa Kund. Hêviyên pirr mezin!... Belkî, rêyek, şivîlek şanî çûkan dabane. Aqilek dabane... Mixabin ew hêvî jî winda bû. Bû min-mina wî!... Bû niç-niça wî!... Serê niklê Bêytik reng da, kesk, zor, xemrî, zer... Ha can berda ha berda!... Tirsa neçariyê kete

dilê wî. Weke çûkên din, ew jî tirsa... Di urê xwe de fehimî!... Çavên wî tejî av bû. Xwîsiya wî di qirrika wî de ma. Devê wî zuwa bû. Bê mecal di cihê xwe de sekinî. Gotinên kûloke, bê tuqil, xaf, beredayî ji devê wî de ketin. Çû!... Kund bi xwe jî!... Qendê çûkan... Aqilmendê her du Cîhana!... Xwe ne girt. Xwe liber du piffan ne girt... Weke wan çûkên din... Ew jî tirsa... Çû!.. Qista Qesra Qutsê kir. Rast berê xwe da dîwana Siltan Silêman. Kî dizanê, balam, Kund bêyî çûkan teva çû ye. Berî her kesî... Bi dizî!... Zuu!... Bo kes wî ne bînê... Kes agahdar nebê. Xwe lê nekê bela... Bo kes nedê duv... Ji Siltan Silêman rica xwe bitenê bikê. Ya xwe bi tenê!... Xwe xelas bikê!... Korîma wan çûkê dî kirî. Xema wî tuxmê wî ye!... Xema wî gelê wî ye!... Vê heyamê kê hey ji kê heye!... Her kesî li fêda xwe di gerê. Li kar û barê xwe di nêrê!... Xema Kund çûk in!... Xema Kund bes Kund e!... Xwe xelas bikê!... Çawa hebê aqilmendek ji dîwana Siltan e... Qedrû-qîymetê wî heye. Xwedî xatir e... Doza xatirê xwe bikê. Bêjê ez û ez... Bes ez bi tenê!... Bila ez xatirê micala bim. Xatirê hewqas sal ku mi aqilmendî û xizmet ji ter, ji seltaneta ter kiriye hebê. Ne bes bo te bi tenê xizmeta min heye, hêêê ji bo bavê te, ji bo bavê bavê te xizmeta min heye. Gere tu pirtikê min bidê xatirê wê xizmeta duvdirêj. Çûkan teva bavêjê derê han. Bes xwe bi parêzê... Doza xwe bitenê bikê. Roja tengasiyê ye. Roja qewamê ye... Her kes rojên qewamê li sînga xwe na dê, xwe na

kê armanc ji kes û kusan re. Xwe nakê armanc bo tîran, bo derbên gurzan, bo rimmên serî tûj. Her kes ne ew e!... Weke wî ne bê aqil e. Ne Çûkê Beytik e... Xwe bê aqil nakê. Xwe na dê pêş. Hey gidîîî!... Hey gidyanoo!... Felek xayînê!...

Bi peyva dawî re li devê derî da der ket.

Car din serê xwe hejand. Bû niç-niça wî.

Beşişî!... Ji kerba!... Li demedorê xwe jî ne nêrî.

Ne bi tuwî aqilekî din hatiyê de.

Ji galgalên xwe şerm kir.

Kund xweş nas di kir.

Dizanîbû, serê wî jî tê herê, gelê xwe na firoşê.

Xwedî xîret û namus e. Bê xîretî qabûl ne dikir. Ne pirtik bi tenê, serê wî jî tê herê, xiyanet na kevê dilê wî de. Çûkê ceribandî ye...

Hêj di nava van galgalan de di çû dihat, Şahmaran hate bîra wî. Kund, pirraniya wextê xwe li dîwana Şahmaran derbas dikir. Pirr hej ji hevûdin dikirin. Kund ji Şahmaran... Şahmaran ji Kund... Ku Kund ne diçû dîwanê, çend rojekî pêjna wî ne dihat, Şahmaran qasid dişandin dûv Kund. Civata her duwan pirr xweş û ciwan bû. Dabaş her tim dîrok bû. Salifên berê, serpêhatî, nûçeyên rojê, bo rojên ku bên pirr şor dikirin. Her galgala wan hewngîrî bû. Serpêhatî yê wan bixwe jî pirr bûn. Di çerxa felekê re derbas bûbûn. Rojên qewamê, rojên teng bi hawara hevûdin dibezîn.

Hebê nebê, Kund qista dîwana Şahmaran kiriye. Bo şîretekê, bo qasidîyekê... Bo arîkariyekê!... Hebê



www.arsivakurd.org

nebê pê dişêwirê. Şahmaran e... Şahê, ziha, mar û gumgumoka û şaqamar û marmarotka ye... Dibin situna azmên de, kes nikarê gotina wî li erdê bixê. Ser rûwê erdê, bin rûwê erdê... Şahmaran, tiştê bivê dikarê bikê...

Hawara xwe gihandiyê de!...

Kund niha di kêleka Şahmaran de rûniştiye.

Li ser sedemê di axifin.

Kin û dirêj, qut û zirav, mezin û biçuk di pîvin. Li çareseriyekê digerin.

Doz mezin e!...

Doz bes ne ya çûkan e!...

Ya jîyanê ye...

Çûk teva bên peritandin, bên pirtikandin, denga xuze bi derbekê xera dibê. Doz, bes ne ya çûkan e... Ya rawîrên teva ye... Ya merivan teva ye... Ya Cîhanê bi xweye... Îro çûk in... Sibe mar in... Bo Key, bo Siltan, bo Mîrza... Hey yek wê derbikevê, derdekî bi xwer bînê... Yek wê jehra maran bixwazê, yek wê çermê maran, sitirihê maran bi xwazê... Jehr bo derman, çerm bo çavan, sitirih bo suud û qubalê... Illeh wê tiştek derbikevê!... Yek wê dilê xezalan bi xwazê... Yek wê şîrê şêran di eyarê şêran de bi xwazê... Yek wê kabê rovî û gûr bixwazê... hwd. Problem mezin e... Divê her kes ji dehma xwe de, çi jê hat, li gorî hêl û qeweta xwe dijî fermanê der bikevê.

Gûrr li gûrra din bilind dibê. Sinsila serê Çîyayê Bagokê tofan e. Li mijika azmên di sekinê.

Jêr tarî ye. Darîstan têr sitirî û dirrihên şûjinî ne. Hezar xefk di nava dar û deviyan de, di nava talanê serê wan de heye. Çiqas bilind bibê, hewqasî ji qeda û bela dûr dibê. Bi çavên çûkanî car din, berî pirtikên wî bên jêkirin, di ser Çîyayê Bagokê re, bihişta vê Cîhanê re bifirrê... Li gul û gulîstan û şilîlxana binêrê... Kanî û çavkaniyan bibînê. Ava zelal, sipîî, tevî çiriskên rojê bibînê. Guhdariya xuşşêna dar û deviyan, guhdariya şirrêna rijandina avê ji serê rizda dikê. Bê çawa av dirijê, ronahiya rojê, şînayiya geya, dar û deviya bi xwere, tevlî wê şilaya xwe bi bêhna gul û kûlîlkan, bêhna endeko û rehanê hêdî hêdî bi rehetî bikişênê hinavên xwe. Têr bixwê, têr vexwê, têr bibînê!... Çi dibê, çi nabê, heye sibe tofana kesnedî bi serê wan de bê, girtin heye, kuştin heye, ji nişkê de girtin heye ku dît û nedît bê pirtikandin. bi saxîtî bikevê gornê de.

Dera di ser re bûrî, qenc û xweş dêhnê xwe da yê. Qenc û rind di nava mêjiyê xwe de naqiş kir. Bo ji bîr nekê.

Heya giha mitiqa serê Bagokê ne sekinî.
Hemberî deşta Nisêbînê... Hêla Sinceqê!...
Beriya fere û kûr!...
Valayiya bê binî!...
Destpêka dîrokê!...
Dîroka têr xwîn!...
Têr ceng û hawar û bang û qîrên!...
Meydana cengên awil û axir zeman!...
Wan kolan û pêgihên têr gul û şilîlxan di nava

mêjiyê xwe de di neqişênê. Bi rengên rojê, bi rewşa xuzeyî... Her car ku nefesa xwe didê û di sitênê ji nîvê kezeba xwe keseran di berdê. Dengê nalêniya wî zirav û têr merez der tê. Hêstir zuwwa ji reşka çavên wî xwe bi ser hinarkê ruwê wî de di berdin. Ku pirtikandin tê bîra wî agir bi kezeba wî di kevê. Xûsiya wî di qirika wî de zuwa dibê. Kelogirî dibê... Fêde na kê!... Ne fêda girî heye, ne fêda ax û nalênan...

Divê li duv doza xwe bi kûdênin. Bê bez û xebat tu doz nayên safî kirin.

Dozên mezin beza pirr û xurt di xwazê...

Rûniştî kesî pûş ne pûniştî...

Hêrz hatnê de... Bi wan hêrza gurrên fere li xwe dan.

Ne bi tuwî giha demedorên Qesra Şahmaran...

Çûkê Beytik çawa giha tixûbê Payîtexta maran, tîremar û ziha dora wî xelek dan. Qîyamet rabû!... Ji ziha û tîremaran... Ziha yên têr agir û hewa germ... Tîremarên firoker û têr jar... Qahrok!... Dînemêr!... Canfeda!... Di dora Çûkê Beytik re çûn û hatin... Bu fişşa fişşa wan, bû fîqa fîqa wan, bû kûffe kûffa wan, di dora wî re fetl û şeqil li xwe dan. Ew bû ku xwe li bin çengê wî nedan, ne kûştin... Xelek lê teng kirin û cewibandin... Bo fam bikin, dost e, dijmin e... Ji xêrê re hatiye, ji şer re... Dengê xwe lê kirin.

-Wilo li bayê serê xwe, bê cewibandin tê bi kûde di firrê, di çê?

Çûkê Beytik ji fîqe-fîqa maran, ji fişşe-fişşe zihan, ji kûffe-kûffa şeqemaran pirr tirsiya. Ew bû

ku dilê wî ne sekinî... Ziman di devê wî de hişk bû... Lêvê wî realîn... Galgal jê çê ne bû. Tilaviz ne ketiyê de!...

Pirtikandin, êsîrî, reş û tarî ji bîr kir!... Ferman!... Siltan Silêman!... Key Belkîs!... Çûk!... Doza çûkan!... Kund!... Şahmaran!... Teva ji bîr kir in!... Di emrê xwe û emrê bevê xwe de hewqas mar ne dîtibûn. Ne dîtibûn, ne bînabûn!... Marên reş, gewr, zer, belek, şîn, şînkeskî... Marên dirêj, zirav û kin, zirav dirêj, qalin, qut, biçûk, mezin... Bi sitirih, bi per û çeng, bi rih û kose... Kor, çav belek!... Xal ji wan di çû. Di çirisandin...

Tirsek lê peyda bû nayê gotin...

Lal bû... Şaş û gêj bû... Devê wî li hevûdin herbilî... Hew zanî bû çi bikê, çi bêjê...

Di cihê xwe de sekinî... Bê hemdî wî çengê wî çûn û hatin. Kêlîka tîremaran li dora wî xelek girêda, şelişî, per û çeng lê hişk bûn. Weke kevirekî ber bi erdê ket. Zu hate hişê xwe. Zor da çengên xwe... Ha ha çengê xwe hejandin. Bo ne kevê erdê... Bes ew mefer mabû di destên wî de.

Wilo, qerem şikandî ma dileheyî... Çavên wî di nava serê wî de mezin bûn, li marên dora xwe di nêrî.

Careke din tîremaran dengê xwe lê kir:

-Çûkê Beytik, te rêya xwe şaş kiriye?.. Yan bi karekî, bi qasidiyekê, bi daxwazekê tu hatiye?

Tîremar, bê sekin li dora wî di çin û tên. Xeleka mirinê hin bi hin li Çûkê Beytik teng dibû.

Hin ji tîremaran bi per in, hin bê per in. Ê bê



www.arsivakurd.org

per, xwe ji ser çûqliyên dara û ser kûç û latan zer î vir û dera din dikin. Her cara ku li xwe didin fîqên û fîzên bi wan dikevê. Ji fişşefiş û kûffekûf û fîqefîqa maran Çîyayê Bagokê dihejê...

Ziha jî, hemberî Çûkê Beytik rabûne, agirê sor û kesk û zer di barênin. Pêtên agir bi mila bi mila ji devê wan di fûrê.

Mefera Çûkê Beytik ma navê Kund!...

Bi lezeke têr tirs navê Kund got. Li ser hev, li ser hev got: Kund!.. Ku... uu... Kund!.. Ku... uu... Kund!.. Qandê Çûkan!.. Kund!... Kund!...

Bes ev her çend gotin ji devê wî derket in.

Şaş bû!... Lal bû!... Ziman di nava nikilan de hişk bû!..

Tîremaran, li bayê bazê Şahmaran agahdar kirin û rê ji Çûkê Beytik re vekirin.

Şahmaran û civata dorê, li binê kolê rûniştî bûn. Kol mezin bû. Mirrên li civatê diket...

Ji aqilmendan, ji sersipiyan, ji mêrxasan, ji pêlewan û cengaweran, ji xwedî doz û şikestîkan, pirr kes û kus hebûn... Ji dengbêj û sazbendên xwedî hûner... Nas û biyanî... Her şiklên rawîran; kesên xwedî galgal, di nava tûxmê xwe de dinan... Xwedî gotin!... Li gor adet û tolên xwe rûniştî bûn.

Şiklên mara!... Ziha!... Ê bi hilma germ, ê bi agirê şewatê namdar... Marên bi sitirih!... Ê bi çeng û per: Sor, zer, reş, belek, hurik, zirav û qalin... Marên kor û kerekor!... Marên bi zengil û gerhok!... Kal, navser, xort!... Ji her çar aliyê Cîhanê mar li

wir civabûn....

Qerqaş û berdestîk bo xizmeta mêvanan ha ha di bezîn. Lingê wan ne dikete bin wan de. Ji fêkî, ji xwarinê, ji avê, ji şerbeta ava tirih û hinaran!... Şîrê şêr di eyarê şêr de li ser sifrê hebû. Şahmaran, Şahê Maran e, xwediyê sifra giran e... Ji her çar aliyê Cîhanê, şiklên xwarin û vexwarinê, nûh, tazê ji darfêkîyan jê dibû dihate ser sifra wî.

Na tune bû...

Kol di nîvê bexçe de ye...

Hemberî Sinceqê, li beriya Nisêbînê di nêrê...

Her çar aliyê bexçe çavkaniyên ji hêstirê Kewan in. Mişşêneke nerm û têr hinkayî bi bexçe dikevê.

Bes dengê Şalûl û Bilbilan ji wêdirê kêm bû.

Şalûl û Bilbil bi tûxmê xwe re ketibûne xiloqa pirtikên xwe de. Di heznê de bûn... Di tirsê de bûn... Ketibûne ber ta mirin e... Fermana Siltan Silêman ew jî bê ziman kiribûn. Dengê wan birî bû. Ne hesreta gulan, ne evîndariya bê derman dihate bîra wan.

Reben û bê mecal bûn...

Xûşşên û mirrêna avê, bi bayê nava pel û pûş re hêdî hêdî di leyist. Dengê çil û heft şiklên xuzeyî der dixist. Dengê avê û ba!... Sih û şinayî!... Kulîlk û reng!... Tevlîhev dibû... Bêhn dida!... Reng û deng dida!... Bexçe ji serî û binî kulîlk û gul bûn. Hinar û sêv bûn... Hirmî û hejîr bûn... Gûhîj û behiv bûn... Tu û mişmiş bûn... Gwîz û bindeq bûn...

Bêndera kûlîlk û şilîlxana li wir bû...

www.arsivakurd.org

Hinkayiyek pirr nerm û xweş û têr bêhn bela dibû.

Hînkayî ya av û bayê di nava kûlîlk û gulan de, di nava geya û pelên dara de, hemberî germa Sinceqê ku ber bi Çîyayê Bagokê di hilkişa mîna surha Amedê di sekinî. Ew germa têr gemar û toz çawa di hat wilo winda dibû.

Serê Çîyayê Bagokê ye!...

Bagok bûka Tora Hevêriya ye!... Bûka çol û çîyê ye!...

Dîroka Kurdistanê, ya têr xwîn û hawar, cihê berxwedanên têr rûmet û xîret. Ya têr maraz û kûl û derdan!... Mextela bê miradê ciwanik... Destpêka jiyanê, pişkivandina şînayî, tahlîşkê!...

Kûlîlk û reng bi xemla rojê re govenda jiyana bi rûmet û têr xîret digirin.

Bi wî bayê hînîk re, li her çar milan bela dibin.

Govenda kûlîlk û rengê rojê, bi dengê av û pel û geyê re derdê dila bela wela dikê. Dermanê birînên bê derman e.

Binê kola Şahmaran, bi doşek û berrên Toranî raxistiye. Ew ber û merş û tayijên bi dengê dilê evîndarî hatî neqişandin... Bi xêzik û rêçik bûyî!... Seranser balgî û zembelîş in. Serê quhikê zembelîşa teva bi destên dotên çardeh salî, têr hûner hatibûn xemilandin û neqişandin. Her yekî bi destên dotekeênûh nûh ava evîndariye di cotê memikê wê de tev digerihê. Teva nûh!... Sippî!...

Textê Şahmaran di nîvê kolê de ye. Mîna gulokek ronahî di çirisênê.

Şahmaran bi kûbkûbandina giran î maqûlî, bi wê bejna delal, nazik, nazenîn, kûbar, li ser textê xwe runiştiye. Bi wan çavên reş-belek, gir, kildayî li kesên dora xwe di nêrê.

Serê Şahmaran keçik e...

Por dirêj, gerden gaz e!...

Gewre ye !...

Hinarkên ruwê wê, mîna du sêvên xelatî, sor sosinî û gulê ne... Her du lêvên tenik, rengê kûlîlka xecxecokê, kulîlka hinarê sor dikin. Sorên xuzeyî!... Ne pirr giran, ne pirr sivik...

Dinanê wê dir in... Di çirisênin...

Birhên wê reş, zirav û dirêj î kevanî ne.

Pozê wê, ji navbera her du çavên wê ti temtêleta rûdêna wê de, ne biçûk, ne mezin xwe ber bi lêvên sor î sosinî di berdê. Serê pozê wê piçkî hildayî ye... Şanikek reş, biçûk li bin hinarka ruwê wê yên rastê ye. Mîna kûlîlka berfê hezn û feslê didê rûdêna wê ya gurover î li hev hatî.

Meriv, ji delalî û sipêhî bûna wê têr na bê.

Laşê wê mar e... Duvê wê li ser pişta wê bûye kofendîl, serê duvê wê jî mar e...

Dest û lingê wê jî teva mar in.

Ser û binê Şahmaran di nava rengan de xemiliye. Bê çiqas şikl û rengên mara li Cîhanê hene, laşê Şahmaran wilqasî dinava reng û şiklan de neqişandiye. Xemla xwe ji jiyanê, ji tevgera Şeşimstan sitandiye!... Rengên Rojê, ê dar û deviyan, lat û kuçan, geya û şînî, pel, pûşî, av û baran, berf û tey-

rok, tevlîhev lê hatine hûnandin. Ji rexekî ve bi dîtina Şahmaran hêbet û êbret di girê... Ji rexê din ve, dilşa û kêf xweş dibê!...

Kesê ku çav li Şahmaran kiriye ne bi dilekî, bi hezar dilî dilketiyê de.

Çawa çavên Beytik lê ket, devê wî ma ji hev.

Gotin jê çê ne bû.

Çav di nava serê wî de mezin bûn.

Lal bû!...

Derdê xwe ji bîr kir.

Qasidiya wî, fermana Siltan Silêman, Kund, hawar, pirtikandin, êsîrî, reş û tarî, rebenî ji bîra wî çû.

Bêhnikeke xweş wilo dilehayî, bêhn birehayî ma sekinî.

Tîremarek xalî zer hat û li ber sekinî.

-Kûla dilê xwe bêje?...

Hilmak germ li dev û lêvê Çûkê Beytik da.

Bêhna wî çikiya... Bi bang û fissêna Tîremar re qamekê hilçenî.

Hişê wî hate serê wî. Zanîbû, bê ji bo çi hatibû qûnaxa Şahmaran.

Bê gotin, bê tirs çavên xwe li Kund gerand.

Kund di rex Şahmaran de... Li kêleka rastê... Li ser doşekê, çarmêrkî rûniştî bû. Serê wî diberde!... Bi dilekî sar!... Milkulî di punijî!.... Wilo ser tewandî!... Di cihê xwe de bê lept!... Qet na qaliqê!... Canê wî hatîye serê difnê wî!... Ewe ku nefesê didê û di sitînê...

Beytik bê silav û gotin ber bi Kund çû.

Ne got dîwana Şahmaran e... Pêşî gere silav li xwediyê malê bibê... Paşkê desturê bi xwazê û daxwaza xwe ji merivê xwe re bêjê. Ew ne hata bîra wî jî. Edeb, rêz, tol ji bîr kirin. Qet pêça xwe neda kesî ji mêvana... Bê şerm!...

Pirr şerm e!... Li dîwan û koçkên merivan, ku meriv silavê li dîwan û koçka nekê şermezarî hew jê mezintir heye. Lê Çûkê Beytik adet û tol ji bîr kiribûn. Ketibû xiloqa pirtikan de. Ketibû kula fermanê de... Ne şermezarî dihate bîra wî, ne adet û tol...

Nexasim di dîwana Şahmaran de...

Ku seriyan zuwa di qusênê...

Kûffên bi zihakî mara ket, ji cih xwe dahlande Çûkê Beytik.

Şahmaran destê xwe hêdîka hilda!...

Ziha di cihê xwe de runişt.

Beytik tirsa. Lê wê carê tirsa xwe neda der.

Çû ber Kund sekinî...

Çawa giha ber Kund destek ji ê xwe danî ser kaba wî.

-Ezbenî, qey tu bi ahwalê mê çûkan agahdar ne bûyiye?...

Kund, ji kûraya dilê xwe keserek berda. Ew serê mezin dinava milên xwe de zîvirand û hêdî hêdî rakir. Bi wan çavên kesp, mezin û gurover, melûl melûl li Çûkê Beytik nêrî. Bêçarî û bêmecalî ji reşka çavên wî di rija!... Ew çavên têr ronahî çilmisî bûn. Cewhera rojê jê winda bûbû. Bê fer, korîk, bê tewaş vala di nêrîn.



www.arsivakurd.org

Çûkê Beytik şaş bû.
Kund bi wan çavên vala bê ronahî lê di nêrî.
Kund bê, çûkê çil ziman bê, wilo qerem şikandî bibê!...
Ocaxa tuxmê çûkan ji darê Cîhanê tefa. Dergehê jiyanê bi hejan hat asê kirin. Hêvî ne ma!... Xwezî bû tozikek xwelî. Xweliya mirinê!... Xelas!... Çûk şewitîn!... Mal weran bûn!... Bûne girtiyê reş û tariyê!... Çûkên azad, çûkên nîşaniya rumet û xîretê bûn lîstika ber destan...
Gidî gîdyano!...
Xweş memyano!...
Hawar gidî gidyano!...
Mecal tune ye!...
Ev bêçarî nabê xatirê xwedê û xatirnas e.
Hawar bê fêde ye!...
Felek xayîn e!...
Çûkê Beytik bi dilekî şikestî, bi dengekî bê hêvî:
-Qendê min, qey te dengê min nekir?...
Kund çavên vala bi ser Çûkê Beytik de kûdkûdandin.
-Belê Beytikê min, min dengê te kir.
Dengê Kund ji kuraya Bîra Zerzemî derdiket.
Dengê bêçariyê, bêzariyê bû... Melûl, bê rewa!... Peşka can di wî dengî de tune bû. Wilo hişk û zuwa!...
Beytik ne got ez li dîwan û koçka kurê ciwamêra me. Ne got şerm e... Dengê xwe bilind kir.
-Qendê min, xeraptir ji wan çûkên din li te hatiye. Hêviya min tu bûyî. Te bi carekê ew hêvî

hunda kir. Min hêvî yên pirr mezin ji te dikir. Tu aqilmendê Siltan Silêmanî, tu heval û hogirê Şahmaran î. Ne ji xwe ve, qedr û qiymetê te li cem Siltan pirr e. Tu qendê çûkan î. Me hêviyên mezin ji aqilmendiya te dikir. Ji rêyekê, ji şîvîlekê!... Erê derd pirr mezin e, lê ne bê derman e!...

Bi galgalên Çûkê Beytik re Kund lebitî.

Şahmaran jî di cihê xwe de çû hat.

Civatê bi derbekê re şor qut kir, li Beytik guhdarî kir. Dabaşa civatê bû sedema çûkan û axaftina Beytik. Devê xwe xistine ber gûhê hevûdin û bû pist-pista wan.

Kittên li kesî ne diket.

Beytik dêhnê xwe da Kund. Li nîvê çavên wî nêrî.

Di reşka çavên Kund de, çirisayiyek pêket û winda bû.

Kêfa Çûkê Beytik hat. Ev, biçûk bê jî, nîşaniyek bo xîretê ye. Li dora xwe nêrî. Civatê bi serde guh pêl kiribûn. Lê guhdarî dikirin.

Ji xwe re:

-Hindik bê jî, min ya dilê xwe agahdarî civata Şahmaran kir. Niheqiya hatî ser me xweş fam kirin. Wê tiştek bibê. Teva, kesên xwedî şor û kesên di cihê xwe de dinanek in. Kesên bi xatir û qedr in. Şora wan heq tînê... Gotin û galgalên min wê wan bi ser doza me de bajoyê. Hê jî lazim e!...

Çûkê Beytik degel bû.

-Qendê min, guh bide bendê xwe, derd çiqas mezin bê jî, ne bê derman e... Xwedê derd daye

derman pê re!... Fermana Siltan Silêman qelandina me çûkan e. Tefandina ocaxa tûxmê çûkan e. Çûk bi pirtik û firra xwe çûk in. Bê çawa mar bi kûffên û fîqên û zehra xwe mar bê!... Fîl bi girş û mûrên xwe Fîl bê!... Mîro bi hûrikbûna xwe û kar û barên xwe mîro bê!... Çûk jî bi pirtik û firra xwe çûk in. Pirtikandina me, ne bes cîlên me, nifşên me bi tenê di weritînê. Nebîçirçirkên me jî dibin girtiyê reş û tariyê. Cîhan li me dibê zîndan. Mîzêna xuzeyî ber bi rexekî dibê. Çûk ne ê reş û tariyê ne. Çûk ne ê ber destên xêro-dêro ne. Çûk ê ser kuç û latan, ê ser dar û deviyan e. Da Şalul û Bilbilên me di bexçê kurê ciwamêran de, di dîwan û koçkên kurebavan de bi dengên zêrîn sitranên xwe bibêjin. Divê em li ber xwe bidin. Li ber xwe bidin. Li ber xwe bidin...

Kund şora Beytik birî:

-Çawa Beytikê min, Çawa?...

Beytik bi hêrs:

-Bi çi lewnê hebê, bi çi miqamê hebê... Pêşî em, axaftinê, têkilî û galgalê bi ceribênin. Ku ne bû, dost û nas û merivên xwedî ol û tol, xwedî bext û bi xîret bikin navberê de, bila herin cem Siltan Silêman, sedemê bênin ziman. Divê em, doza xwe bibin koçk û dîwanên kurê ciwamêran... Meriv hene, cin hene, rawîr hene!... Rawîrên avê, yên bejê!... Ciwamêrên weke Şahmaran hene, ciwamêrên jibav û kalên xwe de xwedî koçk û dîwan, xwedî hêz û cih û war... Ku gotinek ji ê wan li cem Siltan Silêman pirr biha tênê. Qet galgalên wan li erdê na kevin.



www.arsivakurd.org

Gotin û galgalên wan li cem mîra, li cem siltan û pêlewan û cengaweran biha tênê... Siltan Silêman nikarê gotinê wan bi şikîne. Em jî, wan bixin navbera xwe û Siltan Silêman de... Pêşî ciwamêrên Şahmaran... Ji wî dest pê bikin... Şahmaran di jiyana Cîhanê de xwedî cihekî mezin û galgalên wî jî cihekî giring di girê. Ev meriv û dostên me, ev xwedî doz û berpirsiyarê jiyanê, yên Cîhanê, yên xuze bila xwe diber me de, diber Cîhanê, diber xuze de bi êşênin. Bila arîkariya me bikin. Em dostê wan in. Em ne dost bin jî, jiyanek tevayî, Cîhanek şirîkatî, xuzeyîk bi navendiya aborî di navbera me de heye.

Kund serê xwe hejand.

Bi wan çavên xar û kîldayî li Şahmaran nêrî.

Lêvên Şahmaran bi beşûşeke delal ji serhev çûn.

Diranê wî di nava wan lêvên sor î sosinî de xûya kirin. Ya Yezdan, ew beşûş, ew ronahî, ew delalî, ew nefesa melûl û dengê xuzeyî!... Dermanê evîndarê dil kurmî!... Dermanê dil û çavan!... dermanê şahî û geşiyê!...

Şahmaran bi wî dengê zelal û têr ronahî şor kir:

-Çûkê delal!... Berî tu bê, ne bi tuwî qasidê min ji cem Siltan Silêman vegeriya. Mixabin tiştek ne xiste destên me.

Mûrê Çukê Beytik parîkî şikestin.

Xwe zu da hev.

Berê xwe da Şahmaran:

-Şahê min, carek din, yeke din... Birîna min taze ye... Bila ew me qebul nekê. Daxawaza me red

bikê. Gotin û galgalên me li erdê bixê. Emê kûr lêxin, dur bi fitilin... Dawî, ya me teva yek bê, Siltan Silêman wê pêwistî faslê bibê.

Bi şora dawî Şahmaran jî tevlî berxwedana Çûkan dikir.

Kund şora wî birî:

-Çûkê min, bi kelgermî tiştek safî na bê. Tu haqqê me jî li dost û hogirên me tune ye. Bo wan tevlî şerê xwe bikin.

Kefa Beytik hat.

Ber ku Kund qala dozê û şer kir. Ev nîşanî ya berxwedanê bû. Ronahî bi rûwê wî ket.

Xwe mêkûtkî li erdê da:

-Qendê min wextê me tune ye. Divê em tiştekî bikin... Sekin û tewlên vala bo me mirin e. Wext tune ye!...

Kund, qenc û qenc geş bûbû.

Berxwedana Beytik, hêrs û tuqla galgalên wî Kund ji tevizandina neçarî derxist. Ronahî xiste reşka çavên wî...

Dengê wî xweş der diket.

-Baş e!... Emê bi çi lewnî çine ser sedemê? Divê ku mecal hebê. Piştir rê!... Em nikarin gava xwe ji reş de bavêjin. Gav avêtina ji reş de mirin e.

Heya ji Beytik hat qîr da...

Bi zirt û galgalên vesifdan şorkir:

-Qendê min, mirin ji xwe li devê deriye. Tu jî, Şahê min jî, civata wî jî xweş li min guhdarî bikin. Ber ku ev gotina min pirr giringe. Key Belkîs ne

www.arsivakurd.org

nexweş e!... Parsuwên wê ne şikestine. Telaqreşiyan dikê. Armanca doza wê cuda ye, meremê wê hene, çavên wê li pirtikandina me çûkan e. Wê tûxmê çûkan ji ber xwe û hefrîtên xwe bidê alîkî. Bo hikmê wê bêhtir ji ê Siltan Silêman bê. Li ser ruwê erdê, li bin ruwê erdê asil ew bê. Bes asil ew!... Ku kesên dilxwazê Siltan Silêman li dorê nema, ma ew bi tenê, çi bêjê asil ew e. Yekemîn çûk da ne ber himbêza xwe, duyemîn ya mar in, yan jî wezîr û aqilmend in.... Sêyemîn wê bibê hinek din. Her û her daxwaza telaqreşan bêbextî ye, derew û nîq in. Jiyanê bi çi meqamê hebê, bi çi rê û rêçikan bê divin bikin bin himbêza xwe. Ku ferece dîtîn jî, tuxub nasnakin. Qenc ket, xerab ket na nêrin. Ew li karê xwe di nêrin, kes hatin kuştin, kes hatin perçiqandin ji wan re ne xem e. Ber ku dilê wan têra xwe bi qirêj e, têra xwe bi gemar e!... Dilê merivên wilo bes qirêj û gemarê zerkî nava rayên leşê wan dikê. Mêjiyê wan bo xerabî û fêda şexsê wan ava kîmyewî tevger dikê. Key Banû Belkis jî yek ji wan kesa ye!... Hin bi hin wê kes û kusên xêr xwaz û terefgîrên wî ji dora wî bidê alîkî, wan bê ziman bikê. Ku demedor safî kirin asil ew di mênê. Cîhan bi xêr û tejiya xwe ma di bin bandura wê de. Sedem ev e!... Vêna xweş dizanibin.

Parîkî sekinî. Bêhna xwe berda.

Car din dest bi axaftina xwe kir:

- Gelî civata hêja!... Hun ne ê şîreta ne. Kesê mîna we aqil didin, rêbûwaran şanî kesên weke min dikin.

X X

X

Mirrrên li binê kolê ket...
Devê wan ma ji hev...
Li hevûdin nêrîn...
Lêvên xwe gez kirin...
Serê xwe hejandin...
Şahmaran û Kund jî li hevûdin nêrîn...
Bi nêrînek şaş û heyirî....
Şaş bûn...

Bawer ne kirin!... Bawerî ne dibû jî!... Dabaş ne ya baweriyê bû. Suc mezin bû. Gûnehkarî mezin bû. Jiyan reş û têr gemar, têr qirêj dibû. Jiyana bi çirav, têr gemar û têr qirêj nabê. Rojekê berî rojekê divê bê paqij kirin. Na xwe!... Na xwe jiyan bi bingeha xwe ve wê li hevûdin bikevê, tertubela bibê. Cîhana gewrik na mînê ava, wê bibê xerabciha malwêran. Serê sekih gunehkariyan bikê, tevger nabê, mirovantî nabê, bihevre rabûn û rûniştin çê na bê. Civata mirovantiyê na gerihê. Danûsitandin çê na bê. Kes li kesî êmin na bê. Berpirsiyarê jiyanê neyartiya bendê xwe bikê, jiyan zor e. Na bê!... Çê na bê!... Ne merivantî qebûl dikê, ne xîret!...

Tiştê ku Beytik got, gunehkariyek pirr mezin e.



www.arsivakurd.org

Ev gunehkarî, ji destên Key Banû ya Cîhanê bê hê bêhtir zor û zehmet dibê. Qêlek pirr mezin e. Kêmasiyek pirr mezin e. Pirr tiştan bi xwer tînê. Nexasim ji bo kesên mîna Şahmaran. Şahmaran, ji jiyana bi rûmet û xîret pirr hes dikir. Ji derew, nîq, bals û telaqreşî, xap û rîpan pirr aciz bû. Hîletê wî diçû!... Cênîkê wî di arihan!... Xwe liqasî Siltan Silêman û jê bêhtir berpirsiyarê jiyanê di dît. Berî her tiştî, berî her kesî, gere berpirsiyar rast bin, dirist bin. Xwedî soz û qerar bin. Dil bi rehm û xwedan xêr bin. Xêr xwazê jiyanê, xêr xwazê bendê xwe bin. Tevgera jiyanê xweş û geş bikin. Ne ku reş bikin... Ne ku fitnê, gelaciyê, derew û nîqa bikin. Bi xap û rîpa bendê xwe ji masetê rakin, kor û kuloka, seqet û şiloşat bikin. Qotikê berdina nava wan, bidine qelandin. Bizrê wan ji ser ruwê erdê bidine miştin.

Ku wilo bê, Key Belkîs, Siltan Silêman li ser destên xwe di leyizênê. Di pirr kirin û karan de destê wê heye. Di neqancî û xerabiyan teva de destên wê heye. Heya îro reşiyên dibin, bêbextiyên têne serê kes û kusan ji destê wê ne. Zîndan ne belaşhewqasî dagirtiye. Ne belaş kes têne girtin, têne kuştin. Sedem kûr e!...

Ji bo Siltanê Cîhanê, destên dota Mîrê Cina pirr xerab e.

Jiyan ne di bin êmnetiyê de ye.
Bende ne di bin êmnatiyê de ne.
Bextê jinê mîna tavê beharî bê ewlê ye.
Ev li darê Cîhanê na bê...

Nayê qebul kirin...
Kund berê xwe da Beytik.
-Tu ji kuderê agahdarî vê dabaşê bûyî?..
Beytik sekinî...
Ev dabaş ji berbetanê ûrê xwe derxistibû.
Wê kêlîkê kete serê wî de. Çawa hat aqilê wî, wilo got. Berî niha di guhê çend çûkan de got, ev dabaş anî meydanê, kesî guh nedayê. Li vir, ji nişkê de hate bîra wî û got. Li ser dabaşê mijul ne bû, dinava mêjiyê xwe de ne sar kir, germ kir... Li pêşî û paşiya galgala xwe jî ne nêrî... Wê xerab kevê, qenc kevê ne fikirî. Di serê wî de bes ajotina ser sedema fermanê hebû. Bi çi lewnê hebê, ne xem e... Bes ku hevalbendên xwe bo serhildana hember Siltan Silêman û jina wî Key Belkîs peyde bikê... Armanca Çûkê Beytik ev bû.
Ne li gora hewnê xwe çû.
Dilê wî rê şanî dida...
Kete dilê wî û kat da...
Wextê ku ji nava çûkan derket, berê xwe da qûnaxa Kund fikrekî wilo ketibû dilê wî û runişt. Ku Kund xwe bidê viyalî wiyalî weke ku di guhê çûkan de got, wî ji wî re jî bêjê. Lê hewqasî li ser ne sekinî. Da aqilê xwe, lê li ser mijul nebû. Dizanîbû, ku bêjê kes jê bawêr nakê. Benîbeşer lê gûhdarî nakê. Ji xwe jê baz didan, ku derewek, hîlek, nîqek, balsek, telaqreşiyek li dorê bibînin, yekcara xwedê kes tewqeyî wî na dê. Dev ji wî fikrî berda. Lê, li dîwana Şahmaran bi derbekê hekîm hatin bîra

www.arsivakurd.org

wî. Ew hekîmên namdar ku birînê kurmoyî, birînê elemoyî bi dermanên xwe bi hekîmtiya xwe, bi hostenecariya meh û salan sipûsaxlem dikin. Nîv miriyan sax dikin hene. Wan nîvmiriyên lingek ji ê wan di gornê de, bi hekîmtiya xwe di vegerênine jiyana gewrik. Hele hele ew hekîmên li dora Şahmaran... Ji ava jiyanê bigrin heya bi jehra bi heft ava şiştî, kalanê bi tehlaya beruwê hatî avdan, sitirihên mara ku di nava çil û heft şiklên geyê û çil û heft cuda yên rayê dar û kerikan, bi heft dirrên zemanî re, li ber tava heyvê çil û heft meha mayî, bo derdên bê derman li cem wan heyî. Ew Hekîm Marên Kaloke, reş, ku kalanê xwe ji sedsalî û vir de ji ser xwe ne hilanî... Karê wan gera nava dar û devî, kulîlk û geya ye... Bi mehan, bi salan dikevin nava erdê de, li rayên şînayî di gerin... Bo bikin derman... Dermanê birîn û nexweşiyên meriv û rawîran... Ji van hekîmê namdar teva li dîwana Siltan Silêman hene. Meriv bê, rawîr bê, cin bê!... Ji her bendên hekîm hene.

Yek hekîmî bi tenê birîna Key Banû ne dît û ne pêja ye. Ne meriv!... Ne rawîr!... Ne cin!... Ne biçûk!... Ne mezin!... Kesî ne dît!... Ne bû şahit jî!... Ketina wê jî kesî ne dît!... Rabûna wê jî!... Ne dît û ne bînaye!... Tiştek winda ye!... Bê goman e!... Gelo rast e ku parsûwên Key Belkîs şikestine?... Siltan çûye oda wê, derketiye û fermana serê çûkan rakiriye!... Hema yek bi tenê, yek bi tenê jî der ne diket, ji wan kesên ku dîtî, bûyî şahit ev tişt ne di got!... Qiyamet ne rabûye, qotik ne ketiya nava cêrî,

xizmetçî û berdestîkan, hey yek ji wan wî bibînê. Na!... Bes Key Banû gotiye, Siltan Silêman bawer kiriye. Hewqas!...

Ne li dîwanê, ne li derî dîwanê bo birîn û êşa wê tevger çê ne bû ye. Ne li aliyê malê, ne li derî aliyê malê ji bo nexweşiya Key Banû tu tevger çê ne bû ye. Ne li qesrê ne li derî qesrê bo çareseriyekê kes ji cihê xwe ne lebitiye. Wilo nexweşî çê na bê. Na kevê aqila de. Wilo derman jî çê na be. Pirtik û derman!... Heke derman e, pirtikek, dudu, sisê, çar, deh, bîst, pêncî, sed, hezar!... Lê pirtikandina çûkan teva!... Ev ne bû derman, bi rastî jî bû ferman!..

Çûkê Beytik ji xwe razî:

-Kesî ku van gotinê min bikê derew heye? Çi delîl di destên wan de hene ku ne rast e? Hekîmek, aqilmendek, dermanpêjek!... Wezîrek, cêrîyek, xizmetçîyek!... Kîîî?...

Sekinî, li dora xwe nêrî, li tuqla gotinên xwe û himeta wan nêrî... Civatê bi yek carê gûh pêlî ser kiribû.

Dijwar bû:

-Hekîm, ji hekîmê Şahmaran ne bêhtir, ne hekîmtir, ne zanatir... Çê ne bê ku hebin jî... Pirr kes ji wan hekîma jî li Qesra Qutsê kar dikin. Siltan Silêman bêyî wan hekîman parîk nan na xwê, peşek av na vexwê. Bo çi, ev hekîmên han ne birin ser birîna Key Belkîs?

Dabaş kete serê Kund de. Di nava mêjiyê wî de cemidî.

Hê li dîwana Şahmaran, dabaş xelas nebûyî, qîrên û hawar li serê Bagokê ket. Ziha, tîremar, kerekor, marên bi zengil û yên ser kevgîr, biçûk mezin bi yek carê rabûne ser lepa...

Kûlmoza mara ber bi dergehê bexçê qesrê ve bezî...

Erd û azman bû mar...

Ji fişşe-fişê, ji kûffe-kûfê, ji fîqa-fîqê erd heja...

Maran serê xwe hilda, mil dan hevûdin bû ne sênc...

Tîremar bi qefla bi qefla di ser qesrê re, di ser bexçe re çûn û hatin. Mişşên bi azmên diket...

Ne bi tuwî, cinek zirav û dirêj hat liber Şahmaran sekinî. Temenna kir.... Bi zimanê xwe tiştek ji Şahmaran re got.

Çavên Şahmaran di nava serê wî de mezin bûn. Hinarkê ruwê wî gih sor dibûn, gih reş... Her du rayên pê çavên wî liqasî telîyek mezin bel bûn, ji hev kişîyan... Kesî hew wêrabû li çavên wî binêrê... Her du çavên wî mîna du parangan, agir di barandin. Firnikê pozê wî fere bûn... Bi nefesa wî re, cemê pozê wî miç û bel dibûn. Di rabûn, di runiştin... Ew lêvên delal, xweşik, sor î sosinî ji ser hev çûn.

Hêrs bû, bi dengekî bilind bi ser qasid hilket...

Ji qîrêna dengê wî çiya hejiyan.

-Here bêje Siltan Silêman, ev xwesteka wî li darê Cîhanê ne hatiye qebûl kirin. Ji teref min jî nayê qebûl kirin. Ew şerm nakê, lê em ji xwe, ji navê xwe û bav û kalên xwe şerm dikin. Daxwaza

wî, şermezariyek pirr mezin e!... Erê Siltanê me ye, lê bila Siltaniya xwe dizanibê... Kesî mêvanê xwe bi destên xwe teslîmî leşkerê kesî ne kiriye. Heya ku ez bikim... Çûkê Beytik heya li qûnaxa min e, emanetê min e... Ev cih, ev ax ji min û gelê min tê pirsiyarî.

Bêhna wî pirr teng bûbû. Sekinî... Nefes da û sitand... Kûffên pê ket. Gotina dawî got.

Gotin ji nava dinanê wî bi zorê der diketin.

-Here bêje Siltan Silêman, bê Şahmaran gotiye: Ser ruwê erdê, bin ruwê erdê ne ji te bi tenê tê pirskirin. Xeyr ji te hinek din hene ku berpirsiyarê Cîhanê û jiyanê ne. Ne bes tu bitenê yî... Bila ne li dilê xwe guhdarî bikê, bila serê xwe jî bi kar bînê... Gotinê min yek bi yek jêre bêje, ji bîrneke, tu xilafîyekê bixê galgalên min de, raîmanallah tu bi kevê bin heft tebeqê erdê de, tu ji lapê min xelas nabê. Bejiyê de, bê te yek kiriye, neke dudu... Eyn wilo, bêje te yek kiriye, emanet neke dudu...

Qasid kezab qetandî bû. Xwîn tê de nema. Reş qeliya. Ji serî heya binî realî.

Bi lezeke heyr û hebitî, temenna kir û bibaz ji dîwanê derket.

Civat teva, Kund, Çûkê Beytik jî sedem fam kir in. Xebata Beytik çû gûhê Siltan Silêman. Li tillê wî ket, pê ne xweş hat. Fermana serê wî rakir. Hefrît lê di geran. Ketine ser şopa wî... Cîhan tev û lev da ne. Agahdar bû ne ku li qunaxa Şahmaran e. Hatine devê derî û Çûkê Beytik dixwazin. Bo, bigrin bibin

dîwana Siltan Silêman...

Kund da xwe rabû.

Çûkê Beytik jî pêre rabû.

Kund destûr ji Şahmaran xwest:

-Şahê min, bo arîkarî û piştgirtiya te zor spas. Ser me, serê te jî wê bikevê belayê. Bibexşîne!... Divê ku em bi destên xwe doza xwe safî bikin. Erê, em hewceyî piştgirtina dostên mîna te ne; lê divê ku em li ber xwe bidin. Ku em ne bin, dost jî nikarin tiştekî bikin. Divê pêşî em hebin... Em parîkî zorê li Siltan bikin. Ku me zor lê kir, zora dostan wê wî zu bînê ser rê. Destûr hebê, ez ê herim!...

Şahmaran bi wî dengê zêrîn:

-Qandê delal, dizanibe ku ez li pişta we me. Bila Çûkê Beytik mêvanê min bê. Heya em bi nêrin dewr çawa dibê. Carek din, ezê qasidekî bişînim. Bila serspiyên me jî, li ser sedemê mijul bibin. Belkî rêyekê bibînin.

Çûkê Beytik çû ber textê Şahmaran sekinî.

-Şahê min, bi bexşîne, min divê ku ez jî bi Qandê xwe re herim. Wilo baştir e. Çûna min çêtire ji mana min. Mana min jî tu fêdê nadê doza me. Li nava çûkan teva navê min, bi berxwedanê derketiye. Divê ez li pey vê dozê herim. Domandina dozê, kûdandina berxwedanê wê dilqewîniyê bidê pirr çûkan. Ev sedem pirr girînge... Pirtikandina me mirina me ye. Bila zîndan bê!... Ne pirtikandin bê!... Bila mirin bê ne pirtikandin bê!... Zor spas!... Ez li qûnaxa te bi mînim sed kes hene ku bêjin Çûkê Beytik ji bo

pirtikên xwe bi tenê ew qerebalix dikir. Ku ne wilo ba ye, na diçû li Qesra Şahmaran pal ne dida. Ev galgal û lom wê bibê şikestîkek pirr mezin, bo dozê!... Min ev navê!... Zor spas!... Daxawaza min ewe, ku dostên mîna te piştgirtiya me bikin. Tu û kes û kûsên xwe teva sax bin. Navê te tim li Cîhanê bê!...

Lêvê Şahmaran ji ser hev çun.

Bi dengekî zirav, nerm emir da:

-Mêvanên me heya bi tixûbê Newala Mîruwa bibin.

Ev, xwedî derketin bû. Himandina Kund û Beytik bû.

Dilqewîniyek pirr mezin kete nava her du çûkan. Axlebe jî, bo Çûkê Beytik. Bi hatina xwe kêfxweş bû. Hem ji bo dozê, hem ji dîtin û naskirina Şahmaran!... Bez û leza wî belaş ne çû.

Di dilê xwe de got: "Lingê min toz girt."

Çawa ew lêvên ziravî tenik, sor î sosinî lebitîn, ew dengê têr evînî derket, mişşên li koma tîremaran û ziha ket. Bûne rêz, hin bi rê ketin, hin li devê dergeh sekinîn.

www.arsivakurd.org

X X

X

Kund li pêş di çû, Beytik li duv... Berê xwe da ne Newala Bûnisra. Kund rê dûr dikir. Rêya wan ne di wire bû. Gere berê xwe rast dabane Sinceqê. Di jêra Nisêbînê re, rast û rê berê xwe dabane Qutsê. Beytik bê qerar li dora xwe nêrî, dizanîbû rê ne di wir re ye, lê deynekir. Bê deng li pey Kund firrî çû. Kund, dizanîbû ku wê hefrîtê cina kevine pey şopa wan de. Çawa tîremar û ziha ji wan bi qetin wê li wan bêne hev. Wan berdest bikin. Çengê û perrê wan li nava pişta wan li hevûdin suwarkin, bi şelît û werîsa qenc girêdin, dine duv xwe kişkişênin, bi eziyet û rebenî, bine dîwana Sıltan. Wî ne girin jî, xelasiya Çûkê Beytik tune ye. Lê, Çûkê Beytik jêhatiye, wê li ber xwe dê. Ku kevir û kuç, dar û devî hebin, zu bi zu berdest nabê. Heya nêzîkî qesra Siltan wê xwe himênê. Çiqas nêzîk berdest bibê, çiqas zu ne kevê destê hefrîtan de, wilqasî hindik wê bê perçiqandin. Newala Bûnisra dirêj e. Heya xelas bikin Çîyayê Omeriya tê, Berîya Qesra Qenco, Serdorê Harranê, navbera Derya Spî û Çîyayê Kurda teva têr dar û devî ye; têr lat û berzehên bê qam ın. Beytik rawîrekî hurik e, sivik e. Wê di nava

xirrêm û xerbanda de xapa li xwe bidê. Zu bi zu berdest nabê.

Hefrît, kesên bê ol û dijmin in. Xwedê ne nas in. Romî ne!... Nanê wan li ser kaba wan e!... Êmnatî bi wan na bê. Kî dizanê, belkî Beytik bi kujin jî. Herin bêjin bê revî ket, serê wî li kuç ket, mir. Sed nîqî ji bikine sitûwê wî. Heçî hefrît in, bendê Key Banû ne, fêrî nanê ber destê wê bû ne. Fêrî wesifdanê, fêrî pesindanê xatûna xwe bû ne. Hovên bê hewn in. Vê kelkela havînî, şev û roj li duv Beytik, derek ne ma ye ku tevûlev ne da ne. Pirr westa ne. Bêhna wan teng bû ye. Kûla Beytik ketiyê dilê wan de. Lê bi merem in. Ku wî zemt bikin wê wî êşênin. Hê ne gihandî dîwanê wê tengezar bikin. Ya wê kujin, yan jî nîv mirî wê gihênin qunaxê. Di fikirê û di lezênê. Qet şun xwe de na nêrê. Qet tiştekî na bêjê. Heya jê tê di lezênê. Çîya û çîya diçê.

Qeflek tîremer û ziha li pêşiya wan e, yek li duv wan e. Çendek jî di demedorê wan re diçin.

Hefrîtê cina dur dure di ber wan re tên. Komek giran e. Teva kesên ji xwe qayil in. Teva kesê neqandî ne. Teva kesên ceribandî ne. Çavên xwe ji wan qut nakin. Bêhnefişk li wan ketiye. Westane... Qeherîne... Fişfişa wan ji dur ve tê.. Di bin çavan re li Kund û Beytik di nêrin. Ne wêrin nêzîkî wan jî bibin. Ji rexekî ve tîremar û ziha... Tembiha Şahmaran!... Dizanin ku nêzîkî wan bibin wê şerrekî pirr mezin çê bibê. Marên Cîhanê wê li wan bêne hevûdin. Pirr xwîn wê bi rijihê. Ji rexê din ve, qewêtiya

Siltan Silêman heye. Bo di erda Şahmaran de dest nedin Çûkê Beytik. Di eyarê xwe de di fetisin... Ehda lê di xwênin...

Lê hew tiştek ji destên wan tê.

Bi vê temtêletê heya bi tixubê Newala Mîruwa çûn.

Wextê nêzîkayî li Newala Mîruwa kirin Kund li xwe zîvirî. Dengê xwe li Beytik kir.

-Çûkê min, hey ji xwe hebê. Parastina maran heya bi vir e. Em gihane tixûbê Newala Mîruwa. Mar wê vegerin, em bi tenê ne, divê em bi xwe li çareseriya xwe bi nêrin. Tu li min ne nêre, ê di xeterê de tuwî. Zu bi zu xwe nede destê wan. Li te bi kîn in. Wê te bi êşênin. Heya ji te bê xwe durî çavan bike. Xwe hilêne, bi dizî xwe bigihênê nav rafê çûkan. Tê çêtir di nav wan de hûnda bibê. Tedî hina ji çûkan jî li xwe qewimand. Li ser te xeyîdin, xwe da ne rex te. Ka ew roj!... Ka ew roja ku çûk serê xwe rakin. Berxwe bidin!... Kanî ew roj!... Ew roja pîroz...

Kund di nava gotina xwe de keserek kûr berda.

Hê gotina Kund xelas ne bûyî, Çûkê Beytik li xwe da. Ber bi azman hilkişa.

Bakir:

-Qendê min, ev hefrîtê han zu bi zu min na girin. Xeyala meke... Heya tu bê bes xapê min hene. Ez hûrik im... Ezê xwe gihênime rafê çûkan. Bo wan agahdar bikim. Bo dizanibin tu hatî. Hatina te wê dilqewîniyê bidê teva. Bo dizanibin hevalbendê me hene, piştgirtiyên me hene. Da zu neçin xwe teslîm

nekin, xwe nedin pirtikandin. Şermezariya mezin e. Ku serê xwe ne rakin, berxwe nedin, bila li hêviya te bin, heya tu bi Siltan re bi axifê...

Kund serê xwe hejand.

Beytik ji ber çavan winda bû.

Heydênî bi hefrîtan ket. Bû hor-hora wan û hêrîş berdane Beytik. Her yekî bi deverekê de bezin. Lê zîvirîn, bo rê li ber bigrin.

Dengê xwe kirin.

Çîya, newal û dar û devî ji dengê wan hejiyan.

-Bernedin, bigrin!...

-Ji çeng û pera bikin!...

-Li pêşiya wî bi zîvirin!...

-Rê ne dinê de!...

-Cihê ku we lê girt, bi pirtikênin!...

-Vî çûkê weke lepekî!...

-Ne weke xweye jî!...

-Karê ji xwe mezintir dikê!...

-Bigrin, niklê wî bixin nava gu de!...

-Bo bibê ders ji çûkan teva re!...

-Bo, yekî din gu nexwê!...

-Vî xwar, da yek ji wanê din bi bavê xwe re gu ne xwê!...

-Lê bi zîvirin!...

-Bernedin!...

Dar, devî, lat, kuç, rizde, geya bi ziman bû dengê xwe li Beytik kir.

Hêstirê zuwa di çavên Kund re xwe berdan. Kela girî kete qirka wî de... Hember zilmê, hember



www.arsivakurd.org

zorê, perrê firrê jî ne xelasiye. Çûkê Beytik ne belaheq hemberî Siltan Silêman derdikevê. Berxwedan ku nebê, jiyan tune ye. Jiyana bi çepelî, jiyana bê xîret ne jiyan e... Ziyan e!... Gîdîtî, gemarî ye!... Ne karê merivan e... Kêlîkê berî kêlîkê xwe bigihênime Qesra Siltan Silêman. Xwe bi gihênime dîwana wî... Bi nerim çîye ev? Sedem ji ku derketiye? Key Belkîs çûk bi yek carê raçevî xwe kirin e. Çi ji me dixwazê? Me tiştekî xerab li dehma wê ne kiriye. Em ji gotina we derneketine. Vê micalkeysiya ha çima li derba me dikê, nizanim. Sedem heye. Lê çi? Ji ku, ji ba kê, bi fesadiya kê ev derb li me çûkan ket? Me tu xerabî bi tu kesî ne kiriye. Em ne ketina nava garisê kesî de, me werzê kesî ne quraftiye... Me tehlik û harsimê kesî xera ne kirine. Çima?... Ji ber çi?... Hefrîtê cina berdane nav ser û gûhên me... Ne dîn bi wan re heye, ne îman... Ne dizanin xatir çîye, ne dizanin biçûk û mezinatî... Ev çûkê han, liqasî lepekiye... Bi kevê nav lepê wan de, wê wî guveşin... Bi hingişk û derbehişka wê firşikê wî werimênin. Wê hinavê wî teji xwîn bikin. Ji derbehişka wê elemoyî bibê. Xwedo tu ji ba xwe çêbikê... Rakê ji vê sedemê re bibînê. Çareseriyekê kêlîkê berî kêlîkê şanî me bidê. Tu derd didê, derman jî pê re... Ku ne tu ji ba xwe çêbikê... Karê me bi heyho ye!... Siltan Silêman di destên jina xwe de bû ye lîstik. Bêjê reş e asîl ew e, bêjê sipî ye asîl ew e... Heyf û mixabin!... Heyf û mixabina mêran!...

Horhora hefrîta bi pey Beytik de!...

Çûkê Beytik heya ku jê hat xwe hilda, heya ji ber çavan winda bû.

Hefrît jî ne hindik bûn. Gavekê bitenê ji duv Beytik ne qetiyan. Çiqasî xwe hilda wan jî xwe hilda. Ha gihanê, ha gihanê, ha girtin ha girtin. Çûkê Beytik nêrî ku bi vê rawşê xilasiya wî tuneye. Hefrît lê zîvirîn. Fetlik li xwe da û berê xwe da hêla Harranê. Bê çare ma. Hew rêya xwe dît. Newala Mîrûwa xelas kiribane Derya Sipî nêzîk dibû. Ne hiştin. Berê wî da ne dîya weleda. Xwişka heft biran... Xwişka bê mirad!... Harranê!...

Harran, hêvî û hawara bê kesan, neçar û kesên ji rê ketî. Hawara kesî bê bersiv ne hiştiye. Hêviyên kesî ji comerdiya xwe qut ne kiriye. Tim bû ye sitara merivan. Tim bû ye pêgih û qunaxa ji rêketiya. Tim û her tim destên arîkariyê dirêjî kes û kusan kiriye. Bû ye dê!... Bû ye xwişk!... Bû ye mêrga aborê ya helezî!...

Çûkê Beytik li jêr nêrî. Ew deşta rast, sipîçolkî, gewre, sohre, nêrî. Xal jê diçû. Germa havînî ew erda sor û gewre dikeland. Hilm bi ser ruwê wê diket. Deşteke fere. Ne kes, ne kûs!... Xirûxalî, xerabcihê zor û zilmê!...

Çavik ji ê Çûkê Beytik li hefrîta ye, ê din li Harranê ye. Berî ku xwe berdê çavên xwe yên hûrik li qozî û xirrêman gerand. Qenc ne tefsiland. Keserek berda. hinekî xwe bi jêr de berda. Dizanîbû, di wê erda rast, bê dunde ji ber lapê hefrîtê cina xelas nabê. Divê xap û fetla li xwe bidê. Bo xap û fetla

jî, gere qozî, xirrêm, şikêr, xerabcih, gûtîn, sitrîzerk hebin. Na xwe xelasî nîne!...

Harran xweş nas dikir.

Ew rêbûwarên qedîmî... Yên kû leşkerê Iskenderê Mezin, yê Sezar û Neron, mêrê jina xwediya çil kerê dohtinê; hêj navê kerr û jina Neron li serdorên Harranê dibin dabaşa çîrok û çîvanokan. Her çil kerê dohtinê her roj di dohtin, şîrê wan dixistine hewtekî, jina Neron dikete nava wî şîrî û xwe dişişt, bo delalî û xweşik bûna Cîhanî, bi saetan dinava wî şîrî de diraza. Hê jî, zarokên Harranê, zarokên Torê, yên topa Kurdîstana jêrî navê tovê geyakî gutînî kirina Hêlikê Kerê Neron... Rêbûwara leşkerê Key Hûsrew, Dara, Selahaddînê Eyyubî... hwd. Ew rêçikên zemanî... Ku ji ber simê hespan hatî kolan, hatî perçiqandin... Cihê tirata têr pîkol... Car din, cardin, car din, çiqasî hatî perçiqandin, hatî pelixandin, hatî belawelakirin, car din, car din, car din hatî xilmetkirin. Tiştên bûyî, tiştên bûyî û çûyî, hatin ji bîrkirin. Lê merivên wê axa kevnare, pîr kirin ji bîr nekirin. Ew xerabcihên bê deng!... Xirûxalî!... Têr gûtîn û pûşê girz!... Qunax bi qunaxa din, di yek rêzê de runiştî... Pişta xwe da ne axa kevnare, têr xwîn û kul. Bo rojê qewamê pelax bûyî, wilo bê deng, wilo bêhn birehayî!...

Çûkê Beytik xwe li teyara Hêlikê Kerê Neron girt. Teyar cotik erd hebû. Serî û binî ji gutinê Hêlikê Kerê Neron tejî bû. Kes nizanê ew erd ê kê ye. Kes cot nakê. Bi destpêka beharê re serê gutina di-

dê der. Ne bi tuwî, tovê liqasî helikê kera xalî şîn bi wan ve digirê. Her helikek ji wan kûlmek tejî şîr di wan de heye. Şîrekî tehloşkî û heya tu bê bes sippî. Di kêleka wê bênderê de çaleke zemanî heye. Li jêra Qesra Qenco dikevê. Çal pirr kûr û tuccarî av jê xalî nabê. Coka çalê nîv qama mêra kûr e. Cok wilo kûr ber bi kûraya Harranê dirêj dibê. Serdorê cokê teva sitirîzerk, pûş û gutinê li qamê ne. Çavên Çûkê Beytik li wê cokê bû. Bigihiyê de, di nava wê re, heya hefrît li serdora bigerin, ha li vir, ha li dera din, cokê bibînîn wê nîvê Harranê xelas bikê. Cok heya bi Girzê diçê. Kû giha Gizrê, îş hesan e. Kavil û xerabcihê Gizrê, şikêr û hêtên di ber hevûdin re direjkirî wê mecal û fereca bazdanê bidinê de.

Bi vê teşlîhê rêya xwe nîşan kir û xwe şidand.

Xwe ji nişkê de ber bi jêrî berda. Bi berdana xwe ra dua kirin.

Hawara min pêşî Yezdan e!... Piştra xwişka heft bira Harran e!... Harran tu agirî!... Agirê bi rimî û pêt î!... Êtûna dilê jiyanê yî!... Berçîçeqa Cîhanê yî!... Dergehê pêxember û ewliyayî!... Pêxember û ewliyayên têr bela û têr hêbet!... Tu dayika miradayî!... Tu sitarî!.. Sitara bê kon û xanûmanî!... Sitara neçara, birçî û mahkûma yî!.. Tu dîrokî!... Dîroka Kurdistan î!... Bêndera qut î!... Qutêsal û mehan î!... Sifra Xelîl Îbrahîm î!... Zingara mêra yî!... Cihê tirata cengê yî!.. Tu zal î!... Tu Lal î!... Tu hal î!... Tu kal î!... Tu delal î!... Tu hem melul î,



www.arsivakurd.org

hem celal î!... Tu zelal î!... Warê keda helal î!... Tu xela yî, tu cela yî!... Mala agîdê bê serî yî!... Hawara min tu yî!... Harran, Harran tu xwişka heft birayên weke şêrayî!... Tê bi serê birayê mezin, bi navê birayê biçûk û xatirê Xwedê û her pêncê dî bikê, tê sitara xwe bavêjê ser min. Tê mi ji destê van zalimê hefrîta bi himênê. Hêviya mi ma ye tu. Tê bi navê xwe yên şêrîn bikê, tê toz û hilma xwe ya germ li nava çav û dev û rûwê wan bixê. Wan şaş û gêj bikê. Bê hiş û sewdan bikê. Herê hayî Harran!... Herê hayî Harran!... Herê hayîî, herê hayîî!...

Bi duayên xwe re kete coka çala zemanî de. Bê çawa rêya xwe di nava mêjiyê xwe de hazir kirûbû, yek bi yek anî cî. Heya Harran xelas kir hefrîtê cina ne gihanê de. Hefrît şaş bûn. Di nava gutin û sitirîzerkan de mane heyirî. Ne dikarîbûn bikevina binê wan de, ne dikarîbûn di nava wan re bi çalepkê herin. Çûke Beytik bi xwe ji nava gutin, sitirîzerk û puş der ne ket. Sînga xwe li erdê sekinand û bi şiddih firra xwe domand. Çawa giha Gizrê, xwe avêtê nava kavil û diwarên herivtî. Kete pişta şikêr û kuçan de. Li pişt xwe ne nêrî. Li pêşiya xwe nêrî û çû. Heya Harran xelas kir ne sekinî. Çawa Harran xelas kir, gurr li xwe da bihawa ket. Bi hewa ket û hey bi hewa ket. Heya ji ber çavan hûnda bû.

Li jor fetlik da xwe. Fereh zîvirî.

Li dora xwe nêrî, şewqa li ser ruwê şînaya Derya Sipî dît. Hêvî di dilê wî de kat da. Kêfa wî hat. Beşişî!.. Hilweşa! Rast berê xwe dayê û perrê

xwe li newqa xwe şidandin. Xwe berda.... Mîna kevirekî hişk, bê serî hate jêr. Hat û hey hat!... Xwe berda û hey berda!... Hat û hat di nîvê komiçka hefrîtan re xwe berda. Hefrît li nava hev qeliptin. Şaş bûn!... Şelişîn!... Serê çendeke ji wan li hevûdin ket, gêj bûn, serûbinî hevûdin bûn. Heya bi xwe hesiyan Çûkê Beytik qedereke baş ji wan dur ket.

Beytik çiqasî nêzîkî erdê dibê, wilqasî jî nêzîkî qûnaxê dibê.

Dizanîbû ku rafê çûkan teva hatine li demedorên Qesra Siltan sekinîne. Ne wêrin herin Qesrê... Ne wêrin vegerin... Wilo di şaşî û bê qerariyê de ma ne heyirî. Bi çi miqamê hebê divê xwe bi gihênê wan. Da, wan agahdar bikê. Bo bêjê, Kund hat wê çê dîwana Siltan, li ser doza me şor bikê. Sebir bikin, neçin, xwe berdest nekin, xwe nedin pirtikandin. Dostên me hene, piştgirtiyên me hene. Xwe li ser me dikin. Ku em li ser xwe ne xeyidin, ew jî nikarin tiştekî bikin. Divê em, pêşî em li ser xwe bi xeyidin, bo ew jî dikaribin li ser doza me bi axifin. Mala xwe bi destên xwe xera nekin. Sebrê bidine xwe.

Komên bê semyan tirsonek in!...

Kor e!... Kerr e!... Lal e!...

Ne dizanê bi rê ve herê, ne dizanê şor bikê. ber xwe jî, serdorên xwe jî na bînê. Bibînê jî, rastiyê, qenc û xwahriyê ji hevûdin na vejêrê. Tim heyîrî ye!... Tevgereke xelto-melto dikê. Bezeke bê zad, xebataka bê bingeh, bê armanc dikê. Her kesî

ji xwe re ye!... her kesî ji dehma xwe de gavê di avêjê. Li gorî aqilê xwe galgalan dikê. Destur tune ye. Destur tune bê berxwedan çê na bê. Bibê jî dema wê kin e. Agirê bê kewn e!... Zu di mirê.

Kes li kesî guhdarî nakê, hajê kesî ji kesî çê na bê, kes jî agahdarî tiştekî na bê.

Beleko bi lepê xwe!...

Pazê bê şivan yan taştê ye, yan firavîn, yan jî şîv e!...

Hin ji gur û kûrrebaşan re!...

Hin ji diz û neqencan re!...

www.arsivakurd.org

X X

X

Çûkê Beytik dijminê xwe qenc û xweş nas dikirin. Weke pêşî hew ji wan di tirsiya. Lê dizanîbû, kû xeletiyek, şaşîtiyekê bi tenê bikê di nava lepê wan de ye. Ku bikevê nava lepê wan, çi bikê, kî herê cem wan, Cîhan teva rabê ser linga, Cîhan ber bi rexekî bibê jî, xelasiya wî tune ye. Xwedê jê sitand. Perçiqandin, êşandin, pelixandin, weritandin, seqetkirin, pirtikandin!... Li devê derî ye!... Nayê gotinê!... Zu bi zu wî na kujin!... Zu bi zu wî na pirtikênin!... Pêşî wê wî çengo bikin, ji dest û ling bikin. Her du çengê wî li nava pişta wî li hevûdin ba bidin. Qeydûmerbet bikin, rê ya bazdan û firê ji ber girin. Hêdî hêdî!... Nerme nerme!... Li gorî kêfa xwe!... Bê lez, bê tirs dest bi perçiqandina wî bikin. Wê eyarê laşê wî bi derzî û şujina bi ser hevûdin de ênin. Pirtikên wî yeko yeko, bi zac û şiddih ji nava laşê wî kişênin. Neynukê wî bi kelbitanê nalbenda kişênin, niklê wî bi çakuç û mezraba şikênin. Nîv mirî, nîv saxî bine dîwana Siltan Silêman. Wilo pirtikandî, eyar qulqulî, derzî kirî, nikil şikandî, ziman jêkirî, çengo kirî, seqet, çav peqandî!... Wilo êbret gerandî!... Wilo şepirze!... Bêbav in!... Bêbavê Şamê ne!...

www.arsivakurd.org

Dizê Misrê ne !... Pêxwasê Diyarbekrê ne!... Teşqalçiyê Sêrtê ne!... Ne dîn heye ne îman!... Ne tol heye ne ol!... Xwedê ne nas in. Merivantî li cem wan tune ye. Zalim in, zor in, kedxwer in!... Romî ne!... Ders ji polîsên Romê sitandina, raîmanallah wê jop û dara kine quna wî de. Wê wî qunek bikin, hê ji nû bine dîwana Siltan Silêman. Piştî hewqas şepirzetî, ne mirovantî te xelas dikê, ne jî dadgehên bi namûs. Tu êdî rabe bangî Cîhanê bike, bangî merivên çê bike, hawara xwe bigihêne serdorên xwe... Bêje wilo û halo, hal û ehwal bi vê ye!... Vala ye!... Xêr nakê!... Ku te sohra xwe xwar pê de!... Here derdê xwe ji Qendê Deywan re bêje. Pûç e!... Vala ye!... Galgal pûşê hişk e!... Bê zad û tewaş e!...

Ew zalimê bê ol û tol wê di nava xelkê de deng pê bixin. Bi merivên hatî firoştin, bi merivên dijmin li devê qehwexanan, dikan û serê zawîyên sûk û çarîyanên rêya dabaşa wî deynin. Li ser şor bikin, salifa wî deynin meydanê. Wê wî şermezar û rureş derbixin. Derew li ser derawa din!... Qêl û nîq û telaqreşiyan li ser bêjin. Wê hildin û hildêrin. Wê bêjin û bi belênin!... Di nava gel de wê eyarê wî ênine pênc otmaniya. Da hew dikaribê gotinekê, galgalekê bikê. Da bibê ders ji kes û kûsan re. Da kes li heq û huquq, li maf û mafgeriya xwe û gelê xwe ne pirsê. Pirsariya wilo, gera li maf û mafgeriyê giran û biha bikin. Da kes nikaribê wî barî hilgirê. Heya ji wan bê wê barê berpirsîyariyê, serkêşiyê giran bikin. Xwedî doz û şikestîkan çav tir-

www.arsivakurd.org

sandî bikin.

Çûkê Beytik ev xweş dizanîbû!...
Ev jî, besî wî û tirsa zêde bû!...
Mirin di anî ber çavên xwe, berdestî ne di anî...

www.arsivakurd.org

X X

X

Xwe ber bi rafê çûkan kişand.

Mefera wî mabû ewder. Tu rêyên din nema bûn. Rê teva ji ber hatibûne girtin. Hin hefrîtê din jî hatin arî yên berê. Hawîrdor bû ne hefrît. Hêr kêlîka di bûrî jî, xeleka dora wî teng dikirin. Bêhn lê çikandin. Nêrî xelasî tune ye. Berê xwe da nava çûkan. Pêşî divabû xwe ji ber çavên hefrîta winda bikê, piştre herê nav çûkan. Lê ne hiştin. Ha gihanê ha gihanê!... Neçarî ew pêwistî nava rafên çûka kir. Di nava hewqas çûk de, Hefrîtan ew hêsanî ne di dît. Berdest ne dikir. Çûk giha bûn e hevûdin. Xilbe bûn.... Erd û azman bûbû Çûk. Kevok, Qiloqişk, Çûkê Sitiriya, Botbotk, Qijik, Qitik, Çil... Çil li ber dêlîyek pirr mezin bû, xwe ji çûkan teva dur kiribû. Nepandî teva sekinî bû. Tim quna qunî dibû. Heta jê di hat xwe dur dikir. Ne divabû bikevê nav wana de. Bûkamişk, Başoke, Mirîşk, Qaz, Ordek, Legleg, Quling, Hacîreşk, Şivan Şitexlonek, Tillurî, Çûkê Hejîra, Baraşe, Bûka Wiş, Zerzul, Toretanî, Tivîlk, Qitik, Dîkê Por, Mirîşkbeşk, Alok, Xulq, Cîelîk, Papaxan, Teyrê Neama, Barbarîtk, Reşane, Susk, Pepûk, Kew, Kewê Gewr, Kewê Çîîr dinava hevûdin

www.arsivakurd.org

de, Mirîşka Bej, Nikilkok, Darkutk, Zerone, Sîsyank, Teyrê Laşe, Keroke, Zilzilîk, Çûkê Zimandirêj, Çûkê Berfê, Duvsotk, Tirlî, Bat, Bilbil, Şalûl, Zilore, Tîtî, hwd. Mil dabûne hevûdin. Raf li rafê din!... Serûbinê rizda, kuç û latan, xirêm û hêt û tibara û şikêr û qulûqawêran; newal û gelî û beroj û guher û best û deşt teva bûbû ne çûk. Ser û binê sitirîzerkan û gutîn û devî û dêlî û mêw û dar û pûşî û çîtik û dirrih teva bûbû ne çûk. Zîr-zîîr û çîr-çîîr bi Cîhanê diket. Rap-rap û tap-tapa peran, raq-raq û taq-taqa nikilan erd û azman di hejand. Biçuk û mezin!... Hûr û gir!... Sipî û reş!... Zer û kesk!... Sor û xemrî!... Belek!... Gewr!... Şîn û qehweyî!... Ji her şikl û texlîtî!... Ji her nîgar û tuxmî!... Mêr û tirsonek!... Ciwamêr û gewende!...

Hê li mijika azman di nava mij û moranê de, bi wî fikrê tevlîhev, awireke dijwar, têr heyr berda nava derya çûkan. Pêl li dûv pêla din li wan diket. Her cara ku perên xwe di hilweşandin, hin ji tirsa, hin ji kasûlî, hin ji bê micalî, hin ji bê çareyî perên xwe li nav milên xwe di hejandin, her cara şeqil li rafê wan diket pêl li duv hevûdin dibûne rêz. Car cara qefl ji ber hevûdin dirabûn, ji hevûdin dûr diketin. Her cara ku raf ji hevûdin di veqetîyan dubendî dikete nava wan. Ji hevûdin diqeherîn, niheqî hebana nebana, pêre pêra hêrîşên dijwar diberdana ser hevûdin. Li hev dixistin. Diketine nava hevûdin de, qirra hevûdin tanîn. Bi nikil û sîng û per û mûran şer dikirin. Suravkê fermana Siltan Si-

lêman di serê hevûdin re der dixistin. Pêre pêre ji hevûdin jî paş diketin. Ya rafê çûkên din diketin navbera wan de, yan jî serkêşên wan li wan di hilatin. Kom ji ber hevûdin paş dixistin.

Çûkê Beytik serê xwe hejand.

–Tuxmê Tillurî ye, evqas dinya di kûtê Tillurî de, Tillurî jî diçê di kûtê çêlîkê xwe de!... Derdê hatî serê wan ne bese, bi hev jî di hilkevin. Tuxmê lot nikarê bi hev re bêjê xot bereket xot; ew tucara na gihê mirada xwe ya xeta cot.

Bû niç-niça wî!...

Bû weytî wetî ya wî!...

Ew bû ku ji qehra dilo jarê ne got.

Hê di wê heyr û qahrê de, tîrek dijwar bi fîqên di ber guhê wî re derbas bû. Ji himmet û fîqêna tîrê pekî. Gêj bû. Hate jêr. Hefrîtan qîr da hevûdin, li hev hilatin û hêrîş berdanê de. Çûkê Beytik zu hate hişê xwe. Nêrî ku hefrît gihanê de. Li xwe da. Hawar kirê Yezdan!... Li dora xwe nêrî, Hefrîtan hawîrdorê wî girtibû. Mefera bazdanê rast û çep û paş û pêş ne ma bû. Ya bi jor de wê xwe hildê, yan jî bi jêr de wê xwe berdê. Jor bo Çûkê Beytik nokta dawî bû. Perê wî hew dikarîbûn wî barî hilgirin. Fira Çûkê Beytik heya bi wêderê bû. Hewqasî dikarîbû hilkişê jor. Xwe bêhtir ji qeweta xwe jî hilda bû. Hatibû devereke wilo ku ji taqet bikevê, çengê wî bi qurimin, hişk bibin, bawî, tawî bibin, weke kevirekî bikevê jêr. Li erdê bikevê bibê hezar û hin parçe. Yan jî li erdê bikevê bi perçiqê. Bi latekê



www.arsivakurd.org

ve, bi kûçekî ve, bi pîjekî darê ve bi zeliqê, bikevê ser dirrih û sitirîna de wê laşê wî bi xurimê.

Pêre pêre çengê xwe li newqa xwe şidandin. Serê xwe qenc kişande nava milên xwe, çavên xwe miç kirin û xwe berneqot berda. Di cih de hate jêr. Heya hefrît li xwe zîvirîn dengê xwe li hevûdin kirin, Çûkê Beytik teqneke baş ji wan dur ket.

Mîna kevirekî, ji azman de hate jêr. Wilo bê serî. Hat û hey hat!... Ket û hey ket!... Hin bi hin ketina wî şiddiha. Nêrî ku hin bi hin ji kontrolê der dikevê. Deverek wê bê ku hew dikaribê xwe ragirê. Perê xwe vekê, xwe bi senidênê heya lingê wî bigihine erdê.

Qederkê wilo hate jêr.

Hêdî hêdî çavên xwe vekir. Bayek tuj li reşka çavên wî ket. Şewitand. Çavên wî tejî av bûn. Kevçika dilê wî êşiya. Pêl dilê xwe kir. Çavên xwe ne girtin. Bes heya jê hat korîk kirin. Çîyakî bilind kete pêşiya wî de. Leqtik li xwe da, ji mitika çiya xelas bû. Lê bi wê leqtê himmet sitand û hê bêhtir hate jêr. Nêrî bê xêr e. Wilo herê wê li deverekê bikevê ku bibê hezar û hin parçe. Qenc li dora xwe nêrî. Rizdek di newqa çiyê de hebû. Ji serê rizdê û jêr de, heya bi nîvê rizdê Pîra Reş tevna xwe huna bû. Di nîvê tevnê de qulikek biçûk hebû. Li ser qulê Pîra Reş, liqasî conegakî qun berdabû erdê, pelax bûbû. Lingê xwe yên çardeh mûrî li dora xwe ha ha di gerandin. Bo nêçîrê sekin ne dikete canê wê de.

Tevnepîrk bi ba re hêdî hêdî weke deydikê di heja.

Mefera Çûkê Beytik ne ma.
Bes jêr hebû.
Kêfa wî jî hat.
Tevnepîrk hêviyek bû.
Hêviyek mezin.

Ya wê li erdê kevê, perçiqê, bê hezar û hin parçe; yan jî wê xwe dahlênê nava tevnepîrkê. Heke tê aliqî û ma di nava tevnepîrkê de, wê bibê xwarina Pîra Reş. Heke kete ser û tevnepîrk qetiya xelas bû. Wê parîkî ragirê, şiddiha wî hêdî bikê, wê leza wî qut bikê.

Rêyek din, tune ye. Ketina ser ruwê erdê mirin e. Ya tevnepîrkê hêvî ye. Jîyan bê hêvî çê na bê. Ceribandina rêya hêviyê her tim başe.

Lêqtek şiddih li xwe da.
Ber bi tevnepîrkê şeqitî.
Hat û hey hat!...
Ket û hey ket!...

Pîra Reş şîyar bû. Pîjaqê çardeh mûrî hejandin. Bi vir de bi dera din de birin anîn. Hin bi hin ji hevûdin vekirin û girtin. Xwe qenc û rind pelax kir. Li hêviya nêçîra ku ji nişkê de ji azmana bi ser de hat sekinî.

Çûkê Beytik jî Pîra Reş û haziriya wê dibînê.

Xweş dizanê ku yek pîjaqê Pîra Reş di pîlaxê wî bi aliqê, çû, bû xwarina wê.

Perrê xwe hêdî hêdî vekirin.
Perrê wî ne vebûn.

Zor da wan. Heya ku jê hat xwe şidand, zor li

perrên xwe kir. Bu qirç qirça rayên bin çangên wî. Bi kotekê parîkî perrê xwe ji hevûdin vekirin.

Nêzîkî tevnepîrkê leqtekî da xwe. Navbera rizdê û quna Pîra Reş raçevî xwe kir. Li wê dehmê di tevnê de bi aliqê jî, heya Pîr li xwe bi zîvirê, pîjaqê xwe dirêjî wêderê bikê, bi wî laşê giran xwe dehlêniyê de hey wê çareserîyekê bibînê.

Ji xwe re dua dikê.

Hawara xwe gihande Xwedê û çiqqas mişayix nas dikirin. Yek bi yek hejmartin, yek bi yek sedeqe û qurban ji wan re gotin. Çiqas dua zanîbûn kirin. Çiqas nifir jî zanîbûn li çûkan, li Siltan Silêman, li jina Siltan Silêman û hefrîtan kir. Sed sixêf û galgalên ne baş li dehma wan hejmartin. Dilê xwe li wan hînik kir.

Hat û hat û hat li ber quna Pîra Reş kete ser tevnepîrkê de. Leqt li tevnepîrkê ket. Ji serî û binî hejiya. Xuşşên pêket. Qeta!... Ji hev bela bû!... Deverek mezin kete tevnepîrkê de. Çûkê Beytik liqasî nîv merşê tevnepîrk bi xwe re bir û bi quna çiyê de serjêr bû. Pîra Reş jî ket. Bi ketina xwe re, xwe çendî rizdê kir. Tevlû tevnepîrkê bi rizdê ve zeliqî. Dilê xwe bi nêçîrê xweş dikir, lê nêçîrê ew li ber xwe bir, hêlîna wê jî xera kir, ew jî di rizdê werkir. Pîra Reş nizanîbû çawa bû, çilo bû, bi çavên vala li jêr di nêrî.

Nêrî ku tevnepîrk qeta û pê re serjêr dibê. Tirsa!... Ba li tevnepîrkê bixê, tevnepîrk sivike wê li hevûdin bê pêçan, wî jî di nava xwe de pêçê. Rewş



www.arsivakurd.org

wê yekcar xera bibê. Weke gûlokekê wê li erdê kevê. Bê sed parçe!...

Heya ku jê hat perrê xwe vekirin, xwe bi tihêlekê kir û li xwe da. Tevnepîrk bi deverekê de çû ew bi deverekê de.

Ji wê tomikê jî xelas bû.

heta tomikek dî bê Xwedê mezin e.

Kêfa wî hat.

Bi kêf û şahî li dora xwe nêrî.

Rafê Kewa li hemberî wî sekinî bûn, li wî û ketina wî di fericîn.

Kew û mêkew!... Cot bi cot!... Kewê çîîrr!... Kewê gewr!... Yên nikil sor, nikil qut!... Kewê ribat!... Kewê celeb!... Li hevûdin bûbûne komiçk.

Kewê ribat sê gava derkete pêş.

Kewê celeb hat li pey sekinî.

Çûkê Beytik ferezende hunda nekir, dengê xwe li wan kir.

—Gelî rafê Kewan!... Mêrxasê Çûkan!... Ribat û celebê ser ferşik û çîtikan!... Xwediyê ceng û nijdên giran!... Mêrên kemîn û ser kozikan!... Hûn bi wan pirtikan, pirtikên gewr, yên belek û hinekirî yên sosinî, bi wan nikilên poz beranî, sor û xemilî tên nas kirin. Hûn, ne deykirî, bê deng, wilo hisûkerrên ji we newê, berxwe nedin, herin dîwana Siltan Silêman!... Heyf û mixabin e!... Şînik û wey ne!... Dilo jarê ye!... Weytî ye li ser we, weytî ye li ser qas çûkan!... Ku mêrxasên me wiha bin weytî û hey weytî!... Ji bîr nekin ku hûn mîna gidiyan bên pirti-

kandin. Ew pirtikê we yên gewr, yên belekî sosinî wê ji nava çeng û per û mil û sînga we bên hilkirin. Winê nêrin ku hûn çilptazî ne. Hûnê nêrin ku ne tava rojê li we xweş tê, ne ba û bahoz!... Hunê nêrin ku ew merivên xwedî koçk û dîwan hew bi deng û ceng û galgalên we qîma xwe tênin. Ew şevên ku birrên li oda diket, ew civatên giran, hew li we guhdarî dikin. Bi wan galgalên we yên şerbêjî, têr mêranî hew qinyatê tênin. Ferqa we û zîxanek ji yê mirîşka na mînê. Hun jî mîna wan zîxanke, hunê di kozikan de bi rebenî di anîşk û ber taqê hewşan de bi lîsin. Hunê nêrin ku hun di nava lingan de ma ne. Di nava lingên bizin û mihan û kahrik û berxikan de, di bin lingê çêlek û nehgon û ga û conegan û golikan de ma ne. Pişkulên sewêl, rîxên dewêr wê bi ser we de bibarin. Hun nema koçk û dîwanê kurê ciwamêran dibînîn. Hunê bibin ê nava sewal û dewaran. Ji ber ku hun bêne pirtikandin ew ribatiya we, ew celebiya we na mînê. Ne hûn dikarin herin ser kozik û kemîna, ne hûn dikarin bi raf û gurrêna xwe kes û kusan bi tirsênin. Ew hêstirên we yên ne sitêlih, çardeh çardeh di ser hinarkê ruwê we re serjêr bibin jî fêde nakê.

Kewa teva guh pêl kirin.

Deng ji wan der ne ket.

Ji wîyalî Qiloqişkê dengê xwe kir.

-Çûkê Beytik, Çûkê Beytik!... Te ev îş pirr mezin kir, pirr bi wel-wele, şaw-şaw û deng kir. Em nizanin ne tu li nav û dengê xwe digerê, ne bi rastî

ji bo doza çûkan vê kêferatê dikê? Ferman mîna tavên beharê ne. Cîhanê pirr rojên wilo reş û têr qerqeşûn dîtine. Her dem ferman, geş tên, reş tên lê zu dibûrin, di ferikin.

Hê Çûkê Beytik bersiv nedayî, Tillurî dengê xwe kir.

–Hin ji me li ber lehiyê herin jî xem nakê. Yê din wê xelas bibin.

Susk:

-Hefrît li duv in jî, devê wî na kevê hev.

Sîsyank, keçeliya xwe xwerand:

-Ka em jî arîkariya hefrîtan bikin.

Çûkê Beytik dîn û har bû.

Sekinî, berê xwe da Sîsyankê Keçel.

-Lo lawooo!... Bav û kalê te her dem gu di xwar in. Heya ku tu niha vî guwî bi bavê xwe re dixwê. Malbata te tim bi dijminê çûkan re kar dikê. Tu ê ser kelaş û laşê bêhn pê ketiye. Tu ji bavê xwe şerm nakê!... Bavê te şerm nekiriye, tê çawa şerm bikê. Were!... Were, arî romê bike, kîrê wan bike quna xwe de!... Were da ez keçeliya te bi sîresotkê bi firkênim.

Ev galgal li tilê Qijikê ket.

Ber ku Qijik jî, ji malbata xwe de, hemberî çûkan bi dijmin re kar dikir. Xwarina goştê bi kurm û bêhn pê ketî û ser birînê kurmî lê serbest dikirin.

Bi qehr û hêrs dengê xwe kir:

-Ev segbav dîse hat. Ber xwe na kevê. Mala xwe bi destên xwe xera kir. Çavên wî lê ye mala

me jî bi ya xwe re xera bikê. Lê werin hevûdin, ji çeng û per bikin teslîmê hefrîtan bikin. Ku em wî ne girin wê helaka me bênê.

Kewê Ribat sê gave din pêş de hat. Ber bi Qijikê zîvirî.

Bi qehir dengê xwe kir:

-Qijike reşe çepelê, tu mêr bê, tê bi tenê xwe berdê pêşiya Çûkê Beytik. Tu deh cara lêyî, fermo tu ew li hevûdin. Lê qûna te ya vijoker ne ew qûne. Çavê te lê ye ku me bi hevûdin bidê kuştin. Rune di cihê xwe de, lê raîmannallah ezê rayê pişta te ji qurm hilkim. Ew ne heddê bavê kesiye ku Beytik berdest bikê teslîmê hefrîtan bikê. Kesê xwe bidê pêş wê min hemberî xwe bibînê.

Barbarîtkê li xwe qewimand, wekê ku dengê Kew nekir:

-Xwedê jê sitandiye. Bêdeng bi mana, hemberî Siltan Silêman ne rabûbane, belkî li me çûkan hatibane rehmê. Ew xezeb ji urê wî derketibane. Lê Çûkê Beytik ne hişt, na hêlê jî. Karê ji xwe mezintir dikê. Galgalê ne karê xwe dikê. Xezeb lê ketiye. Kî wê çê pêşiyê, kî wê bela wî berdê nava serê xwe. Dev jê berdin, çawa dizanê bere wilo bikê.

Botbotkê berê xwe da rafê çûkan:

-Lawooo, lawooo!... Lawooo bes in îcar!... We çûkan xwe jî hetikand, jiyan jî reziland, Cîhan jî lewitand. Erêê ev bar ne ê Çûkê Beytik e!... Bi tenê nikarê di bin de jî rabê. Lê di berxwedana wî de xîret û namus heye, di berxwedana wî de maf heye.

Rastiyek heye. Ciwamêriyek heye!... Mêrxasiyek heye!... Hun teva jî dizanin ku miharkê dayîka Çûkê Beytik di zindan û hepisxana de, di odê perçiqandinê de ne qetiya ne. Bo me teva serê xwe dikê belayê de. Serê xwe dikê şelîta xeniqandinê de. Bo azadiya me teva!... Ne pirtikê wî bi tenî têne pirtikandin. Yê topa çûkan tên pirtikandin. Lê mêranî di wî bi tenê geriya. Namus di serê wî bi tenê de heye. Xîreta wî bi tenê ev zordestî qebul nekir.

Kêfa Çûkê Beytik ji axaftina Botbotkê re hat. Ber bê bezî. Hê ne gihayî cem dengê Şivan Şitexlonek hat.

-Ew jî tebayî me!... Xwene ji me teva çêtir e.

Çûkê Sitirîya ji bin sitirîkî derket.

Dengê xwe hilda.

-Bi qerebalixa vala tiştek safî nabê. Rêyakê, şivîlekê şanî me bidin da em dizanibin bi kûde herin. Hinga em teva ji ta mirin û pirtikandinê derdikevin. Heke berxwedan bê teva, heke teslîm bûn bê teva!... Em bi hev re rabin, bi hev re runin. Her yekî ji dehma xwe de gotinekê dibêjê, çê na bê. Wilo li rê na çê. Heya em nebin yek, dengê xwe bi hev re nekin, ne bes pirtikê me wê çin, cih û war û erd û ling û dest û serî jî wê herê. Kes tu hesaba ji me nakê.

Darkutkê:

-Çûkê Sitirîya rast got. Ji nezanîn hê bêhtir tirs dikevê nava me de. Ji bê semyanî jî em hew dizanin çi bikin. Rafê çûkan di kevina nava hevûdin

de, bi hevûdin re şer dikin. Wilo çê na bê. Pêşî çarekê ji vê re bibînin.

Qijikê car din xwe avêtê meydanê.

-Belkî heya niha Siltan Silêman xwe ji bîr jî kiriye. Kî zanê?

Botbotk aciz bû:

-Lawoo Qijikê tu ber erza xwe na kevê. Quna te ya têr vijik, serê te vala ye, piçik mêjî tê de tune ye. Em, weke salifa Pîra Sêrtê ku diçû Bêrtê (1) ji ber romîyê Siltan Silêman direvin; hefrîtê Siltan Silêman li duv Beytik in, ji darî çavên me ve bi tîr û kahnîk û şûran bêhn lê çikandine, bo şerrê me teva jî leşkerê mezin li Newala Mîruwa kom kiriye, tu qala ji bîr kirinê dikê. Te aqilê xwe xwariye?... Lawoo, hefrît mîna romiya ne, nanê wan li ser kaba wan e, bêbext in. Hêj tu qala tiştê vala dikê. Ew Siltan e, ne weke te sergerdeyê devê deriyê kes û kûsan e. Dizanê çi dikê. Dizanê doza çi dikê.

Çûkê Beytik giha cem Botbotkê.

Sekinî. Bêhn lê çikiha bû. Bi lez bêhna xwe da û sitand. Kef bi devê wî diket. Dilê wî çarkopal lê dida. Ew bû ku ji kuraya sebata sînga wî der ne diket.

-Hevalê heja!... Ez ji cem qendê çûkan Kund têm. Heya bi tixubê Newala Mîruwa em tevde bûn. Gere ew niha gihabê dîwana Siltan Silêman. Bere dilê we di cî de bê. Dost û xêrxwazên me jî hene. Kurê ciwamêra, kurebav li ser ruwê Cîhanê qut ne bûne. Xwe li ser me dikin. Hemberî fermanê der

---

Helbesta **Cigerxwîn**

dikevin. Bi pirtikandina me ne razî ne. Ne razîbûna xwe jî agahdarî Siltan Silêman dikin. Ha ha qasidên wan diçine dîwana Siltan. Yek ji wan Mîrza Şahmaran e!...

Botbotk ber pê qedimî:

-Ev gotinê te rast in? Yan tu dilê min xweş dikê?

Beytik, lingê xwe li erdê da.

-Ji min bawer bike. Xilafî di galgala min te tune ye.

Hê gotina wî di devê wî de neh-deh hefrîtan xwe çendî ser kirin.

Çûkê Beytik li xwe da fêde ne kir.

Hefrît bi ser hev ve, bin hev e bûn ew hişk zemt kirin. Di cih de dest û lingê wî girêdan.

Nêrî ku hate girtin.

Heya jê hat dengê xwe bilind kir:

-Gelî rafê çûkan, berxwe bidin. qendê Çûkan Kund çû dîwana Siltan Silêman. Dost û xêrxwazên me jî arîkariya me dikin. Parîkî hun jî dest hilênin, serê xwe rakin, berxwe bidin, Siltan Silêman nikarê me bidê pirtikandin.

Hefrîtekî devê wî girt.

Avêtin nava lingê xwe. Bi pihîna, bi kûlm û şeqama, bi derbehişka pinihanê... Kudera wî kete ber wan danînê... Kirin gok pê leyistin. Kirin merş û raxistin pêlê kirin. Kirin ax, av lê kirin perçiqandin. Serê wî, çavên wî, devê wî, sînga wî, mil û çeng û tihêl û qurmeduvka wî!... Kuder ber wan ket lê dan. Bi derbehişka nehotî kirin.

Çûkê Beytik, heya jê hat xwe bi ser hevûdin de guvaşt. Mefera himandinê nema bû. Di bin çavan re jî li rafê çûkan nêrî, kî di qermiçê, dilê kê di şewitê. Kî xwe di kê bara kuç û latan de, kî dikevê qulûqewêran de!... Ew kesê xwe bi qermiçênê, mûrê xwe ziç bikê, hêvî ye!... Roj wê bê ku xîret û namûs di serê wî bi gerê, li ser doza xwe qebûl nekê. Hêvî heye!.... Wî jî, heke ferece dît wê xwe li wan kesan bigirê.

Çavên wî li Kewê Ribat ket. Her du çavên wî di nava serê wî de sor bûbûn. Lêvê wî di realîn. Tebata wî ne dihat... Kêfa Beytik hat.

Ji nişkê de şûjinek li quna wî ket. Barên pê ket, ji erdê hate hildan. Mefera wî nema, hew debora wî bû, destê li ser devê xwe gez kir. Birrên bi hefrît ket...

Çawa devê Beytik vebû bangî çûkan kir:

-Hun dizanibin ku parsuwê Key Belkîs, keça Mîrê Cina, jina Siltan Silêman ne şikestine. Derewan dikê. Ev derew ji berbetanê urê xwe derxistiye. Li derba me çûkan micalkeysiyan dikê. Bi destên xwe teslîm nebin. Berxwe bidin. Mirin çêtire ji pirtikandinê. Mirin çêtire ji esîriyê.

Hefrîtê ku destê wî hatî gez kirin doqikê xwe hilda, heta himmet û taqet têde hebû danî serê Beytik. Kir ku balbalîsk li ber çavên wî çêbûn. Çûkê Beytik bê hiş di nava lepê wan de xeleha, ket.

Hefrît çawa xwe avête ser Beytik û girt, tevde lê hihane hevûdin, pêre pêre bi derbehişkan êbret gerandî kirin. Şelq li çûkan ket. Dê weledê xwe avêt!... Jina qîr dan!... Mêra şînik û weyn kir!... Dot

û xortan hawar kir!... Zarok girîn, ketine bi daw û dêlên dayikên xwe!... Benderih şîlo nebû. Tevde tertubela bûn!... Li hevûdin qeliptin. Pêl zik û pişt û çeng û lingên hevûdin kirin. Di terpilîn, di ketin, di gindirîn, ser û dev û dest û poz û çav û lingê wan birîndar bû. Ji cîk–cîkê, ji şîq–şîqê erd û azman hejiyan. Ê ku kete qulûqewêran, ê ku bazda bi çol û çiya ket, bi deşt û newal û mesîl û guheran ket, ê ku kete nava devî û talan û pûş û gutîna de... Hawara xwedê!... Gidî gidyano romî hatin!... Hûûû, gidî romî hatin!... Bi revin, xwe bidine alîkî, xwe hilênin romî hatin!... Heydênî li wan ket... Wey li wî ku xwe nepandî, winda bikê.

Ku di nava lepê hefrîtan de jî Çûkê Beytik ji haw–hawa xwe neket, dengê xwe kir, ji xwe ne danî, li ber xwe da, gotin û galgal li dozê kirin, nav di wan da, bi xweş mêranî li çûkan hilat, rayê mêraniyê di hina ji çûkan geriya. Pêşî Başokê li xwe qewimand. Rayê pê çavên wî bel bûn, hêrs hatinê de, mûwê wî di nava laşê wî de bû ne sing û qîrên pê ket. Piştre Kew!... Kewê Ribat li xwe qewimand.

Başoke çawa li xwe qulipt nav di xwe da:

–Ez Başoke me Başoke! Hêêêê, ez Başoke me!... Hêbeta dilê kes û kusên cengawer im. Bela serê pêlewanan im. Ez im, ez dirihê çavên dijmin, gurzê serê kesên neqenc im. Ez im, ez cengawerê erd azman!... Ezim, ez Başoke yê nêçîrvan, bi ba re ba me, bi bablîsokê re bablîsok, bi ava li herik re

av!... Ez im, ez Başoke me, gurê roja qewamê, mêrê ser kozik û keliha, serkêşê kozik û kemîna, reşkê şevê, têbayê êvara, gurikê rojê, şervanê serê sibeha me. Ez im, ez Başoke me, mêrê roja ceng û pevçûnê, ji şerê kes û kusan na revim. Hêêêêêyt, qetûlilleh bê xîretî di betne mi de naçê, qetûlilleh bênamusiyê qebûl nakim. Ez Başoke me, xeydokê ser tuxmê xwe me. Hefadê rafê xwe me. Pêşmêrê hevalê xwe me. Ez im ê bi xîret, ez im ê bi şîret, ez im ê bi hîlet, di qewamê de kesê bêhîlet, ez im ê ku mala kesan xera dikim û dibima mîrat, ez qabul nakim tiştên bê xîret, ez im kesê bi hêbat, ez im ku dikê himmet!... Ez im xwediyê şûr û xencer, ez im xwediyê tîr û kevan, ez im xwediyê gurz û mertal. Derbên min nadin dijmin keys û mical!... Hêêêêy gidî hêêêêyy!... Çîîîîîrrr û Qîîîîîrrr!... Ez qebûl nakim!... Bênamûsiyê û bêxîretiyê qabûl nakim. Xwe bê silûk nakim. Ez li ser Beytik qebûl nakim!... Bext û bêbextî di navbera min û hefrîtan de nema. Bê minetiye!... Hêrîşe!...

Şîqên pê ket û ji cih rabû hêrîş berda nava koma hefrîtan.

Galgala xwe bi dengekî bilind xelas kir.

Çûk bi carekê di cihê xwe de mana sekinî.

Şalişîn!... Bê hêvî bûn!... Ji nişkê de!...

Başoke ji nişkê de li xwe qewimand.

Bû şîq-şîqa wî!... Bû çîr-çîra wî!...

Zirt kirin, wesif û pesin ji xwe da û hêrîş berda ser dijmin. Li hêviya kesî jî ne ma, ne bakire ke-

sî jî bo arîkariye. Bi tenê, bi serê xwe xwend xwend û hêrîş kir.

Her cara ku şîqên pê diket erd û azman, çiya û gelî di hejiyan. Şîqêna wî dikete nava dar û deviya, di kete nava lat û kuçan, li mesîl û guheran sê dengî, çar dengî dibû, li hevûdin di vegeriya.

Li Cîhanê bela bû.

Dengê Başoke bela bû!...

Bi karwana re çû.

Bi rêwingiya re çû.

Bi xezalê deşt û beriya re, bi gurê serê çiya re çû.

Bi ba re, bi bahoz û bablîsokê re çû, bela bû. Kete nava avê herikî bela bû. Kete nava rewa axê kat da, kulîlk vekir, bizir da, ra berdana kûraya erdê, şîn bû, reng da, bêhn da, bi rih û can bû geriya, bela bû. Bi germa çavên Şeşimstan bû hilm bihewa ket, bû ewr, ewr li hevûdin ketin, bû reqe-req û teqeteqa wan, tav li hev gihane hev, giran bûn, bû ne baran û barî, bela bû. Qurçik, anîşk, qulik, şikeft, anc, xanî, qozî, guher, kokel, kûrovî, xeşîm, xirêm, cok û qelş, rê û rêbûwar dagirtin. Deng çû deşta Harranê, deng çû Bagokê, giha koçk û dîwana Şahmaran, li nava Tora Hevêriya bela bû. Deng çû Cizîra Bota, bihewa kete serê Cudî, li nava Bota bela bû. Li çiyayê Mava û nava Rama û Kîka û Mila bela bû. Çû giha Serhedê bela bû. Cîhan jê agahdar bû. Meriv ji rexekî ve!... Rawîrên bejê, yên deryayê ji rexê din ve agahdar bûn. Erd û azman li ser doza çûkan şor kir. Jin û mêran, dot û xortan, zar û

zêçan li mala xwe, li nava kar û barê xwe li ser doza çûkan axiftin. Dabaşa civatan, galgal û peyva ber hêt û dîwaran, ser rê û rêçikan, nava qehwexanan û bazargehan bû ev. Çûk hemberî Siltan Silêman, hember zodestiyê, serê xwe hildan. Şerr e!... Çûk û hefrît ketine hemberê hev de. Xwîn rija erdê. Xwîn di kişînê, xwîn di meyênê, di kelênê, di belênê û di pêjê. Xwîn di kişîne, ev sedemê di domênê...

Şîqêna Başoke bela bû. Fereh bû!... Bilind bû!... Geş bû!... Dirêj bû!... Mezin bû!... Qalin û giran bû!... Ji roj hilat heya bi rojava belabû. Çiqasî fereh bû hewqasî jî qalin bû, dijwar bû, mezin bû, çirisand, ronahî da. Bû gunehkarî, bû qêl û nîq kete situwê Siltan Silêman û Key Belkîs de. Li hevûdin giha hev!.. Bû berqa beharî!... Hat û hat!... Çiqasî hat geş bû!... Çiqasî geş bû ronahî da dora xwe!.. Geş bû, fereh bû hat!... Bajarê Qutsê ser û bin hejand. Textê seltanetê hejand. Siltan Silêman hew xwe li ser text girt. Daket!... Kulavek kire bin xwe de, li erdê runişt, destên xwe kirne kêleka xwe de, punijî. Dilê wî lê da!... Tirs lê peyda bû!... Hew dizanîbû çi bikê. Berê leşker bidê ser wan, Cîhan wê li hev bi kevê. Xwîn wê laşa li ber xwe bibê. Ne bes çûk wê hemberî wî derbikevin. Ku filîtî, ku filîtî, bû badê-berdayê her kesê ji dehma xwe de dijî min derbikevê. Meydan wê ji sergerda re bimînê vala. Ne ez dikarim hikim bikim, ne kes li gotina min di nêrê. Divê ev şer bi sekinê. Divê çareseriyek bê dîtîn. Bi şiklekî divê safî bibê. Divê ez xwe ji vê



www.arsivakurd.org

tomikê xelas bikim. Bi çi meqamê ku hebê!... Çavên wî tejî av bû!...

Başoke bi şîqêna xwe re hêrîş berda nava hefrîtan. Bê tirs, xwe di nava wan werkir. Hefrît ji hevûdin belawela kirin. Gurrek li xwe da, sê cara di ser wan re rist. Hefrîtê ku doqik li serê Beytik dayî raçavî xwe kir û rastûrê çûyê de. Perê xwe li newqa xwe şidandin, kûlabê xwe du-sê caran li nikilê xwe dan, şûr û mertal, tîr û kevanê xwe hazir kirin û xwe dehlandiyê de. Hat!... Bê serî hêrîş berdayê. Weke tîra ji kevan bi filitê hat!... Hat û hat derba xwe li nava ser û çavên wî da. Birrêna heft gamêşa ji hefrît hat. Ji himmeta derbê, ji êşa xwe çardeh gavan zerî wî alî bû. Gurmêna hêrivandina heft qesrê sê qat jê hat. Başoke nemerdî nekir. Kete ser qeltaxê wî de. Gayî reşo te çi xwarîye!... Lêde û hey lêde!... Bi nikil û kûlaban pinihayê de. Devê wî, ruwê wî, çavên wî bi ser hevûdin de anîn. Xurxuland!... Hefrîtên din nêrîn ku çûkan li xwe qewimand, bi reveke têr tirs, Çûkê Beytik di nav xwe kirin, revîn. Li duv xwe ne nêrîn. Li hevalê xwe ne pirsîn.

Beytik birin bazdan çûn.

Başoke ji ser dilê hefrît ne rabû. Sekin ne kete rih û canê wî de, bi keys û fesal, bi buxzeke heyf hilandinê daweriqandiyê de. Heya ku qenc bê hal kir. Hefrît behal direjî erdê bû.

Başoke ji ser laşê wî çû ser berzehekî bilind danî.

Di nava xwînê de mabû.

Xwîna hefrît jê di niqutî.

Nikil û ling û dest û ser û çavên xwe paqij kir. Bêhn birahayî, berê xwe da rafê çûkan.

Dengê xwe bilind kir û welehe:

—Gelî rafê çûkan, guhên xwe bidine min. Qenc û xweş dizanibin ku ji îro pê de gere reş û sipî ji hevûdin bê veqetandin. Qenc û xerab ji hevûdin bê wejartin. Kesên bi xîret û ê bê xîret ji hevûdin kifş bibin. Doz doza xîret û namusê ye. Ya hebûn û nebûnê ye. Di nava me de li ber çavên me, hefrîtên Siltan Silêman Çûkê Beytik kuştin. Îro Çûkê Beytik, sibe ez, dusibe yekî din. Çima Çûkê Beytik? Çima Çûkê Beytik ne yekî din? Ber ku Çûkê Beytik bê xîretî bênamusî qebûl nekir, li ser xwe, li ser gelê xwe xeyidî. Dijî zordestiyê derket. Îro, li ber çavên me hefrîta bi gotina Siltan Silêman destên xwe avêtin namusa me. Namus ne bes di nav çaqê jinên me de ye. Ax e, erd e, av e, maf e, şor e, ziman e, çand e!... Mal e, mewdan e!... Rez e, pez e, werz e!... Keç û dot û zêç e!... Galgal û şor û ol û tol e!... Nav û gav û ger û war e!... Ne deykirina me, îro, ser lêdan û perçiqandina Çûkê Beytik bê xîretî bû. Me bê xîretî kir.

Kefê di devê Başoke re avet. Pirr westa, bêhnefişk lê ket. Hew dikarîbû şor bikê. Sekinî, bêhna xwe berda, bi awirên dijwar dêhnê xwe da çûkan.

Car din dengê xwe hilda, dest bi şora xwe kir:

—Bê xîretî avêtin ser çîya, çîya qeliştin, ji hev belabûn bê xîretî qebûl ne kir. Avêtin ser latê, lat ji hevûdin belawela bû, bê xîretî qebûl ne kir. Avê-

tin ser axê, barrên bi axê ket ji hevûdin çû, herzilî, bêxîretî qebûl nekir. Avêtin nava avê, qîrên bi avê ket, ji hevûdin şeqitî, çikiya, bêxîretî qebûl nekir. Bê xîretî car din ma barê merivan. Li ser ruwê erdê, bes meriv dikarin bêxîretiyê qebûl bikin, hilgirin. Îcar em çûk in. Xîreta jiyanê ne. Delalî, deng, tevger, lept û musîkiya jiyana xuzeyî ne. Bêxîretî ne barê me ye. Em nikarin vî barî hilgirin. Bavûkalên me bêxîretî qebûl nekirine heya em qebûl bikin. Ez bi xwe, ji îro pêde hevalbendê Çûkê Beytik im. Doza Çûkê Beytik ji xwe doza min e. Çûkê Beytik bû xîret. Ez hevalbendê xîretê me. Bi hêsanî xwe teslîmê hefrîtên Siltan Silêman nakim. Ezê şer bi wan re bikim. Ezê cengê bi wan re bikim. Li azadiya xwe, li ser pirtikên xwe qebûl nakim, serê xwe didim, xwe didime kuştin, ya jî ezê wan bi kujim. Pêgiha min Çiyayê Cudî ye. Cihê rumetê!... Kesê xîret û namûs di serê wî de hebê wê xwe li Çiyayê Cudî bigrê.

Bi gotina dawî re li xwe da, firî, berê xwe da Çiyayê Cudî.

Çawa Başoke firî çû, Kewê Ribat ji cihê xwe rabû hat li cihê wî danî. Bû qebqeba wî, bû çîrrçîrra wî... Xwend!... Ji aş û bajar da hev û got. Bi wî dengê qalin, mêranî bangî çûkan kir:

-Gelî çûkan!... Gelî heval û hogirên hêja!... Ez jî li duv gotina Başoke!... Erê, bi kûştin, bi hiştin bi Beytik û Başoke re me. Ez jî serê xwe di deynime vê rê. Rê rêya xîret û namûsê ye. Ne bavê min, ne kalê min rêya xîret û reya namûsê bernedane heya

ku ez berdim. Ehda pêlewana li rih û canê min ketibê, li ser azadiya çûkan, li doza pirtik û serfiraziya çûkan qebûl nakim. Bi navê xwedê kim hew qîma min tê. Gotina Başoke erê dikim. Heya niha min bê xîretî qebûl kir, min serê xwe tewand, lê ji niha û pê de ez jî hevalbendê Çûkê Beytik im. Min çek û berçekên xwe hazir kir bo xîretê, bo namûs û azadiyê, bo erd û war û cih û pirtikên xwe şer dikim. Min mirin da ber çavên xwe. Çûkê Beytik bû serkêşê berxwedanê. Bû namûs û xîreta çûkan. Bû soz û ehd û emana çûkan. Cîhan teva erdê me ye. Çiya, gelî, newal, deşt, berî, gûher, beroj, nizar teva cih û warê me ye. Em heya bi ku bikaribin bi firin, herin lê deynin ya me ye. Ji wextê Cîhan ava bû ye wilo ye. Îro divin bi gûherin. Ne bi destên wan hatiya danîn, ev tixup û maf ne wan daye me heya ew dikaribin ji ber me bigrin, vî mafî ji me bisitênin. Pirtik azadîya me ne. Bi van pirtika em li ser ruwê erdê teva, li her çar rexê Cîhanê digerin; Lê ku ev pirtik ji nava mil û çengên me bên jêkirin, jiyana bi xîret û têr geş û xweş teva ji ber ma hate girtin. Ku em li ser xwe, li jiyana xwe ne xeyîdin, bo azadiya xwe şer nekin, bo cîlên bê, bo zar û zêçên xwe tu gotinên me, tu bersivên me na mînin. Îcar ez ji darî we teva dibêjim, kes nikarê, ku Siltan Silêman bê jî, bê kuştina min kes nikarê destê xwe bidê yek pirtikê min. Ez jî berê xwe didime welatê şêran, cihê fêris û pêlewan û agîdan. Di çime Çiyayê Cudî, rex Başoke. Kesên bi xîret bê, cihê wî ewde-

re. Ji bîr nekin, îro qewimiye, kesê xwe bidê anîşk û ber hêta, ne kevê nava dozê, li gorî qeweta xwe arîkariyê nekê, sibe dusibe ku doz safî bû, ev suravk wê di serê wî re bê derxistin. Kes nikarê li ser xwîna kesî rûnê. Vê xweş dizanibin.

Kewê Ribat çawa peyva xwe xelas kir firrî, ber bi Çiyayê Cudî çû.

Kewê Celeb bê galgal û bê deng da duv.

Şelq li çûkan ket.

Bû xal-xala wan!...

Hew dizanîbûn çi bikin.

Di cihê xwe de man sekinî.

Tirsek bi wan ket nayê gotin.

Heya niha yek bû, niha bune sisê-çar.

Her sê kesê din şêrgelê çûkan bûn.

Başoke!... Kewê Ribat!... Kewê Celeb!...

Ê pêşî cengawerê ser ruwê Cîhanê bû. Nêçîrvanê şev û rojê!... Têbayê dijmin!... Dirih û sitiriyê çavên neyaran bû. Ê duduwan gurê roja qewamê, pêlewanê meydana cengê, xwediyê galgalên kurebavan, suwarê hespên têr pîkol bû. Ê sisîyan jî Celebê ser kozik û kemîna bû. Her sê ji bav û kalên xwe de ceribandî bûn.

X X

X

Çûkê Sitiriya ji nişkê de ji rafê çûkan vekişa. Bi dizî paş ket. Bi miştixulandina nêçîrê hin bi hin der ket. Çawa dur ket lezand.

Botbotkê dengê xwe lê kir. Bakiryê de...

Kete çengê wî, bire wiyalî, ji çûkan teva xef kir.

–Çûkê Sitirîya, berî tu herê, qewêtiyek min heye. Du-sê gotin in. Weke heyî divê tu pêk bênê.

Çûkê Sitiriya:

–Ser sera, çawa ez pêk nayênim? Fermo!...

Botbotkê li dora xwe nêrî. Devê xwe ber bi guhê wî bir:

–Bixêr ku tu gihayî cem Başoke û Kew, ji wan re bêje. Bê silavên Botbotkê li we heye, bere qet mitala nekin, tu xof ne kevê dilê wan de. Ne bi tenê ne. Bêje wan, bê Botbotk û çendeke din jî hevalbendê we ne. Lê niha em nayên Cudî. Ku em ji nava rafê çûkan derkevin, wan bihêlin bi tenê, meydan ji ê weke Qijikê û Sîsyankê Keçel re bi mênê vala. Wê kes û kusan bi xirrênin, kes û kusan ji rê derbixin. Berê wan bidine qesra Siltan Silêman. Emê di nava wan de bin, wan li hevûdin ragirin, devê bênamus û bê xîret û xayîna bigrin. Rê li ber wan bigrin.

Emê tevgerê di nava wan de bikin, heya ji me bê emê berê teva bidine Çiyayê Cudî.

Botbotkê ew bi rêkir û kete nava rafê çûkan de. Giha Kevokê bire anîşkê çend gotin di guhê wê de gotin. Çû cem Toretanî çend gotin jêre gotin, giha Dîkê Por wilo, giha Quling eynî!... Her çar da ne kêleka xwe ber bi Leglegê çû. Giha wî jî devê xwe xiste ber guhê wî du-sê gotin jêre gotin. Ew her çend kesê li wan êmin raçengî xwe kirin û ji rafê çûkan dûr ketin. Çûn ber siha lateke mezin, di quna mesîlekê de runiştin.

Pêşî Botbotkê dest pêkir:

–Gelî hevala, wilo çê na bê. Çûk bûne du şiq. Ku em tiştekî nekin, divê em xwe bi xwe bi hev bikevin. Hevûdin bikujin. Birakujî bikêrî me nayê.

Leglegê situwê xwe xwehr kir.

–Em dikarin çi bikin? Dest û lingê me hatine girêdan. Rast e em ne ê vê bûn, lê xwedê mala sersebeban xera bikê.

Botbotk:

–Min ji bo vê sedemê û çareseriyekê bangî we kir. Divê em bi xwe li ser doza xwe bi axifin, qerarekê bidin. Divê em bi destên xwe serê xwe bi xwerênin.

Berî Legleg şor bikê Dîkê Por dest pê kir:

–Bi rastî jî me çûkan bêxîretî kir. Ji darî çavên me ve Çûkê Beytik avêtin nava lingên xwe. Bi derbehişkan kuştin. Kesî ji me dest nebire xwe. Kesî deng ne kir, kesî li xwe ne qewimand, ne got çi

ma. Ev bê xîretiya ha heya ku Cîhan hebê wê bibê rureşî û qêl ji me re. Siltan Silêman jî micalkeysiyê li derba me dikê. Wilo çê na bê û na qedê!...

Quling şor ji devê Dîkê Por girt:

—Çima çê na bê û na qedê!... Ji mêrik re di qedê. Çi dibêjê weke wî ye, xera dikê, ava dikê asil ew e. Kes di devê wî de gotineke bi tenê na bêjê. Çî xerab jî dikê jê re di mînê. Kes di hemberî wî de deng nakê. Heya ku giha vê derecê. Ku ev jî di sere herê, weytî li serê Cîhanê, weytî li serê meriv û rawîran. Îro dora me ye sibe dora wan e!... Divê em vê bêxîretiyê, vê micalkeysiyê qebûl nekin, ber xwe bidin.

Kevokê bi wê bejnûbala delal xwe hejand, bi wan çavên têr ronahî li dora xwe nêrî, bi wî dengê zelal û têr hêvî dest bi axaftinê kir:

—Gelî hevalên hêja, hun teva dizanin ku cihekî min baş û pîroz di Qesra Qutsê de heye. Lê ez her tim tebayî gelê xwe me. Min qet xwe ji nifş û tuxmê xwe ne veqetandiye. Îro hatiye ser mirin û mayinê. Divê em ne mirin. Divê em bi jîn. Divê ev jiyan jî ne bi destên kes û kusan bê kifş kirin. Pirtik dayinek Xwedayî ne. Ku ne Xwedê bistînê, ne heqqê kesiye bistînê. Mafekî xuzeyî ji teref Siltan Silêman bê sitandin, niheqî hew jê mezintir heye. Çê na bê... Divê em li ser xwe, li jiyana xwe qebûl nekin.

Teva serê xwe hejand.

Botbotkê berê xwe da Toretanî:

- Tu çi di bêjê birayê delal? Helbet dîtineke te



www.arsivakurd.org

jî heye... Tu jî ya dilê xwe bêje.

Toretanî serê xwe hejand û sekinî.

Kêlîkê di xwe fikirî, piştre dest bi axaftinê kir:

–Heke li ser ruwê erdê, li bin konê şîn, kes û hin azad mabûn, ew kes û hin em çûk bûn. Bes em çûk!... Bes tuxmê çûkan azad û serbest mabûn. Mînaye çavên Key Belkîs û Siltan Silêman bi azadiya çûkan bar nabê. Divin ku me jî mîna merivan û rawîrên ser ruwê erdê xweş û qenc bixine bin bandûra xwe de. Ne bes bi bandûra xwe, divin heya bi nebîçirçirkên me jî bixin bin reş û tariyê de. Tuxmê me kor û şiloşehtî bikin. Ku ez bim, cihê me Cudî ye. Kêleka Başoke û Kew...

Legleg:

-Xuyaye em teva berxwedanê dixwazin?

Dîkê Por:

–Erê em îro berxwedanê dixwazin, lê sibe–dusibe ku duvê meqilkê sincirî gere kes ji me xwe nedê paş. Tu mêhna nekê ne revê. Îro em xwediyê çi bin, sibe, dusibe gere em xwediyê wê bin. Soz û peyman yek bê. Bi sunda qedîmî, bi navê xwedê û ehda pêlewana sund bixûn. Bo, kes ji me li mala xwe ne runê, wan kesê din bi sergerdeyî, bi tolazî ne berdê. Ku tişteki wilo bibê em di hev na bûrin.

Teva bi yek devî gotina wî erê kirin.

Toretanî:

–Ew hingî dibê qûnekî... Cihê kesên qunek di nav me de tune ye.

Quling:

–Kes nikarê li ser xwîna kesî rûmet û ciwamêriya xwe bikê, kes nikarê li ser ked û xwîna kesî runê. Wilo tişt çêna bê.

Kevok:

–Ew kesê ku li xwe ne êmin bere niha bêjê. Sibe ku qewimî, kes ji me nikarê teqepaşiyê bidiyê de. Di şer de, di cengê de teqepaşî malxerabiye.

Legleg:

–Xuya dikê ku me şer da ber xwe. Ji bîr nekin, çavên me jî ne li kuştina kesiye. Şert û şûrûtan em pêwistî şer kirin. Me bê deng û wilo hêsanî di kûjin, em qebûl nakin. Berxwedana me parastina mafê me ye. Kes nikarê me niheq bikê.

Botbotk:

–Sedem jî ev e. Gotinên we teva jî maqulîne, rast in. Tirsa min jî dubendiyê ye. Gotinek heye, di bêjin: Ku Kurmê darê ne ji darê bê ketina darê tune ye!... Ê weke Qijikê, ê weke Sîsyankê Keçel dinava me de kurmê jan û jehrê ne. Palê xerabûnê ne. Divê em ya xwe bikine yek. Di nava rafê çûkan de xebatê bikin. Ne hêlin yek ji wan ber bi Qesra Qutsê herê. Divê em rê nedin kesên bê xîret û gidiyên xayîn û duruwan. Heya ji me bê jî, berê çûkan bidin Cudî.

Her kesî ji dehma xwe de pêşnîyaz qebûl kir.

Botbotk:

–Ez goman dikim we teva dengê Çûkê Beytik kir. Got ku Kund çûye dîwana Siltan Silêman. Dost û dilxwazên me jî qasid şiyandine. Merivên çê, bixîret û xwedî soz, weke Şahmaran li ser sedemê pirr

di sekinin. Divê em van teva ji çûkan re bêjin, wan agahdar bikin, wan bidin bawer kirin. Lê hajê we jê hebê ku car cara halama pirr baş e. Bi ser de jî zêde bikin. Bila galgalên we ne bêzad bin, lê mezin bin. Heya ji we werê rêya Qesra Qutsê bigrin, reya Çiyayê Cudî vekin.

Kevokê dest pêkir:

–Divê em çend kesên xwe bişiyênin dora Qesra Qudsê, çendeka jî bişiyênin Newala Mîruwa, çendek jî bere herin nava bajarê Qutsê bi xwe... Divê em ji her tiştî agahdar bibin. Ku şer dest pê kir gere em qasidan ji xêrxwazên xwe, ji piştgirtiyên xwe, ji terefgîrên xwe qut nekin.

Dîkê Por:

–Na xwe divê em her êvar li hevûdin bigihine hev, kirin û nûçeyên rojê bi axivin.

Botbotk:

–Rast e!... Galgala Kevokê jî, ya Dîkê Por jî rast e. Divê hajê me ji hevûdin hebê. Ya duduwan divê em di nava xwe de kar bela bikin. Kî wê çi bikê.

Botbotk sekinî. Di xwe fikirî...

Car din dest pêkir:

–Îro çû, em bela bibin, bi kevine nav rafê çûkan, karê rojê bikin. Li ser haziriya şer û rojên ku bê bi fikirin. Pêşniyaz û daxwazên me wê bine çi li ser wan mijul bibin. Sibê roj li ber ava civanê me evder. Lê hey ji xwe hebin, dêhnê xwe bidine kesan, kî çi dikê. Kî bi kûde diçê. Divê galgal û xebat û tevgera me zu bi zu neçê guhê Siltan Silêman. Heya

www.arsivakurd.org

em haziriya xwe xelas nekin bere ji me agahdar nebê. Bo nebê hej û ne kevê nava lingê me de, tu bela ji me re çê nekê. Vê kélîkê girtin û kuştina me tu fêdê, tu karî nadê doza me. Lê roj wê ê ku her dilopa xwînê bibê kevirek ji avaniya azadiyê.

Kevokê destê xwe hilda:

–Gelî hevalan, her roj cihê civîna me gere bê xeyirandin. Ev şert e!...

Teva serê xwe hejand in.

Galgal bû ev.

Her şeş serkêş li wêderê ji hevûdin qetiyan, her yekî di rexekî re çû. Bi serê xwe, weke ku hajê wan ji tiştekî nîne ketin nava rafê çûkan de... Ji xwe û me re bi çengê çûka girtin ji hevalên wa veqetandin, ji wan re galgal gotin. Pêşî ji sedemê agahdar kirin, piştre agahdarî xêrxwaz û kesên piştgirtiya wan dikin kirin. Sedem bi rawşeke fereh ji wan re gotin. Doz mezin û giran bû. Berî her kesî û her tiştî ew bi xwe, çûk bi xwe gere li ser xwe bi xeyidîn. Ku ew rabûne lepa, serê xwe hildan, li duv doza xwe çûn, doza mafên xwe kirin, dost û yarê wan jî wê bi hawara wan ve bên. Ku ew berxwe nedin, kes jî di ber wan de xebatê nakê. Bar li ser milê xwediyê dozê ye. Bêhtir ji her kesî divê ew bibezin. Bêhtir ji her kesî divê ew kar û xebatê bikin. Xwediyê dozê ew in. Mafê wan hatiye xwarin. Berê wan li mirinê ye. Ne ê kesî din. Felekê tora xwe avêtiya nava wan. Xefk û kemîn li pêşiya wan hatiye vedan. Divê ew li ber xwe bidin, hey ji xwe



www.arsivakurd.org

hebin, lîstikê felekê, tor û xefk û kemînên felekê xera bikin. Rê ji ber feleka xayin bigrin. Rê ne dinê de. Ji bedêla felek serê wan bi êşêne, ew berî felekê rabin, kar û bara xwe bikin, xweliya germ bavêjin nava ser û çavên wê, felekê kor bikin. Bê gotin, bê qeyd û şert kar bikin. Xebatê bikin... Serê her tiştî yekîtiye, divê vê pêk bênin. Ku yekîtî bi kar anîn, her tiştê safî bibê. Her kêmasî ji meydanê di rabin. Bo yekîtiyê jî xebata bê xerez divê.

Jiyan li ser pişta kesên çê, kesên milîtan ber bi avabûnê diçê. Cîhana gewrik bi keda palan û merivên xwedî xwêhdan bi dar û fêkî dibê. Bi gul û gilîstan, bi rez û werz dibê. Xweş û geş û reng dibê. Jiyan her tim ciwanik e!... Cîhana gewrik jî her tim delal û kamil e. Di banga xwede ye!... Her du jî xizmet û xilmetê dixazin. Jiyana ciwanik û cîhana gewrik evîndarê hevin. Bê hev nabin. Bê hev nikarin bi jîn. Bi keda merivan digihine hevûdin. Bi tevgera rawîran, bi firr û cîk-cîka çûkan dest didine hevûdin. Bi xwêhdana merivan xweş dibin, geş dibin. Ku ked gihişte wan, xwêhdan rijiya ser sifra wan, binbar dibin. Jiyan ciwanik e!... Germ e!... Xweş e!... Germ û geşî û xweşiya Şeşimstan di nava jiyanê de dibê kulîlk û behar. Tevger û bez û ger û dan û sitandinê di xwazê. Mana li ser linga ev e!... Mana li ser ruwê erdê ev e!... Mana li ser xewrebezên xwe ev e!... Cîhan delal e!... Xweşik e!... Nazik û nazenîn e!... Mixabin pirr hesûd e!... Tim mijuliyê dixwazê!... Her du bê hevûdin nabin. Ne jiyan bê cîhanê, ne

bê hevûdin nabin. Ne jiyan bê Cîhanê, ne Cîhan bê jiyanê dibê. Mehrkiriyê hevûdin in!... Li ser yek merşê, yek tayijî, yek berrî di rûnin, li ser yek sifrê dixwin, bi yek zerikê divexwin, li ser yek doşekê di razin, serê xwe dideynine ser yek balgih û yek zembelîşî. Jiyana ciwanik girêdayî cîhana gewrik e!... Cîhana gewrik jî girêdayê jiyana ciwanik e. Ev girêdan, ji dil û mirada ye. Ne weke merivên di bîra bê binî bi tayê xaf girêdayî ne. Bi rayên jiyanê û tîrêjên ronahiyê bi hevûdin ve girêdayî ne. Felek çiqqasî lîstika xwe bikê, xap û rîpa bidê xwe, ne jiyana ciwanik pîrr dikê, ne cîhana gewrik gemarî dikê. Jiyan pîrr nabê, cîhana gewrik ji delaliya xwe na kevê. Tim li ser kerkidanê xwe ne. Ji hawhawa xwe na kevin. Ji xewrebezê xwe nakevin. Wext zilma xwe dikê. Wext zora xwe dikê!... Çîqqê di wan nakê. Dem pirr xedar tên. Dewran xerab dikevin. Nexweşî, jan û jar çavkaniyan digirin. Li kolan û çaryanê jiyanê di rûnin. Torê tevnepîrka zingarê tavêjin ser kewkeba jiyanê. Pêtên agir bi ser wan de di rijînin. Tovê buxzê bi ser wan de weşînîn. Ne jiyana ciwanik, ne cîhana gewrik ji ser xewrebezê xwe di kevê. Tim, hemberî dem û dewranê reş derdikevin, ber bi dem û dewranê geş û xêrê dibezin. Şer û reşî çiqasî lez û bezê bikin, çiqasî tevgerê bikin, geşî û ronahî digihê wan, pêl wan dikin, serê wan di perçiqênin, wan kor dikin, wan seqet dikin, rê nadin wan. Mixabin, reşî her tim ji destên merivan tê. Zor tariyê tînê. Zor

dar e!... Xwîn e!... Perçiqandin e!... Kuştin û koç kirin e. Mixabin, ew jî ji destên merivan derdikevê. Zor mîna girr e!... Ku kete laşê merivan de, hew jê derdikevê. Kotîtî ye!... Hêsanî ji nava ra û xwîn û mêjiyê merivan der na kevê. Hemberî kotîtiyê derman tune ye. Cîhana gewrik di nava mijuliya xuzeyî de, hemberî kotîtiyê zor aniye. Jiyana ciwanik jî, di nava tevgera berdewam de hemberî kotîtî û zorê hewn aniye. Hewn karê jiyanê ye. Jiyan di sedema ku cîhanê hemberî kotîtiyê zor aniye, ne razî ye. Ber ku zor jî, liqasî kotîtiyê nebaş e. Hewn li hember her du nebaşiya dikarê li ser piya bisekinê. Jiyan dûrmeyzên e!... Cîhana gewrik evîndara wî bê jî, di nava xwe de zorê di hilgirê. Zor buxz a!... Zor hesûdî ye!... Zor kasûlî ye!... Zor nezanîn e!... Zor zil me!... Bawerî pê nabê. Roj tê ku zor hemberî jiyanê rabê. Cîhana gewrik vê zorê li hemberî jiyana ciwanik bi kar bînê. Jiyan pêwistî hey ji xwe û hebûnê ye. Pişta xwe ji zorê re ne vekê. Hey ji xwe hebê.

Zor karê cîhana gewrik e!..

Di nava xwe de bixwedî dikê, mezin dikê, bi şax û per dikê, bela dikê!...

Heçî jiyan e, hewn bi kar tînê. Xwe bi hewn di parêzê. Xizmeta cîhana gewrik jî dikê. Bo zor û şer û xwînê ji ser ruwê Cîhanê bidê alîkî. Bo delaliya wê, kûbarî û maqultiya wê hunda nebê.

Jiyan berxwedan e!...

Xweşî û geşiya wê jî di vir de ye!...

Jiyanê meriv fêrî avakirinê kirin. Wilo wilo

xweşî û geşî ber bi dilovaniyê çû. Lê cîhana gewrik hemberî xwe delalî û xweşkayî ne xwest. Zikreşî kir!... Telaqreşî, bêbextî, bend û berberî xiste nava merivan de. Cîhanê meriv fêrî zordestiyê kirin. Fêrî kedxweriyê kirin. Destên xwe avête destê Felekê. Bi Feleka xayîn re yekîtî kir. Felek xayin bû!... Dijminê merivantiyê ye!... Dijminê Jiyanê ye!... Ferezende kete destên wê de. Dewra xwe leyîst!... Tovê xap û rîpa li ser ruwê erdê reşand. Zordestî û kedxwerî şîn bû. Zordestî û kedxweriyê seltanat bi xwer anî. Felek ne sekinî, qîma xwe bi van tenê nanî. Bizrê temakirinê danî ser perê ba û bahozê. Ba û bahoz di ber himbêza cîhana gewrik de bû. Bi nav têdanê Felekê ew bizrê xopan li ser ruwê erdê bela kirin. Meriv tema bûn. Çek û berçek derxistin meydanê. Bi wan çekan kuştin kirin, xwîn rijandin. Cih û war wêran kirin. Jiyanê hawar kir, qîrên kir!... Fêde nekir!... Xwelî bi serê xwe dakir, pêsîra xwe çirrand, weyn û şînik kir fêde nekir. Ava tevgera mêjî zêde kir xêr nekir. Cîhana gewrik bi arîkariya feleka xayîn zora jiyanê bir. Lê jiyan ne sekinî. Xebata xwe kir. Nêrî ku zora wê birin. Berxwedan kir. Merivên bi xîret û namûs destê jiyanê girtin. Hemberî zordestiyê, kedxweriyê derketin. Xêr nekir. Cîhana gewrik nêrî ku xerabî û gemarî zêde bû. Dengê xwe li Felekê kir. Felek kenî!... Felek kenî, metroziyên xwe pê kirin. Lê guhdarî nekir. Pişta xwe da cîhana gewrik û karê xwe berdewam kir. Ne bi tûwî cîhan jî avête nav tora xwe. Cîhana gewrik hawarî jiyanê

kir. Hatin kêleka hevûdin, ya xwe kirin yek. Hemberî felekê derketin. Mixabin, felekê şax û per berdabûne nava cîhanê jî, nava jiyanê jî... Tovê xerabûnê li her war û nîrxan bela bûbû. Bizrê temabûnê li bin sitûna azmên teva bela bûbû. Ferezende ji destên wan derketibû. Ferezende keçel e!... Pora wê li ser rûwê wê ye. Ji pêş ve xûya nakê. Ku tê, xwiya nakê. Ku dibûrê hê ji nû xuya dikê, tê dîtin. Ku bûrî jî xelas, kes na gihiyê de. Xurt e!... Heyr kete ser ruwê cîhanê de. Poşmanî hat runişt. Lê, feleka xayîn kûrsiyê seltanetê zemt kir, berneda. Hikim kir!... Zor û zordestî li bejna merivan hat. Bi wan xweş bû. Tê de jiyana xwe bi rawşeke dijwar domandin. Destên jiyana ciwanik, destên cîhana gewrik di kêleka wan de ma. Bi neçariya xwe de punijîn. Girîn!... Dilo jarê gotin. Hêstir barandin!... Keserên kûr berdan!... Weyn kirin!...

Nêrîn ku girî, weyn, jar û şinîk xêr nakê. Dilo jarê, wan ji vê tomika waweylê xelas nakê. Cîhana gewrik xwe ji dil û mirada siparte jiyanê.

Jiyanê berxwedana xwe domand.

Cîhana gewrik jî, jiyana ciwanik jî hêviyên xwe hûnda ne kirin.

Hêvî her û her li ser rûwê erdê ye.

Hêvî bû tovê jiyana berdewam!...

X X

X

Beytik li devê zîndanê hate hişê xwe.

Çavên xwe bi zora kotekê vekirin.

Ser û çavên wî di nava birîn û derba de ma bû.

Xwîn li mijgûlê wî hişk bûbû.

Du hefrîta bi pîjaqê wî girtibû, li duv xwe di xirxirandin.

Her du lingê wî bi qeydûmerbeta kilîta firingî girêdabûn.

Qeydûmerbet ji mûwê dêlî û bêjiyê hespê bûn. Ew mû di nava mîza kera û hespa de pû bûn. Li hevûdin çargerî hûna bûn.

Di nava xwînê de bû. Hê birînê wî qemuşk ne girtibûn. Cî cî xwîn ji wan di niqutî. Xîşkek têr xwîn duv de dima. Ji serê tilhê lingê wî heya bi mitika qafê wî di nava birîn û derbehişka de bû. Her du çengê wî diberre di xiriqîn.

Bi mirîtî biribûne dîwanê.

Siltan Silêman bi hêrs, ji ser kûlavê erdê rabû çû ser textê xwe rûnişt. Kêfa wîhat, bi girtina Çûkê Beytik lingek ji kûrsiyê seltanetê hate xelas kirin. Li ser textê xwe çarmêrkî runişt û fermana se-



www.arsivakurd.org

rê wî xwend.

—Wî sergerdeyî ji her du linga qeydûmerbet bikin. Kilîta wê bavêjin bîra bê binî. Bibin bavêjin binê zîndanê. Di binê zîndanê de jî bixine rekiha hesinî. Avê nedinê, xwarinê nedinê de!...

Kund li cihê edebê li ser linga ma tavizî.

Kittên ne ketiyê. Şelişî!...

Wextê di wê ecebgerandiyê de çav li Çûkê Beytik kir, hebitî. Lal bû, zimanê wî di devê wî de mezin bû. Çû hat!... Bi carekê mûrê wî şikestin. Xusiya wî di qirika wî de ma. Cemidî!... Du-sê cara da xwe ku bi axifê, ji aş û bajar çend galgala ji Siltan re bêjê, bo bêhna wî fereh bibê, rehm bikevê dilê wî, ferecê bibînê qewêtiya Beytik bikê, bo hekîmekî hêvî bikê, kir û nekir devê wî çê ne kir. Çengê wî dibere xwe berdan. Milê wî daketin jêr. Ber çavên wî reş bû, serê wî çû hat, gêj bû, qeremê wî şikestin, di cihê xwe de runişt.

Hêvîke wî hebû ew jî winda bû.

Qederekê wilo ma. Piştî Çûkê Beytik birin bi gelekî hişê wî hate serê wî. Bi qunxişkê xwe kişande derve. Çavên xwe li derve gerandin, li hewşa qesrê, li serdorên qesrê, çû heya bi tewlê, heya bi cihê tiratê nêrî. Pêjinî!... Tu pêjin nekir!... Ne ji galgalekê!... Ne ji dengekî!... Ne ji qîrên û barbarekê!... Ne ji hawarekê, ne ji dexîl û hêviyekê!... Parîkî dilê wî xweş bû. Li pey Beytik tu kesî din ne hatibû. Xwe teslîmê leşkerê Siltan ne kiribû. Hê kesî qîma xwe bi pirtikandinê naniye.

Hêviya wî car din çê bû. Bibez vegera dîwanê, çû cihê edebê sekinî. Her du destên xwe li ser hev kirin, serê xwe xiste ber xwe, li hêviya Siltan û destura axaftinê ma.

Dergehê zîndanê mezin û kevnare bû. Bi bizmarê çar anîşk û kûmikî, bi parçê hesinî, seranser kuta bûn. Ne bi gurza dihate şikandin, ne bi top û tivinga!... Çar hefrîtê liqasî çar dêwa bi zora kotekê dergeh vekirin. Bi vekirina dergeh re, zîqênek tuj û dijwar bi cîhanê ket. Her cara ku zîqêna dergehê zîndanê dihat, kes û kusan dizanîbû ku hin bi rêya mirina reş de çûn. Şikriya xwe, hemdûsena yên xwe di anîn ku tu tifaq nehatine serê wan, ne ew in li devê dergehê zîndanê, ew deriyê ne xêrê ne ji bo wan û kes û kusên wan vebû. Siltan Silêman hemberê xwe, dijmin û neyarê xwe teva bi mirina reş berteref dikirin. Di avêtin bîra bê binî, qulûqewêrên binê zîndanê, bê nan, bê av di hiştin. Hin bi hin di qulûqewêran de di mana bê hewa, hin ji nêza û birçîbûn, hin ji kebsa bê hewatî difetisîn. Pêşî kezeba wan diwerimî, dilê wan mezin dibû, piştre mêjîyê wan pûç dibû, cênîkê wan di ara, hin bi hin serê wan dest pê dikir û lê dida, mîna tu çakûçan lêbixê, dilê wan di qarmiçî, bi qermiçandina dilê wan re, rayê laşê wan di werimîn, cî ciya derz dikete laşê wan de. Her derza ku dikete laşê wan, mişk û kêzik û dûbişkan hêrîş diberda ser war. Tebata merivan hew dihat, îdare ne dikirin, xwe li taqê qulê didan, xwe li erdê didan, serê xwe li hêt didan, Mirina

xwe zu dikirin.

Bi vekirina derî re behneke giran, têr idap, têr xwîn, têr hêwî û kurmî, evnikî û rizî û bixar pê ketî hêrîşî derve kir. Çûkê Beytik qulê pozê xwe girtin. Dîse ji bêhn û bixara giran sergêjek lê geriha. Ew bêhna têr xwehdan û xwîn û idap û goştê kurmî, xerabûyî, têr qîrên û hawar, têr hêstir û nalên, ev bêhna têr gazin û evnikî, zingarî, rizî bi ser bajarê Qutsê diket. Di bû ala zilm û zorê!... Di bû dengê seltanata li ser xwîn û goştê merivan!... Di bû tirs û xof di dilê kes û kusan de!... Di bû bîranîna hêl û zend û bend û hêrzên dewletî!... Di bû gurz, dibû tîr û kevan, dibû şûr, di bû remil û mertal di ser serê xelkê re!... Her cara ku xelkê bêhna têr merez û kûu û keser û ahên dikir ji şerê Siltan Silêman û jina wî Key Belkîs û şerê hefrîtên wan di revîn.

Deh duwazdeh pêpelûka daketin. Ketine lîwanekê de. Lîwan heya tu bê bes fereh û mezin bû. Bê hed û hesab sitûn tê de hebûn. Li dev tejî kes û kus bûn. Jin û mêr, dot û xort, rawîr, biçûk, mezin, gir û hûr di nava hevûdin de li wê gastîna heywanê de di jîn. Hin gêr bûbûn, hin runiştî bûn, hin li qelevîska, hin çarmêrkî, hin li ser kaboka, hin tewandî, hin dirêjkirî, hin bi tihêlekê bûn!... Hin di nalîn, hin di kûxîn, hin di girîn, hin di kenîn, hin di bawuşkîn, hin di axiftin, hin bi hevûdin pev diçûn, hin di leyistin, hin li hevûdin rûniştîbûn, hin bûbûne komiçk!... Kor û seqet û nexweş û qof û şilûşatî û bawî û tawî û birîndar, yê birînê wan kûrmî, bêhn

pêketî, û bi êşa zirav û zalîtan, kezeb herhilî!... Li ser hev û bin hev!...

Li wir teslîmê hefrîtê hindiru kirin.

Fermana serê wî jî, ji wan re ducarî kirin.

Berî ku derkevin qewêtî kirin:

-Mêvanê me pirr bi qiymet e, pê zanibin.

Bû tiq-tiqa kenê wan û derketin.

Ev, işareta lêdan û perçiqandinê bû. Ev qewêtiya zilmê, lêdan û zordariyê bû.

Hefrîtê hindirû bi radorî rihê wî ketin. Heya westan qamçî li nava milê wî hejmartin. Çar kes bûn. Her çara ji xwe û me re, her kesî ji dehma xwe de qamçiyê xwe hilweşandin. Bi her derba qamçiyan re himmên û ihhên bi heywanê diket. Her cara ku himmên û ihhên dihat xummên bi wê heywana fereh û mezin diket. Kes û kusên li wê gastînê, yê di anîşk û qûrçikan de, hin ji tirsa, hin ji dilêşa xwe, hin ji fêrbûna bi meh û salên dirêj bi derbê qamçiyan re deng derdixistin. Hin di girîn, hin di kenîn. Girî û ken tevlîhev dibû. Her kes di cihê xwe de lîsiya, bûne piçik. Bi ser hevûdin de hatin guvaştin. Her qamçî di mêjiyê wan de di peqî. Her derba li Beytik diket, li kevçika dilê wan diket. Ji tirsa qune qunî bûn heya li taqê lîwanê sekinîn. Êşa her qamçî di dilê wan de, di mêjîyê wan de pişkivî.

Xeraptir ji wextê hatî girtin, li serê Beytik kirin.

Duduwan rahişte lingê wî li duv xwe xirxirandin. Li ser wan pêpelûkê pirr û sar bû tap-tap û rap-rap û kûrp-kûrp û gurm gurma laşê wî. Heft

tebeqa xwe berdan. Her tebeqe çil û heft pêpelûk bûn. Her tebeqe çil û heft ode bûn, her ode çarçik çil û heft gav bûn. Ser û binê oda, navbera oda, bin sitûn û ber hêta, bin pêpelûkan teva, tejî kes û kûs bûn. Serî û binî dagirtî bûn. Qurçikek, qozîyek, anîşkek, xirrêmek, xeşîmek, qulek vala ne bû. Her devera vala ji bo hina dibû. Qulê biçûk û qawêrên ziravik bo mişk û mar û xilt û dûbişkan. Yê mezin ji bo mixloqatên mezin... Her tişt û dever li gorî xwe tiştek di girte nava xwe. Her tebeqa ji jin û mêran, ji dot û xortan ji navser û yextîyaran... Ji şilûşatan, ji kesên elemoyî, ji kesên nexweş, ji kesê birîndar, ji kesên kor, ji kesên lal, ji kesên kerr, ji kesên dîn... Ji rawîrên bejê, ji rawîrên avî.... Her çar rex dagirtî bûn. Çûkê Beytik fikirî, ji xwe re got: "Gelo du cîhan hene kû em pê nizanin? Yek li ser ruwê erdê, yek li bin ruwê erdê?... Ev çi tofan e!..." Sift ji hindirû dihat. Heye bi hêtên zîndanê, hesin û kevirê pêpelûkan evnika zer, kesk, şîn, hêwî, zingara reş, zer, kûrmî têr qemuşk girtibû. Qîrêna merivan, giriyê têr nalên, wiz-wiza kêzik û wîs-wîsa mişkan, qorqora dewêr û merivên birçî, birîn kûrmî tevlî hevûdin dibûn. Tebeqa hefta odê pirr biçûk bûn. Teva xeşîm û xirrêm bûn. Her dever tejî hestuwê kes û kusan bû. Di nîvê lîwana tebeqê de bîra bê binî devê xwe weke berrihê vekiribû. Birrên û himmên pê diket. Kes û kus bi lingê xwe ve, bi tayên xaf berneqot tê de dalaqandî bûn. Bê hejmar hefrît li devê wê kar û barê berneqotkirinê dikirin.

Heya te çavên xwe miçûbel dikir tayê xaf di qetiyê, bi birrên û qîrên kes ber bi kûraya bîrê diketin. Hefrîta lez dikir, ê ku diket, yek di dehlandine dewsa wî. Her cara ku kes di dehlandine bîrê hemuwan bi yek devî "ho" dikir, "xot" dikir... Waqas hefrîtan di ber bîrê re ne dikire der. Dikirin ne dikirin bîr têr ne dibû. Ha ha kes di qurpandin. Hefrîta jî ha ha kes di dehlandin. Ne bîrê têr di xwar, ne hefrît di westan ne kes û kûs ji ser ruwê erdê xelas dibûn.

Çûkê Beytik avêtin xeşîmeke teng, têr xwîn û idap, tejî hestuwên rizî. Hawîrdorê xeşîmê dirap kirîbû. Ji jorê ve teng dibû. Mîna rekihê hatibû kolan. Bi pihîn û kûlma xistine hindiru, derî li ber girtin çûn. Cihê Beytik liqasî kûrrovîkê ya dihat ya ne dihat. Teng, nizim!... Reş û tarî!... Sift jê dihat!...

Çawa avêtin wilo ma.

Ji kar ketî û bê mecal...

Çiqasî çû êşa birînê wî zêde kir.

Heya roja dî, berê sibehî ji cihê xwe ne qeliqî. Bê çilo ket wilo raza. Berê sibehî xwe lebitand. Her lepta wî zarên bi dil û kezeba wî dixist. Ji birîn û derbehişka nikarîbû xwe bi lebitênê. Ne cihek ne dudu, ser û binê wî teva birîn bûn. Birînê wî jî sar bûbûn, cî ciya qemuşk girtibûn. Hin ji sar bûnê, hin jî ji qemuşkê di birînê wî dirabûn!... Êşê hêrîşî ser mêjiyê wî dikir.

Di cihê xwe de li xwe zîvirî.

Her cara fetil dida xwe destên xwe di palandin.

Çavên xwe korîk dikirin, miçûbel dikirin.

Bo fêrî reşê bibin.

Dêhnê xwe, hin bi destan, hin bi çavan dida xeşîmê.

Xeşîm, quleke serdorê we teva dirabe kirî bû. Di nava diraba û hêt de dirrih û sitirî pijinandibûn. Di nava dirrih û sitiriyan de parçên goşt, hestu hişk bûbûn. Rizî bûbûn... Qenc dêhnê xwe dayê. Diva bû mala xwe ya nûh nas bikê. Ewder bû hêlîna wî. Heya têde bimrê. Wê ewder bibê tirba wî. Mextel û tirba pirr kesan bû ewder. Hêdî hêdî çavên Beytik fêrî reşê bûn. Dora xwe dît. Bi qunxişkê hate devê derî. Di ber kûçê devê derî de du-sê qulikê biçûk xuya dikirin. Ronahiyên korîk liqasî serê derziyê ji lîwanê direjî xeşîmê dibûn. Çawê xwe da ber qulikekê ji wan. Li der ve nêrî. Hawîrdorê lîwanê xirêm, xeşîm û qulûqawêr bûn. Her qul, her xeşîm û xirrêm li dêv dagirtî kes bûn. Teva jî çavê xwe korîk kiribûn di qulikan re li der ve di nêrîn. Bo ronahiyekê bibînin.

Xwe qenc kişande devê derî.

Milê xwe da kûçê devê derî û xwe lê da.

Da xwe, bo kûç parîkî ji devê derî dûr bikê.

Çawa xwe şidand, êşa birînê laşê wî jî xwe şidandin. Êşa birînan teva hêrîş berda ser mêjiyê wî. Kevçika dilê wî êşiya. Pêtên agir bi ser kezeba wî de ketin. Bere paş bû, ket. Wilo ketî ma. Heya bêhna wî hate ber, êşa birînê wî parîkî danîn wilo ma. Ne lebitî. Car din rabû, xwe ber bi derî kişand.

Giha kûç. Destên xwe palandin. Kûç ji serî û binî oxilme kir. Li jêr, rexê çepê destê wî kete ser axê de. Ax nerm bû. Hêwî bû. Bi serê tilihên xwe, bi dilekî têr tirs xepart. Di deverê wilo de, her tişt xefk e. Her tişt dijmin e!... Êmnatî bi hêt û hesinê zîndanê jî nabê. Bi ax û kevirê wê, bi gemar û toza wî... Bi kes û kusê wê!... Êmnatî na bê. Beytik nuh ketibûyê de, ev cara pêşiye ku dikevê devereke wilo de. Têra xwe di tirsa. Her tişt xerîbê wî bû. Her tişt bûbû qamçîyêk li nîvê dilê wî diket. Her tişt bûbû pêtên agir bi ser kezeba wî de di hêrivt. Her tişt bûbû parçek ji fermana Siltan Silêman dihat pirtikê wî yeko yeko ji nava mil û çengên wî di kişandin. Di wê tirsê de, destê wî kete ser tiştekî nerm û şil de. Bibez destê xwe kişand. Dilê wî sekinî. Paş ket. Pêjinî!... Deng ne hat. Ew tiştê nerm ne qeliqî. Hin bi hin xwe ber pê kişand. Nêrî!... Reş bû, tiştek ne dît. Hêdîka dengê xwe kir. Bersiv ne hat. Dengê wî bi zor dihate guhên wî. Nav di xwe da û parîkî din dengê xwe hilda. Pêjin ne hat. Bi tirs destê xwe dirêj kir. Heya ku gihayê de. Çawa destê wî lê ket car din kişand. Car din, car din, car din wilo!... Nêrî ku laşê Cird e. Liqasî serê ga mezin tê. Di wir de miribû. Ber derî xepertiye. Heke ji qerem ketiye, heke ax bi ser de hêrivtiye. Ew qula ku bi dest û ling û dinanên xwe kola ye bû tirba wî. Kî zanê çend roj in, meh in, sal in di wirde ye. Bê nan û av!... Dilê Beytik hate devê wî. Dilxelênek hatinê de. Bi ser laşê Cird de verîşa. Arq

li duv arqa din hatinê de. Hinavê wî hilweşan. Xwe da paş. Li ser duvê xwe runişt. Ma dilehayî. Bêhna wî hate ber. Tebata wî ne hat. Xwe ber bi derî kişand. Kire dilê xwe de, wê li qula Cird xebitê. Belkî kûr kiribê. Qul gihandibê binê kuç, ber devê derî. Hêviyek bû. Çeng û destên xwe bi hevûdin firkandin. Heya ku jê hat per û destên xwe di nava axê rakirin, heya jê hat bi himmet Cird tevlû axê hilda di ser milên xwe re avêtê paşiya xeşîmê. Ax, toz bi ser serê wî de, bi ser milên wî de rija. Laşê Cird li paşiya xeşîmê ket. Kurpên jê hat. Dilê wî xweş bû. Li toz û axa bi ser de rijayî ne fikirî, dest bi kolana axê kir. Şewteke baş wilo domand. Bi destan bi lingan, bi çeng û peran, bi nikil û dinanan... Ha ha xepart û avêt. Avêt hey avêt!... Nêrî kû di qonçalê de hunda bû. Tirsa!... Tirsa, ku aqîbeta Cird bê serê wî. Derket!... Axa devê qonçalê da alîkî, bi paşiya xeşîmê de avêt. Car din kete qonçalê. Dest bi kolana xwe kir.

Sê roj û sê şeva ne sekinî. Ne raza!... Di xwarinê ne fikirî!... Di avê ne fikirî!... Qet ne hatine bîra wî jî. Her kola!... Her axê tavêjê derî qonçalê. Kola hey kola!... Avêt hey avêt!... Roja çara di binê kûç de qul vebû. Serê xwe di qulê re derxist. Li dora xwe nêrî. Her kes di karê xwe de bû. Hefrîta ha ha kes di dehlandina bîra bê binî... Girtî jî di halê xwe de di punijîn. Di birîn û êşa xwe de di nalîn.

Serê xwe kişand.

Şartîlek ax xiste devê qulê de.

Hat di xeşîmê de runişt.

Bêhna xwe berda, di xwe fikirî.

Ji qulê derket jî, wê çawa bigihê qatê yekê?

Giha qatê yekê jî, wê çawa di devê dergeh re derkevê?

Li wan qatê jêr, kes û kûsên girtî, li ber destên hefrîtan xizmet dikirin. Kes wî nas jî nakê. Dikarê dinav wan re xwe bigihênê qatê yekê. Piştre!... Wê çawa ji qatê yekê xelas bê? Zor e!...

Ku wî bigrin, pê bi hissin, hawara, xelasiya wî hew di mênê. Di cih de wê wî dehlênine bîra bê binî. Takî xaf li lingê wî girêdin, pêre pêre wî dehlênine bîrê. Avê lê na vexwin. Kî dizanê, belkî car din bo radorî rihê wî kevin, car din qamçiyan lê bi hejmêrin. Heya bi westin lêxin. Ne ol heye, ne tol!... Bê xwedê û xwedan in!... Bextê leşkerê reş tune ye. Xwedê ew leşkerên reş bo xerabûn û wêrankirinê da ne. Dîrok ne bû ye şahid ku ew bû ne palê avabûne, her xera kirine, her wêran kirine. Her xwîn rijandine. Her jin hiştine bî. Her zarok hiştine sêwî. Her cih war kirine kavil. Xan û man kirine xerab cih.

Kes û kus pêwistî koçkirinê kirine.

Piştî koç kirinê ser cih û warê wan runiştine. Ser mal û mewdanê wan danîne. Runiştine ranebûne!... Ê xwedî cih û war bû ne ew, ê biyanî, tolazî, zigurd, reben, şepirze bû ne kes û kus

Kûştin karê wan e.

Zilm û zor karê wan e.

Di tûrikê wan de kedxwerî heye.

Çûkê Beytik di xwe fikirî!...
Di halê çûkan fikirî!...
Di wê perçiqandina nava wan de hatî serê wî, hewqas çûk li dora wî bûn, dikarîbûn hefrîtan teva di nava tifa xwe de bi xeniqênin. Bes xîreta Başoke qebûl nekir. Ew jî baş e!... Dest pêke!... Wê kişênê!... Li duv hev!... Pêşî yek e!... Piştre dudu, sisê, deh, sed, hezar in!... Şert destpêk e!... Ew şert hate cî!... Hatina nava rafê çûkan baş çê bû. Êşa!... Marazoyî bû!... Hate perçiqandin!... Lê xem nakê!... Lê hêja bû!... Bo dozê!... Bo armancê hêja bû!... Gelo kê dî xwe li ser kir? Kê xwe da rex Başoke? Kesî xwe da rex yan na?
Çûkê Beytik di wan xem û xeyalên bazdanê de, heydênî bi zîndanê ket. Dê weledê xwe avêt. Bû qîrr û qiyamet. Hefrîtaê kêf û şahî kir. Hepisçiyan girî û weyn kir. Beytik xwe ji cih qevast, çu devê derî. Guhên xwe da deng û galgalan. Kir û nekir tiştek ji tiştekî dernexist. Çar-pênc caran navê Çilê bûrî. Tiştekî din fam nekir. Guhê xwe bi kuç ve zeliqand, xêr nekir. Xwe dirêj kir, rabû runişt fêde nekir. Xwe negirt, kete qonçalê de, guhên xwe pêl kirin, tiştek ji tiştekî dernexist. Tebata wî nehat. Şartîlê axê ji devê qulê hiland. Serê xwe derxist. Dêhnê xwe da hefrîtan. Teva sekinî bûn, dev ji kar berdabûn. Kêf û şahî dikirin. Hin ji wan di reqisîn. Hina ji wan li çepka dida. Hina jî dîlok û sitran digotin. teslîmbûna Çilê pîroz dikirin.Ji hevûdin re digotin: "Çawa hebê ewê din jî bên. Îro newin sibe, sibe



www.arsivakurd.org

nebû, dusibe... Teqeze wê bên. Dever di wan de vebû, hev berdan, yekîtiya wan xera bû. Beytik kete cihê mirinê, Çil teslîm bû. Ê din jî wê bi xwe bên. belkî rojek dudu di ser teslîmbûna Çilê re herê, zêde na, wê teva bên teslîm bibin. Teva!... Zu ne dereng!...

Hefrîtekî ji wan bi çepkên xwe re dengê xwe hilda. Hem di got, hem di devê xeşîm û xirêmên girtiyan re di çû dihat. Ew mizgîniya nexêrê bi raw-şeke metrozî ji wan re di got:

–Çûk jî safî bûn. Teslîm bûn. Hew xwe digirin. Dever di wan de vebû. Çil hat, ê din jî yek bi yek wê bên. Kes nikarê hemberî Key Banû Belkîs rabê. Cîhanê ew îdare dikê. Asil ew e. Em hefrît jê re sax bin. Ne kesî din.

Sekinî...

Çûkê Beytik qenc derkete der ve.

Qeydûmerbetê lingê wî di êşand.

Xwe girt û guh pêl kirin.

Dilê wî çarkopal lê dida.

Hefrîtê din dest bi axaftinê kir.

Ew li devê deriyê girtiyan geriya...

–Rast e rast e!... Îro Çil hat, sibe yekî din, dudu din... Dusibe teva wê bên. Çara wan nema!...

Yekî din:

–We temamê çûkan li duv hevûdin bên.

Ê din:

–Beytik hate girtin. Çilê xwe teslîm kir. Yek ji wan bê kûştin teva wê bi tirsin bên.

Yekî din:

–Hêdî hêdî ê din jî wê bên. Wê bên, bi lingê xwe wê bên. Hevûdin berdan, yekîtî di nav wan de nema. Xelas!... Ya wê hevûdin kujin, kevine nav hevûdin de wê qirra hev ênin, yan jî wê bên teslîm bibin. Hev bi kujin jî wê bên. Lê bere hevûdin bi kujin, hê çêtir e. Bar sivik dibê. Her du rawş jî hûndabûna wan e.

Beytik derkete derî qulê.

Çavên xwe gerand.

Rahişte kincekî rizî bi ser milên xwe dakir. Qandelûkek deristî danî ser milê xwe, bi kerkulî ber bi pêpelûkan çû. Hefrît ketibûne kêf û şahiyê de. Çûkê Beytik di ber wan re derbas bû.

Çawa giha ber wan, hefrîtek hat li ber sekinî. Destê xwe pê ve dirêj kir û got:

–Bimrin çûk, her bijî Key Banû!...

Sekinî. Beytik lal bû, hew dizanîbû çi bêjê.

Yekî girtî, ji kêleka wî dengê xwe kir:

–Bimrin çûk, her bijî Key Banû!...

Çûkê Baytik li kêleka xwe nêrî. Yekî şelekorî bû ê ku deng kirî. Di nava sala de çû bû. Ser û bin rizî, bi ser hevûdin de hêrivtibû. Qenc ji kar ketibû. Xwe bi hefrîta çê dikir. Hefrîta jî xwarina ji ber wan dima didanê. Kar pê ne dikirin, li wê gastînê serbest bûbû. Pîjikek şikestî di destê wî de bû, ha ha di hejand. Hat û hat, li rex Beytik sekinî, tûjikê xwe di tihêla wî rakir.

Bi dengekî şîretî:



www.arsivakurd.org

—Bake lawo bake, lê wê eyarê te bi ser hevûdin de bênin.

Ziravê Beytik qeta. Di dilê xwe de got: Ez hatim girtin, çû. Lê heya jê hat dengê xwe bilind kir.

—Her bijî Key Banû, her bijî, her bijî, her bijî!...

Bi gotina xwe re meşî. Lezand!... Di bakê di lezênê. Bû tiqtiqa kenê hefrîtan. Destê xwe pê ve kirin, kenîn, sixêf kirnê de, metroziyên xwe pê kirin. Çûkê Beytik qederekê banga xwe domand. Her gava ku tavêt qeydûmerbetê lingê wî di xwar. Êşa laşê wî ne bes bû, ya her dû lingê wî jî kete ser de. Çawa ji hefrîta derbas bû, bi pêpelûka de bihawa ket. Cot cot xwe di qevast. Heya jê hat lezand. Li her qatî bi yek rawşê kêf û şahî hebû. Heya bi qatê jêrî, ê yekê ne sekinî. Çawa kete qatê yekê de, anîşk li xwe ba da kete nava kes û kûsan de. Xwe ber bi anîşkek tarî kişand. Melisî!... Dêhnê xwe da serdorên xwe. Li devê dergeh nêrî. Li akd û kûlekan nêrî. Kûlek teva diraba kirî, bi serde jî moxilkirîbûn. Li hêla rojhilat, têhnikek ronahî dirêjî erdê dibû. Di ber akdê de!... Dêhnê xwe da wir. Dirabe, yan jî moxil tune bû. Lê ne kûlek bû. Kûr, dirêj û teng bû. Hemma ronahî têre dihat. Tejî qirrêj, gemmar û tevnepîrk bû. Çavên xwe jê ne birî. Cihê singekî çar niçik bû. Ya sing têde rizî ye, yan jî hew kar dikir ji wir kişandine, cihê wî jî wilo vala ma ye. Da hişê xwe; wê çawa xwe bi gihênê wêderê. Xwe hildê, çengê wî biya wî nakin. Bi hêt ve bi hilpirikê, ji her du linga ve qeydûmerbetkirî ye. Li hina ji wan gir-



www.arsivakurd.org

tiya mikûr bê, êmnatî nabê. Sebir da xwe. Hin bi hin, bi qunxişkê ber bi binê qulikê çû. Her cara xwe dikişênê, dibin cilikê de perê xwe di vekê, di darê. Derbehişk û qamçiya çeng û perê wî qenc ji taqet xistine. Hew guh dida êşa laşê xwe. Pêl dilê xwe kir. Heya giha bin qulikê ne sekinî. Çawa giha bin qulikê re, xwe da anîşkeke tarî. Situnek ji wan jî kire buwara xwe de. Melisî!... Qet deng nekir, di hev ne qeliqî!... Xwe bê pêjin kir!...

Hefrîtê qatê yekê bêhtir ji wanê din kêf û şahî dikirin. Nêzîkî ser rûwê erdê bûn. Ne bes karê zîndanê jî dikirin. Pirr caran bi kar û barê qesrê de dibezîn. Xwe nêzîkî Key Belkîs di dîtîn. Ji her tiştî agahdar dibûn. Her nûçeyên nûh ber guhê wan diket. Hey ji salifa û dabaşên rojê, yên civatên dîwanê hebûn. Li gorî axaftina wan, karê pirtikandinê jî, wê bidine wan. Li hêviya Çilê bûn. Kara xwe dikirin. Cî vala dikirin, girtî ji meydanê dabûnê paş. Kêrik, cûzan, das, birrek, mûçink, hesan, tavir hazir kiribûn. Hina kêr û mûçink tuj dikirin. Hina kîs û çûwal hazir dikirin. Hina jî galgala şiklê pirtikandinê dikirin. Yekî ji wan ê ku qamçî li nav milê Beytik di hejmartin di kenî û digot:

-Ezê rahêjim çaqêkî ji ê Çilê, yek ji we jî rahêjin ê din, dudu ji we jî rahêjin perê wî û qenc ji hevûdin vekin. Bere qenc û xweş, her du memikê wê û her du qulê wê yên jêr derkevin meydanê.

Bû liklika kenê wan.

Girîz bi devê wan diket.

Yekî ji wanê din:

–Na, na, ew kesê ku ji qesrê bên bila paq û çengê wê bigrin, ji hevûdin vekin, em jî emê pirtikênin. Bo dest bidine memik û qulikên wê.

Yekî din:

–Hewqasî dilê xwe xweş nekin, belkî vî karî ne dine me. Kifş nabê!...

Hêstira di çavên Beytik re avêt.

Di ber xwe de girî, bû hirîq-hirîqa wî.

Bi dengekî birîndar, têr nalên û hesret:

–Ev çi neyartiye? Neyartiyek ter buxz, têr meremi... Çûkan çi xerabî bi cina kiriye ez nizanim. Êdî ne dijminatî bi tenê ye, hovîtiyê dikin. Gelo çima hewqasî li derba me kûr in, Ji kuderê ev dijminatiya han î hov tê?

Hew xwe girt.

Cilik ji ser xwe avêt. Qandelûka xwe jî danî vêderê...

Xwe ji cih hilweşand.

Heya çavên xwe miçûbel kirin kete qulikê de.

Dengê perê wî mîna ba bi lebitê hat û hûnda bû.

Hefrîta li dora xwe nêrî, ne kirin tiştek.

Hayê wan ji bayê felekê tune bû.

Ji xwe Beytik qet ne dihate bîra wan.

Beytik avêtin xeşîmê û ji bîr kirin.

Ji wextê ew zîndan ava bûye heya îro, ne mîrokê, ne meriveki, ne mareki, ne dûbişkekî, ne kêzik û mişkekî jê bazdaye. Di devrûqedîman de, kesî tiştekî wilo ne dîtîye, ne bîna ye.

Hefrît ji zîndanê pişt rast hatî bûn.

Li xwe êmin metroziyên xwe domandin.

Beytik di qulikê de melisî. Nefesa xwe jî ne da ne sitand. Bi lez çavên xwe gerand. Qulik cihê singekî çar niçik bû. Tujaya sing hêtê der hema hema qulkiribû. Hindirûwê qulikê tejî gemar, toz û tevnepîrka salan bû. Hêdî hêdî, bi hemd pêşiya xwe wejart. Rayê çengê wî pirr di aran. Li êşê hew di nêrî. Gihabû devera mirin û xelasiyê. Dawiya qulikê xelasî bû, girtina wî mirin bû. Ya wê kujin, yan jî wê dehlênine bîra bê binî. Ji bedêla di nav lepê hefrîtan de bi mirineke pîs, gemarî bimrê, di berxwedanê de bimrê hem şeref e, hem ciwamêrî ye. Heya giha taliya qulikê ne sekinî. Li taliya qulikê, bi neperuşkan, bi nikil û neynûkan devê qulê li gorî xwe fereh kir.

Di devê qulikê de melisî.

Lingê xwe bavêjê jiyana ciwanik e!...

Ji cîhana reş û tarî têr wexma kurmî, têr idap û bêhn pêketî, têr nalên û êş û merez xelas bû, hate devê deriyê cîhana gewrik.

Sekinî!...

Divabû Çilê bibînê.

Bê dîtina wê, bê cewibandin ji wêderê ne diçû. Belkî wê razî bikê. Ji vê tomikê xelas bikê. Çil rawîreke ne sitêlihe. Di nava çûkan de bes ew bi memik û qêl e. Çûk teva hêka dikin, bes ew çêlîka dikê. Çêlîkê xwe şîr didê. Pîroz e!... Çûkan teva bi çavekî pîrozî lê di nêrî. Qet ber pirtikandina wê ne dihat. Xwe jî li ser bikê wê xwe gihêniyê de, pêre

bi axifê, hê ji nû bi revê.

Divabû wê ji xap û rîpa xelas bikê.

Ew bê aqile, bi destên xwe tirba xwe di kolê.

Beytik divabû Çilê ji mirina bi saxîtî xelas bikê. Karibê baş e, nikaribê ew tiştek dine. Bê girtin jî wê xwe ceribênê. Bê ceribandin ji wir na lebitê. Qerara xwe da...

www.arsivakurd.org

X X

X

Heyf e!... Mixabin e!...
Çûkê Beytik mirin da ber çavên xwe û runişt.
Ne bi tuwî Çilê xuya kir.
Li devê qesrê diçû dihat!...
Dikire qerebalix!...
Kes jî li dora wê nebû.
Lê devê wê ne dikete hev.
Ha ha di got û di beland.
Şelişî, nezan, sewesî, ha ha dibakir.

Bi qerebalix û banga xwe ew jî ne bawer bû. Dengê wî di realî. Gotinên ji hevûdin de ketî, ne ber bi hevûdin ve ji devê wî di rijihane erdê. Gotin û galgal bê wezin û mîzên ji nava lêvên wê diketin ber lingê wê. Nizanîbû çi dibêjê. hema çi dihate ber devê wê digot. Çawa dihatin wilo jî derdiketin. Rast!... Xwehr!... Puç!... Vala!... Beredayî!... Çawa hatiba ne!... Ji ser û bin di herzilî!... Di tirsa!... Qerebalix û hêrsa wê teva ya tirsê bû. Carcaran kelogirî dibû. Tirsê ew girtibû, qenc bidest kiribû. Hêstirên wê cot cot bi ser hinarkên ruwê de dadiketin. Dengê wê xwehrûpêçkî derdiket. Qereh lê di fizihan. Di kir û ne dikir realandina kabokên wê ne

disekinî. Xwe bi qeraxê hêt digirt jî fêde ne dikir. Ji hindiruve di kelî. Agir bi hiavê wê diket. Agirê hinavê wê dibû dengê xwehrûpêçkî, dibû gotin û galgalên ne bi hevûdinve û derdiket.

Guneh û giriyên meriv bi helê wê dihat.

Tirba xwe bi destên xwe di kola.

Li xwe qedera tuxmê xwe di lezand.

Xwe bi destên xwe dikire girtiyê şev û rojê.

Ew çûkê ne sitelih, gurover, xwediyê wan pirtikê delal, têr reng... Piştî çûkê bihiştê, Tawûs, di nava çûkan de pirtikê wê delal û sipehî bûn.

Heya jê dihat dengê xwe bilind dikir.

–Zu, zu, kêlîkê berî kêlîkê pirtikê min jêkin. Karê min heye. Ez xwe tebayî wan çûkê din nakim. Min bi agirê wan çûkê din ne şewitênin. Ez bi lingê xwe hatim. Nûh ez bi banga Siltan agahdar bûm. Çêlîkê min birçî ne. Zu gidî zû, min bi pirtikênin.

Gunehê Beytik pê hat.

Dilê wî bi Çilê, bi tuxmê Çilê şewitî.

Tiştek ji destên wî ne dihat.

Çilê bi destên xwe dida kuştin.

Hefrîtek hat li ber sekinî.

–Çilê, parikî sebir bike. Haziriya te dikin. Kund û Siltan di axivin. Lê te li hêviya wan na hêlin, wê te pirtikênin. Qet xeyala meke. Bêje wan çûkên dî ji, bila xwe nekin ber himbêza me hefrîtan de, emê qirra wan bênin. Bila bi xweşkayî bên xwe bi pirtikênin. Ji wan re baştir e.

Bi axaftina xwe re metroziyên xwe pê dikir.

www.arsivakurd.org

Çilê car din da ser hev.

-Karê min bi Kund û mund ne ketiye. Zu, zu!... Kêlîkê berî kêlîkê!... Çêlîkê min birçî ne. Ez xwe tebayî çûkan nakim.

Dengê û banga Çilê ew biçuk û bê xîret dikir. Hember dijmin kîbê, ku xwe dexîl kir, têhna namûs û xîretê pêr namênê. Ji merivantiyê dur dikevê. Çil!... Ew çûkê bi reng û nîgarên xuzeyî hatî neqişandin!... Ne sitêlih xwe bi destên xwe rezîl dikir. Dilê têr gemarî!.. Kezeba têr qirêjî!... Çavên çirmisî bê ronahî!... Qewirî!... Mirî!...

Hefrît kenî, bersiv nedayê çû, kete hindirû.

Çûkê Beytik dengê xwe li Çilê kir.

Hin bi tirs, hin bi lez.

Çilê dengê wî nekir.

Beytik carkî din, carkî din, carkî din dengê xwe kir.

Çi cara deng kiriye, parîkî din dengê xwe bilind dikir.

Çil çiqasî li xwe di qulipt jî kes ne dît. Li dora xwe çar çav dibû, lê kes ne dît. Bîra hêtê zîndanê û Çûkê Beytik ne dibir. Bîra mirina xwe dibir, bîra ku Beytik ji binê zîndanê derkevê bê bikevê wê qulika hêt de ne dibir. Dengê girtina Beytik û perçiqandina wî, wilo qeydûmerbetkirî avêtina binê zîndanê li nava darîstanê cîhanê teva bela bûbû. Hina di got: Çûkê Beytik bi muwê bêjiyê hespa di nava mîza hespan de qawî kirî qeydûmerbert kirin û avêtine binê zîndanê. Hina di got: Nûh giha dîwanê

bi tayê xaf ve girêdan û dehlandine bîra bê binî. Hina di got: Hê bi rê de rih berda, mir. Bo Çûk agahdar nebin wilo bi mirîtî avêtin bira bê binî. Ji her devî gotinek derdiket.

Çûkê Beytik nêrî bê xêr e.

Deng dikê, lê rebena Çilê ji hewla rihê xwe hew zanê çi bikê.

Bi dengê xwe re, toz û qirêj zerî derve kir.

Çilê li jor nêrî.

Çûkê Beytik di devê qulikê de melisî dît.

Hema hema dihate tefsilandin.

Çavên Çilê di nava serê wê de fereh bûn.

Devê wê bostekê ji hev çû.

Berî ku Çil bikê halama, Beytik dest bi axaftinê kir.

–Çila delal, xwe bê aqil neke. Tirba xwe bi destên xwe ne kole. Xwe ne de pirtikandin. Tê poşman bibê. Parîkî sebir bike.

Çilê bi hêrs:

–Beytik î çepelo, tu ketî zîndanê de jî, te aqil ne girt, tu ber xwe nakevê.

Beytik gotin ji devê wê girt.

–Çila delal, tê xwe şepirze bikê. Ev hefrîtê han ne ol ne tol e!... Wê te pirr bi êşênin. Xwe neke nav lepê wan. Gunehê te bi te newê, bila bi çêlîkên te bê.

Çilê rê nedayê de.

–Tu ji xwe û karê xwe şor bike. Karê te bi min û çêlîkê min ne ketiye.

Beytik:



www.arsivakurd.org

–Çila delal, tu di nav çûkan de, bes tu bi memik û qêl î. Çûk teva di hesidine te. Pirtikê te pîrozî ne. Tu pîrozî!... Di nava çûkan de, bes tu çêlîka dikê, çûk teva hêka dikin. Tu çêlîkên xwe şîr didê. Tu pîroza xwedayî û pîroza çûkan teva yî. Wilo li xwe neke. Li ber xwe bide.

Çil kenî. Bi kenê xwe re kelo girî bû.

–Li ber mirinê jî tu bela xwe ji xwe na vekê. Ez nikarim gotina serseriyê weke te bikim. Çepelî pîso tu hemberî Siltan Silêman derketî te çi fam kir? Derketina hemberî fermana Siltan zîndan û mirin e. Bîra bê binî ye!... Te bi çavên xwe jî dît, lê nizanim ne tu ber xwe nakevê, ne tu tiştekî ji cîhanê fam nekê. Min fam nekir. Di xwe û halê xwe bi fikire, ne bi min.

Çûkê Beytik nêrî ku galgal û gotin û şîret xêr nakê.

Gotina dawî got:

–Şîret û gotin bo te fêde nakin. Roj wê bê tê poşman bibê. Ji niha û ne gelekî!... Lê, mixabin te qerara xwe daye. Xêr li rêya te. Tê poşman bibê. Lê roj wê ê ku poşmanî hew xêr bikê. Ku pirtikê te hatin jêkirin ezê bangî te bikim. Heyfa min tê ji wê heyfê ku tê bi destên xwe tuxmê xwe bikê girtiyê şev û tariyê. Tu bi destên xwe tirba xwe û tuxmê xwe dikolê. Aqilê xwe bike serê xwe de, wilo neke, xwe nede pirtikandin.

Çilê jî gotina xwe ya dawî got:

–Tu kêm û zêde bikê ezê gilhê te bikim.

Gotina Çilê xelas bû hefrît hatin.

Çûkê Beytik xwe bi paş de kişand.

Çar hefrît bûn.

Bê gotin ketine bin çengê Çilê de birin. Çawa destê hefrîta gihane Çilê lingê wê ji erd hate birîn. Ne sekinandin, birin.

Bû çar-bara Çilê di nava lepê wan de. Behsa Çûkê Beytik kir, destê xwe ber bi zîndanê dirêj kir, kesî lê guhdarî ne kir. Lezandin!... Anîşk li xwe badan, ji ber çavan hûnda bûn.

Çûkê Beytik qerar da heya dawiya axaftina Qendê Çûkan Kund û Siltan Silêman neyê ku ji wir dernekevê. Ewder xweştir ji xeşîmê bû. Ji hindikayive ronahî hebû. Cîhana gewrik hemberî wî bû. Kes di dîtîn. Azadî jê ve xuya bû. Hefrîta jî zu bi zu tê nayênine der. Ji bazdana wî agahdar nabin. Ji bo mirinê xistine wê qulê de. Siltan Silêman bi devê xwe navê mirinê û kuştinê ne hilda, lê bi gotinê xwe Beytik berqebelî mirina reş kir. Bê nan, bê av di wêdera kebis, bê hewa, bê ronahî de, qey du heftiya, pirr pirr heyvekê xwe bigirê. Wê mirê. Piştî ku Cird di wirde mir. Ew rawîrê nava erd û axê, nava xirbih û kavil û xerabcihan, di wir de mir. Beytik çawa na mirê. Beytik kengî xwe digirê. Heftiya wî na qedê wê linga li devê sa bixê.

Di qulikê de cihê xwe xweş kir. Bê tirs bû. Car din ewder, ji şevên bûrî rehettir û êmnatir bû. Nê bêhna hestûwên rizî, ne bêhna goştê bêhn pê ketî, ne bêhna birîn û xwîna têr idap û kurmî, ne bêhna axa di nava xwêhdan û kul û derdên kes û

kusan de rizî hebû. Kevir hişk, toz û gemar di nava ronahiyê de zuwa, bê hêwî, bê şilayî bû. Qîrên û hawar, gazin û nalêna girtiya tune bû. Galgal û peyvên têr sixêf ne dihatine guhê wî. Hefrîta metroziyên xwe pê ne dikirin. Malaqiyên hina ji girtiyan, hemberî hefrîtan ne dihatine guhê wî. Bo parîk nan, bo peşik av bê xîretiya ku kes diketinê de ne di dît. Ji jêr, ji nava kesên li qatê yekê girtî car cara deng dihat, nalên ber guhên wî diket. Ne weke qatê hefta. Qatê hefta cihê ketin û ne derketinê bû. Dawiya jiyana ciwanik bû. Dawiya tevgera nava Cîhana gewrik bû. Ew bi xwe giha ber mirinê. Ji nava jiyana ciwanik û Cîhana gewrik dûr kiribûn. Wî li ber xwe da, xwe hêsanî teslîm nekir. Heya dawî, heya ku rastî cihê xwe bigrê, niheqî ji meydanê rabê wî berxwedana xwe domênê. Bi hemd û hişşê xwe meydan ji zor û kedxweran re ne dihişte vala. Çilê dever di berxwedana wan de vekir. Rê da dijmin. Rê ji zordestan re vekir. Yekîtiya çûkan xera kir. Tuxmê xwe bê çek kir. Bi destên xwe çekên xwe teslîm kirin. Çarika gidîtiyê kişande serê xwe. Tuxmê çûkan teva ber bi mirinê bir. Rêya reş û tariyê da ber teva. Tirsa Beytik hê hebû. Ne bes Çil bê semax e. Pirr çûk hene ku quna wan erd ne girê. Pirr hene!... Pirr hene ku duvikê meqilkê sincirî baz bidin. Ez qurbana wî me ku duvikê meqilkê sincirî rahêjiyê de. Ez gorî wî bim ku gurê roja qewamê bê. Ne bes ê roja xweşî û geşiyê bê. Hêj hine dî wê derbikevin. Hêj hine dî wê kozikê berdin. Hêj hine dî!... Hêj



www.arsivakurd.org

hine dî!... Di nava vê tirsê de bê hiş ket. Ji westandinê, ji êşa birînê laşê xwe... Berî ku bikevê cihê xwe xweş kir. Nava tozê û gemarê xepart. Bo êmnatiyê jî qas tevnepîrk di devê qulikê de nijinand. Heye ku bi bazdana wî agahdar bibin, bên li qulikê bi nêrin. Ji derve ve qet ne dihate xuya kirin. Ku ne destê xwe dirêjî hindirû bikin. Qet na bînîn. Serê xwe kire bin perê xwe de, çavên xwe girtin.

Sibeh tê xêr pê re.

Çawa hebê wê tiştek ji axaftina Qend û Siltan derbikevê.

Li qendê çûkan Kund êmin bû.

Qinyata wî pê dihat.

Ku mecala axaftinê bidinê de. Siltan ji nişkê de devê wî ne girê, wî bê gotin nekê. Xelas!... Çawa hebê, bi çi meqamî bê wê Siltan ji qerara wî vegerênê.

Lê heye ku rêya axaftinê ne dîyê de.

Wî jî bikin hevalê Çilê.

Neyar û bext tiştekî na bêjin hev. Dijmin û kuştin birayê hev in. Bext û berberî tiştekî na bêjê hev.

Nexasim kesên di jiyana xwe de hov bê!...

Hema piçekî!... Hema ku deng ji wan derbikevê!... Li ber xwe bidin, yek ji wan serkêşiya wan bikê. Rayê mêraniyê di yekî, bes di yekî ji wan bi gerê. Wê çûk teva ya xwe kine yek. Zu ne dereng wê yekîtiya xwe çêkin. Hemberî fermanê derbikevin. Hemberî zordestiyê, micalkeysiyê wê serê xwe hildin.

Yek ji wan, yek bi tenê li xwe bi qewimênê, ew tozika mirinê wê ji ser wan bê weşandin, tevi-

zandina wan wê ji ser wan biçê, tirsa ku têde wê ji hinavê wan derbikevê.

Wilo bikin, Kund hê bêhtir wê dijwar bibê. Siltan jî wê lingê xwe baskî xwe de bi kişênê.

Çawa hebê sibehî wê galgala wan ê guhên wî...

Tiştek xwe di devê hefrîtan de na girê...

Ji hevûdin re dibêjin... Wê dengê wan bikê...

Beytik, xêr bê, şer bê wê bi revê...

Li hev hatin çê bibê jî, Siltan Silêman di gotina xwe vegerê, fermanê betal bikê jî, ji wî bi xwe re ne xêr e. her ew ê girtinê, ê zindan û perçiqandinê ye. Zu bi zu dabaşa wî nayê meydanê. kes newerê bi dikirinê. Heya doza çûkan, doza mezin qenc û xweş safî nebê, bêhna Siltan Silêman neyê ber, parîkî sedemê ji bîr nekê, benderih nikarê wî di sedema Beytik de bi cewibênê. Ew, her ê dawî ye!... Wî her sohra xwe xwar, hê jî wê bixwê. Yek ji çûkan wî nayênê bîra xwe, her kesî wê bi deverekê de, bi nava darîstanekê de bela bibê. Kes li hevûdin na gihê hev û dabaşa wî nayênê meydanê, di nava civata xwe de li ser wî na kes na axifê. Kesî ji bo xelasiya wî na şiyênin ba Siltan.

Bes Kund!...

Kund wî ji bîr nakê.

Xweş dizanîbû.

Pişta wî ji Kund rast hatîbû.

Lê xweş dizanîbû ku ew jî pêre pêre dabaşa wî nayênê dîwanê. Heya doza mezin safî bikin piştre. Di nava galgalê de, ku ferezende bikeviyê de, wê

navê wî dikirênê. Heke Siltan Silêman rêya axaftinê dayê de, belkî!... Ku rêya axaftinê nediyê de, ji xwe yekcar ma di binê zindanê de. Wê rizê!...

Rev bû armanca mezin!... Divê ku baz bidê!...

Ku lingê wî qeydûmerbetkirî bin jî...

www.arsivakurd.org

X X

X

Berî ku Çil bê devê qesrê, xwe teslîm bikê, Siltan Silêman û Kund dest bi axaftinê kirin. Di wê kêlîka ku Siltan destura axaftinê da Kund, qasidê Şahmaran kete hindirû. Qasid Ziha bû. Liqasî gamê-şekî dihat. Firnikê wî liqasî devê şikeftekê ji vanê Toranî fereh bûn. Ku hilma xwe di berda, xuşşên bi wan dera de diket. Hilma germ, weke dû di firnikê wî re derdiket. Agir ji devê wî diçû. Ji hêbetê wî hefrît bûne du şiq. Ziha bi himmên û kûffên hat!... Berê xwe ne da yek hefrîtî. Rû neda wan, destûr ji yekî ji wan ne xwest. Rast û rê hate ber textê seltanetê sekinî temenna kir, name Şahmaran dirêjî Siltan kir. Di tola dîwana Siltan Silêman de, tu qasid rast û rê namê bi destên xwe dirêjî Siltan nakin. Qasid di cihê edebê de di sekinê, namê derdixê, wezîrê milê çepê di rajê namê, bi destura Siltan dixwênê. Bes qasidê Şahmaran cuda ne. Karê xwe bi destên xwe, rû bi rû dikin. Ber ku Şahmaran qet nayê dîwana Siltan Silêman. Siltan Silêman car-cara diçê dîwana Şahmaran. Ser sedemên cîhanê di axifin, lê Şahmaran naçê. Xwe kêmî Siltan nakê.

Xwe jê biçûktir na bînê. Seltaneta Şahmaran ji bav û kala de ye. Qedîm e!... Dîroka seltaneta wî, bi dîroka cîhanê re dest pê dikê. Malbata Şahmaran bes yek di vekevê. Nabê dudu!... Ji dê û bavekî bes wêrtek çê dibê. Bes yek!... Umrê wan jî liqasî çil û heft cîlê merivan e. Ya Siltan Silêman ji wî, pir pir du bavan û vir de dest pê dikê. Dîroka malbata wî jî li gor kêfa Siltan bi destên merivan hatî nivîsandin. Roja ku Silêman bû siltan, qasidê xwe şand û vekirî got, seltanet erê, lê berpirsiyarî ya jiyanê di navbera Siltan û Şahmaran de ye. Şahmaran berî her kesî, bêhtir ji her kesî xwe berpirsiyarê jiyanê dibînê. Mar û cih û warên mara di destên mara de ye. Kes nikarê bêyî Şahmaran hikim li wan bikê. Wan ceza û bi xelat bikê. Şahmaran ne pêwistî çûna dîwan û koçkên kesî ye. Aza ye!... Xwedî koçk û dîwan e!... Ne pêwistî ser şêwr û mişêwrê kesî ye!... Ne pêwistî nav civatê kesîye!... Ne pêwîstî kesî ye ku li ser kar û barê bendê xwe bi wan bi şêwirê. Qasidê Şahmaran li qasî Şahmaran xwedî gotin û qerar e. Qasidê Şahmaran herê cem kê, di dîwan û koçka kê de bê, hemberî wî kesî xwedî gotin û qerar e. Bes bi wî re didê di sitênê. Gere kes di navbera qasidê Şahmaran û xwediyê dîwan û koçkê de tune bê. Ev destûra xuzeyiye. Bo Şahmaran û tuxmê wî destura xuzeyî meqbûl e. Tu destûr û fermanê kes û kusan maran girênadin.

Di name Şahmaran de, dabaşa jiyanê hebû.

www.arsivakurd.org

Dabaşa kesên ser rûwê erdê û tevgera jiyanê hebû. Dabaş li duv dabaşa din, teva jî bi rawşeke bingehiya hewngîrî didanî masetê. Her sedem dûr û kûr digirt. Dawî dabaşa xuze û mîzêna wê kir. Digot: Mîzêna xuzeyî ji hêla rastiyê ve gere tim giran bê. Di nava vê galgalê de dabaşa çûkan dikir. Bi xêzikekê jî dabaşa Key Banû Belkîs dikir. Salifa Adem û Hawa digot û xapandina Adem ji teref Hawa dikir. Rast û rê derewê Key Belkîs kifş ne kir lê dida fam kirin. Siltan bi xwendina her xêzika namê re dikete rengekî. Sipî dibû, zer dibû, reş diqela. Bi hêrs dibû. Lê ku çavên wî li zihayê hemberî diket. Kezebê wî diqetan. Di sekinî!... Name xelas kir, destê xwe avête akfiya ber pişta xwe, tevlû kembera wê jêkir li hevûdin pêça dirêjî Zihayê Mara kir. Got: Silavê min li Şahmaran bike. Her gotina wî gûharin di guhên me de. Ji her dabaş û salifên wî em aqil disitênin. Bila tu xeyala û mitala nekê, her tişt li gorî giraniya xwe wê bi cî bibê. Jiyan û tevgera jiyanê bi kesên mîna Şahmaran bi hêrs û geş e. Ji hêla me ve jiyan tu derban na xwê. Heya ji me bê em nahêlin kes tu listîkan bi jiyanê bikê. Kesên di civatê de şaş bûn. Ji axaftin û galgalên Siltan Silêman man ecebmayî. Rast û rê, bi zimanekî vekirî her gotina Şahmaran erê dikir. Ziha rahişte akfiyê, xwe tewand bê bersiv derket çû. Ji ketina hindirû, bê bersiv derketin û çûna Ziha jî dizanîbûn ku Şahmaran rast û rê li ser çûkan qebûl nakê. Ku bû ya dawî wê xwe li ser wan bikê. Ev jî beşî çûkan e. Cîhan

teva bibê yek bi Şahmaran tenê nikarin. Çûk û mar bibine yek wê qirra cîhanê bênin, kevir li ser kevir na hêlin, kesî li ser du linga na hêlin. Bin erdê, ser rûwê erdê, nava avê û hewa teva di destên wa de ye. Çek û berçekên di destên wa de di destên kesî de tune ne. Her kesî jî dizanîbû ku Siltan Silêman bes ji Şahmaran xof dikê. Bes bi wî nikarê. Şahmaran hem xwedî hûner e, hem ava jiyanê vexwariye. Yek dilop bi tenê ne da Siltan Silêman. Çend cara Siltan Silêman di bere avêt jî Şahmaran xwe kerr kir; Siltan hefrıtên xwe, xewasên xwe berdana dora Beriha Dilopa, kesê çû ne vegera, Hûnda bû. Bû parîk nan!... Kes nizanê çi bi wan hat. Du cara jî, ew kesên li ser rûwê erdê bi xap û rîpa, bi teşqele û diziya xwe, bi pêxwasî bi nav û deng, ku diçûn reşqelayî, dinava moxila sincirî de, ziman jêkirî, çav peqî, dest qûtkirî, hemberî qesra Siltan di singa de çikandî di dîtîn. Cara dawî, du dilop jara zer bi tayekî hevrîşim re di ser devê Siltan re diherikîn. Serê sibehî, bi sagurkê re, di wextê Siltan û rabûna wî de wilo kiribûn, bo bes ew bibînê, tê bigihijê. Kesê ew kar kirî jî, li aqda Qesrê di ser serê Siltan re sekinî bû. Wextê Siltan ji xew rabû, jara zer jî, mar jî dît. Hebitî, devê wî li hevûdin herbilî, kit neketiyê de, lal û şaş bû him-hima wî. Mar di cî de ji ber çavên wî hûnda bû. Her dû dilop jî niqutîne ser zembelîşê wî. Ew rok, ew rok, Siltan hew kes şande dora Beriha Dilopa, doza ava jiyanê nekir û li pey ne kûdand. Her tim, hember Şahmaran jî bi

tedbîr bû. Li peya wî na dixist. Derheqa wî de axaftin ne dikir. Ne qenc, ne xerab!... Ku dabaş hatibane meydanê, bes wesif û pesnê wî dida. Gotina wî jî li erdê ne dida. Xelata ku jê re şiyand jî nîşaniya vê bû. Akfîya li ser dilê Siltan şêrîn ku bi heft ava hatiye sitewandin, bi çirîskên belediyan hatî semax kirin, bi tîrêjên berqê hatî pijirandin, bi destên xwe ji pişta xwe vekir, bi destên xwe direjî qasidê wî kir.

Çawa qasidê Şahmaran bi rê kir, dengê xwe li Kund kir, anî hemberî xwe, cihê rûniştinê şanî da.

Kund ne runişt, di cihê edebê de sekinî.

Siltan Silêman ducarî kir.

Kund rûnişt, serê xwe xiste ber xwe de. Berbendî axaftina Siltan ma. Qet deng nekir. Dizanîbû Şahmaran vekirî destê wan girt. Car din zêdekarî nekir.

Heya Siltan dest bi pirsa nekir, wistên jê ne hat, ne qeliqî. Ne qenc ne xerab, serê wî diberde ma sekinî.

Siltan Silêman bi hêrs:

–Qendê çûkan, ev çî ye, çi sedeme ku çûk, bendê ku min pişta xwe bi wan di şidand hemberî min derdikevin?

Kund xwe punisand. Berî niha ku Kund di kişande ser şewr û mişêwra, gotina pêşî "qendê min" bû, niha bû "qendê çûkan"... Biyanî hesiband. Durî civata xwe berda. Weke yekî gunehkar pêre şor kir.

Qend bi dengekî melûl bersiv da:

–Siltanê min çûk her tim bendê te ne, li pişta

te ne. Ne heddê wan e ku hemberî te jî rabin. Bes, nihaqiyek hatiye ser wan, hêviya wan ji Siltanê wan heye.

Siltan Silêman:

–Xwesteka me bû niheqî?

Kund:

–Haşa Siltanê min. Xwesteka te ser serê me û bavê me. Lê pirtikandin ne dermanin. Na bin derman jî. Ku hekîmekî gotibê!...

Siltan Silêman peyva wî qut kir:

–Tu ji ku zanê ne derman e? Hekîmtiya te nûh di bihîzim.

Kund degel bû:

–Ber ku ev derman ne ji teref hekîman hatiye xwestin. Bes parsûwên Key Banû êşa ne.

Siltan Silêman:

–Parsûwên Key Banû ne bes êşa ne. Şikestine!...

Kund:

–Ezbenî serî, tu hekîma ev jî ne gotiye.

Siltan Silêman ma şaş.

Weke meriyekî ji nûh bi xwe agah bibê.

Di xwe fikirî.... Lê neda der...

Kund tê anî der, gotina xwe domand.

–Hewqas hekîmê namdar hene. Teva di dîwana Siltanê min de, di xizmeta Siltanê min de ne. Kesên zana û pîşpîşe!... Gere wan li birîna Key Banû ya min nêrî ba ne.

Siltan bi hêrs:

–Gotina min ne bes e?

Kund:

–Belê ezbenî, bo min bes e. Lê, tu Siltanî, hikim li cîhanê teva dikê. Tu berpirsiyarê ins û cin î, tu berpirsiyarê rewşa cîhanê û jiyanê yî. Eşa her bendên te, gere êş û kul û merez bê bo te. Tu li halê wan bi pirsê!...

Siltan bi nermî:

–Çi hatiye serê bendê min û me ne pirsiye?

Kund:

–Ku hekîman li birîna Key Banû ya min nêrî baye, helbet yek ji wan wî dermanekî xêrê pêşniyaz bikê. Derman bes ne doşeka ji pirtikên çûkan e. Doşek ne derman e, rehetîye.

Fişşên li Siltan Silêman ket:

–Bo Key Banû ya xwe, qey hûn rehetiyê na xwazin?

Kund:

–Çawa em na xwazin Siltanê min, bêhtir ji her kesî... Lê ev xwestek cereke nabê dudu. Em teva bêne pirtikandin, êdî hew kar û bar, xizmet ji me tê. Em mirin, kesên mirî nikarê xizmetê bikê. Xwestek jî ne bes rehetiye, kuştina qas çûkan e.

Siltan:

–Çawa Qendê min?

Kêfa kund hat.

Dilê wî hînik bû...

Weke her car navê wî hilda.

Kund serê xwe rakir. Çavên fereh, gewre, şînqehweyî yên vekirî, qenc vekirin, li nava her du çavên siltan nêrî.

–Ezbenî serî, pirtikandina me çûkan, qelandina tuxmê me ye. Ne ez dikarim bême civata siltanê xwe, Ne şalûl û bilbil dikarin di bexçê Siltanê min de dengbêjiyê bikin, hûnerên xwe nîşan bidin. Ne jî, şêrgelên Siltanê min, kesê mîna kew û başoke hefadiyê ji Siltanê min re bikin. Çûk teva dibine girtiyê şev û reşê. Hew yek ji wan di karê derkevê derve. Tav wê wan bi şewîtînê. Bahoz û bablîsok wê wan li ber xwe bibê. Berf û baran wê wan bi qufilînê, teyrok wê wan bi kûjê. Bes bi şev dikarin wê xizmetê ji Siltanê min re bikin. Şalûl û Bilbil wê şev nîvê şevê hûnerên xwe bikin, dengê zêrîn bi ser ruwê cîhanê bixin. Tiştekî ne li rê ye, tiştekî bermeqlûb e!... Ji roja Cîhan ava bû ye heya îro rewş mîna niha ye, em rabin bi qûlibêninê lewnekî din, ez goman dikim wê rawş kambax bibê. Siltanê min qet bi şevê dernakevê seyranê, dernakevê raf û nêçîrê. Tim bi rojê li derve ye. Tu fêda Siltanê min hew ji me çûkan çê dibê.

Siltan serê xwe hejand, galgalê Kund ketin serê wî de, ne dûrî aqila bûn. Rast digot, lê ne da der!...

–Çûkê Beytik ji rexekî ve, Başoke û Kew ji rexê din ve... Ev derketina hemberî min e. Sergerdeyî ye!... Xwe û tol ne nasîn e!... Bi qencî, bi xweşkayî, bi bendetî dikaribûn bên, derdê dilê xwe bêjin. Lê ev serhildana wan çı ye?

Kund:

–Çûk her tim ji teref Siltanê min in. Pirr cara ev dane nîşandan. Hevalbendê Siltanê min in. Cîhan

teva dizanê. Bendê ku di xizmet û gotina Siltanê min de ne. Kes û kus hene, ji wan û vê xizmeta rast û paqij, piştgirtiya mêrxasî û dilgermî dikin, di hesidin. Li tilê wan dikevê. Zikreşiyan, derewan dikin. Siltanê min dizanê ku Başoke jî Kew jî, di rojên qewamê de şêrgelê Siltanê min in.

Siltan Silêman:

–Beytik!... Ew sergerdê Beytik!... Gunehkar e!... Ew guhehkar divê ceza bixwê. Bê ceza bifilitê tu hêl û zendûbend di seltaneta me de na mînê.

Kund destên xwe ji ser hev rakirin, hêdîka hejandin:

–Goman dikim, Hewranê Pêsîr Çirandî û duwazdeh ciwanî têne bîra Siltanê min. Ji teref Siltanê Kurdistanê bo Siltanê min û wezîrê siltanê min duwazdeh ciwaniyê salê xelat şiyandibûn. Her duwazdehan jî çavên rojê ne dîtibûn, bi şîrê xezalan mezin bûbûn. Kesî ew ciwanîk û xezal ji hevûdin nas ne dikirin. Firawun, leşker xiste pêşiya wan de. Duwazdeh şev û duwazdeh roja Hewranê Pêsîr Çirandî bi tenê şerê wan kir. Ew xweş mêrxasê Ezdahî, piştî duwazdeh şev û roja birîndar bû, ji ser hespê xwe hate jêr, peyatî, li ser çogên xwe sê roj û sê şevê din şer domand, yek ciwanî teslîm nekir. Heya îro jî şer û sitran têne gotin, helbest li ser wê xweş mêraniyê tên nivîsandin. Çûkê Beytik bi wan hesiya û bi hawara Hawranê Ezdahî ve çû. Şev nîvê şevê rafê çûkan agahdar kirin û da pêşiya wan hatin bi ser leşkerê firawuna de girtin. Kulê wan di korê wan re

derxistin. Siltanê min, hemberî wê xweş mêraniyê, Hawranê Pesîr Çirandî xelat kir, lê Hawran xelata xwe dabû Çûkê Beytik. Hingî te bo sipasbûnê name ji siltanê Kurdistanê re şiyand, te behsa xweş mêraniya Hawranê Ezdahî kir, lê te got: Bendê min jî, yê weke Çûkê Beytik ne kêmî fêrisê te ne. Gere car cara xatirê rojên bûrî jî hebê. Siltanê min, Çûkê Beytik pirr hate perçiqandin, ew eceba kesnedî ku bi serê wî hatî, ew êbret gerandina hatî serê wî, heya qiyametê ji bîr nabê. Ew besî ye!... Giha cezayê xwe... Ka ji wê rezilandinê mezintir ceza.

Siltan ji ser text rabû...

Dakete jêr.

Di dîwanê de çû hat.

Rengek tê ruwê wî, yek di çê...

Zer dibê, reşdiqelê, sor dibê, fişşên pêdikevê....

Ketibû devereke teng de...

Hew dizanîbû çawa bikê...

Di gotina xwe vegerê, fermanê bidê, dev ji pirtikandinê berdê, Key Belkîs wê çi bêjê, ne vegerê kar ber bi xerabûnê diçê. Ji rexekî ve Şahmaran, ji rexê din ve Kund, gotinê wî teva di cîhê xwe de ne. Hember galgalên wî her bersiva didê rast e, di cihê xwe de ne.

Di haletê heyirî de çû hat...

Kund dêhne xwe dayê de. Li gavên wî nêrî. Li dev û lêvên wî nêrî. Li miçkirin û belkirina çavên wî nêrî. Li lepta dest û telîyên wî nêrî. Serî û binî li hereketên wî nêrî. Siltan Silêman xweş nas dikir. Ku

zor lê dihat, dibin probleman de dima, bersiva tiştan ne didît, ser textê xwe dadiket, bê deng di çû di hat. Bi kesî re ne di axift. Bi kesî ne di şêwirî. Heya di serê xwe de bersivek, çareserîyek ne dîtiba ye, ne di sekinî. Ku qerara xwe dida kes di cewibandin.

Çû hat!...

Dîwan fereh bû.

Qesra Qutsê, bi nav û deng e. Avakirina wê bi mehan domandiye. Cinan ji binê erdê kevirên dirrî, kevirên mermerê çavên rojê ne dîtî, reşbelekî, sorxalî, derdixistin. Rawîrên nava avê, qum û risima di nava çang û xulxulîkê masiyan de hatî bêjing kirin, ji binê deryayê derdixistin, rawîrên bejê kils û nikara kevnare, dar û axa hestemî berhev dikirin. Merivan, kevirên Qatoro şeh dikirin, bi şikil û mîzên dikirin, ser wan bi neqiş û gul di xemilandin. Darfêkiyên Çiyayê Mava, Dehla Bûnisra, şivê mêwên Tora Hevêriya, di anîn di bexçe de di danîn. Hostenecarê her çar rexê cîhanê li ser gihane hevûdin, şev û roj kirin yek. Di salê de Qesra Qutsê li ser çar sedê qantira mîna gulokek ronahî ava kirin. Hindiruwê wê teva bi ber û tayijê Serhedê xemilandin. Her tayij û ber bi destên keçên çardeh, pazdeh heya bîstan hatî renk kirin, teva bi evîndariya dîrokî hatî resim kirin. Xêzik û xîşkên têr hesret di nava wan de hatî ristin. Ta û nexên wan ber û tayîjan bi destê jinên bi destên xwe çê, kar pêj û xwedî huner hate resandin. Tevn û hûnandina sal û mehan domandî hate raxis-

tin. Bi kêf û şahî destpê kirin, bi kêf û xweşî xelas kirin. Silêman nûh bûbû siltan. Taca serê wî bi destê siltanê her çar pêgihên Şeşimstan hatin danîn. Ji teref siltanê Kurdistan, ji teref qerranê Firengistan, ji teref siltanê Hindistan, ji teref Şahmaranê Rawîristan... Bes Şahmaran hazir nebû, ji teref wezîrên xwe, her tuxmê rawîran yek ji wan şandibû. Piştî Silêman bû siltan Şahmaran rawîr teva di nava civata wan de aza kirin, bes ma şahê maran. Rawîran kir û nekir hew serkêşiya wan qebûl kir. Li bextê merivan ewle ne dibû. Ku ji teref Xwedê kilîta devê Silêman hate vekirin, jê re ayan bû. Dabaşa Adem û Hawa hate bîra wî... Car din ne divabû dîroka jiyanê li ser milê maran bi gunehkarî bê ava kirin. Xwe da paş. Lê her dem xwe berpirsiyar dît. Bi şahîneteke pirr mezin û geş kes û kûs ji Siltan Silêman re kar kirin. Ew qesr jî, bi wê şahînet û kêfxweşiyê hate ava kirin. Heya keça Mîrê Cina ne bû bûk nekete wê qesrê, ne bû xatûna cîhanê wilo bi kêfxweşî û şahînet domand. Mafê kesî ne hate perçiqandin. Gur û mih bi hevûdin re di çêrîn. Wextê Key Belkîs hate qesrê, lingê wê refik girt, rewş hate guherandin. Pêşî ji hefadê Siltan dest pê kir, berda bendê Siltan, bendê xwe kirin dewsa wan. Û pê de çû!... Heya giha pirtikandina çûkan. Carekê duduwa Kund kire dilê xwe de, bo bêjê, dabaşa dîrokî û melaqîyan datînê meydanê, tevgera têr gelacî û fesadiyê bênê ziman, qesra ku bi şahînet û kêfxweşiya bendan hatî ava kirin, bila nebê warê şînikû



www.arsivakurd.org

weyn û reşiyê. Hin bi hin şînikû weyn û dilo jarê, cihê xweşî û geşiyê di sitênê. Zor cihê dad û maf di sitênê. Pêşî li qesrê, piştre dakete sikak û kolana, hin bi hin li cîhanê bela bû. Car din di dilê xwe de hişt. Hişte dawî, hişte galgala bêminetî û cewaba hemberiyê.

Ji vî serî heya bi serîyê din ne di sekinî. Ku giha seriyê din wî li xwe zîvirê bi rexê din ve biçê. Serê wî di berde bû. Ne li dora xwe di nêrî, ne serê xwe di hilda.

Du-sê cara bû min-mina wî. Serê xwe bi min-mina xwe re di hejand. Di ber xwe de, gotinek dudu gotin. Gotin ji navbera lêvên wî di xindirîn. Diketine ber lingê wî de. Gavên xwe vekirin, lezand. Ha ha!... Ne sekinî!... Çû vî rexî, hate rexê din!... Gotin yeko yeko, bi tuqil û dûrî hev ji devê wî de diketin. Lêvên wî gotin ne di ragirtin.

Kund dizanîbû ku name Şahmaran pirr tesîr lê kir. Giraniyêk pirr mezin danî ser milên wî. Di nava gotinên xwe de Key Banû jî gunehkar kir.

Di wê kêlîkê de hefrîtek kete hindirû.

Ber bi Siltan Silêman bezî.

Devê xwe xiste ber guhê wî de.

Bû pist pista wî!...

Dilê Kund çarkopal lê de.

Di sebeta sînga wî de mezin bû. Hew nefes da û sitand.

Nav di xwe da... Lê dilê wî qêbil ne da.

Xweş dizanîbû tiştek qewimî!...



www.arsivakurd.org

Di nava xwe de hêvî û hawar kir.
Qurban gotin.
Navê Yezdanî pak û dilovan got.
Navê şêx û mişayixên xwedî ocax yek bi yek hejmartin.
Hawar gihande pîrê çil pîran!...
Yek bi yek qurban ji bo wan got.
Ruwê Siltan Silêman bi yek carê geş bû.
Hat û hat û hat di ser serê Kund re sekinî.
Bi ser de pêl bû:
–Îcar tê çi bêjê min?
Kund bi çavên vala lê nêrî.
Siltan car din şor kir:
–Çil!... Çila şimamok, hat xwe teslîm kir, Çima ê din nayên? Ser çi ji ber çi? Bendê min çawa bi gotina min teva newin ba min?
Kund şelişî.
Zimanê wî di devê wî de mezin bû.
Qerem lê şikestin.
Ma sekinî.
Murê wî bi carekê şikestin.
Yekîtiya wan xera bû. Dever ketiyêde!...
Xwedê mala Çilê xera bikê.
Xwe ne girt. Li ber du pif û nîva xwe ne girt.
Îro jî!... Îro heya êvarî !... Ne pirr heya êvarî!...
Xwe girtiba ne, wî sedem safî bibê.
Qenc xerab wî qerarek din ji devê Siltan Silêman derbikevê. Qerarek xêrê!...
Hêvî hebû!... Hêvî mezin bû!...



www.arsivakurd.org

Şer bi galgal û têkiliyê cî dabû xêrê!...
Ji hêla xêrê ve hêvî pirr mezin bû!...
Galgalên Kund, name ya Şahmaran hêvî mezin dikir.
Mûrê Kund bi carekê şikestin.
Kund gotinê ne berbihev ve ji devê xwe xindirandin.
–Min gote Siltanê xwe, ku kes ji çûkan hemberî Siltanê min ne rabû ye.
Siltan destê xwe hejand:
–Belê!... Belê!... Sergerde di nava we çûkan de pirr in.
Li xwe zîvirî û şora xwe domand:
–Qendê Çûkan!... Gûhdariya min bike, ev gotin bila ji we teva re gûhar bin. Mezinê xwe nas bikin. ji vir heya bi cem Xwedê ferq di nava benda de heye. Ne wilo ye Qendê Çûkan?
Kund kelo girî bû:
-Xilafî tê de tune ye Siltanê min.
Siltan Silêman:
–Jiyan jî, cîhan jî li ser pişta bendê çê, bendê xêrxwaz û rast ava ye. Ne wilo ye Qendê Çûkan?
Kund xwîsiya xwe qurpand:
–Xilafî tê de tune ye Siltanê min.
Siltan bi hêrs:
–Berî ku tu bê, tu li dîwana Şahmaran bûyî. Ne wilo ye Qendê Çûkan?
Kund kir ku bersivê bidê, Siltan destê xwe rakir, rêya axaftinê ne dayê.



www.arsivakurd.org

–Tu bendê min bû yî, lê te qista dîwana Şahmaran kir. Rast û rê tu ne hatî dîwana min. Te ez û Şahmaran hemberî hevûdin rakirin. Ne wilo ye Qendê Çûkan?

Kund car din da xwe bo bi axivê.

Siltan rê nedayê.

Bi zirt gotina dawî got:

–Divê çûk teva bên. Divê bên!...

Kund bi dengekî nerm û hêdîka:

–Wê teva bên Siltanê min. Lê Siltanê min niheqiya li min dikê. Ez bendê Siltanê xwe me, ne kesê wan galgala me. Şahmaran dostê min e, lê ne Siltanê min e. Ku tiştek di navbera wê de çê bibê, ez û tuxmê xwe hevalbendê Siltanê xwe ne. Min ji ciwamêrê Şahmaran hêvî kir. Wî jî, ji Siltanê min hêvî kir.

Dilê Siltan bi van gotina xweş bû.

Ne da der.

Kund tê anî der.

Gotina xwe domand:

–Bere dilê Siltanê min di cî de bê. Tiştek xerab neyê ber dilê wî. Hêvîyek me li cem Siltanê me heye. Serê me, dilê me Siltanê me ye, ku ew hêvîya me nekê cî de, hew qedandin û bawerî li ser rûwê erdê di mînê.

Siltan bi hêrs:

–Wê çawa bê?... Wê çawa bê?... Weke ku min ferman dayî!...

Kund gotin ji devê Siltan girt:



www.arsivakurd.org

–Siltan tu wî, ferman karê Siltanê min e. Ferman li duv fermana din tê.

Berî kû Siltan bersiv bidê, Kund car din gotin domand:

–Ev qelandina me ye. Pirtikandin qelandina tuxmê çûkan e Siltanê min. Bere qelandina bendê Siltanê min ne bi destên Siltanê min bê.

Siltan kenî. Di kenê wî de hêrs hebû.

Bi kenê xwe re:

–Bê xelat!... Na xwe ez ji qotikê xeraptirim?

Kund qamekê hilçenî.

–Haşa Siltanê min haşa? Gotinê min şaş neyên fam kirin. Siltan tu wî, gere ê di dawiyê jî bi fikirê tu bê.

Siltan car din hat di serre sekinî.

–Tu bêje wê çawa bê? Ev sedem wê çawa safî bibê?

Kund degel bû:

–Çawa bêjim Siltanê min? Ez bendê Siltan im, gotin li min na kevê, ez hêvî dikim.

Siltan gotina xwe ducarî kir:

-Bêjê, bêje!... Tiştek, çareseriyêk di wî serê te yên mezin de heye.

Kund qeherî:

–Serê min mezine, lê pirr cara bi kêrî Siltanê min hatiye.

Siltan:

–Rast e, rast e!... Lê niha wekî din mijul dibê.

Kund nêrî ku bê xêr e!...



www.arsivakurd.org

Ya rastî ji her cewibandinê çêtir e.

Rast û rê bêjê, bê çûkan qîma xwe pê aniye. Bere mezinatî car din ya te bê. Xwe bê silûk meke. Xwe hemberî bendê xwe biçûk neke. Ya duduwan jî, xêrxwaz û terefgîran bêjê. Sêyemîn jî, telaqreşiya Key Belkîs bênê ziman. Berî niha bi ser vê sedemê de çû. Name ya Şahmaran jî, sedem vekirî anî ziman. Dabaş bi rewşeke mînak danî meydanê. Lê Siltan Silêman ne diva bû fam bikê.

Siltan qet deng nekir. Ne kire dabaşa axaftinê.

Kund di dilê xwe de got:

–Divê ji devê min agahdar bibê. Sedem ev bê jî, divê ez bi xwe bêjim. Lê heye li tilê wî bikevê, di nava vê qehrê de min teslîmê hefrîtan bikê. Min bikê hevalê Beytik, yan jî hevalê Çilê.

Kund qîma xwe bi hevaltiya Çûkê Beytik dianî, bi ya Çilê ne tanî.

Çavên wî tejî av bûn.

Car din di ber xwe de:

–Ez pêwistî gotinê me. Hatina min î dîwanê jî ev e. Qenc bikevê, xerab bikevê!... Qencî û xerabî birayê hevûdin in. Kesê xerabiyê nedê ber çavên xwe nikarê qenciyê jî bikê.

Siltan ew ji nava xeyalan şiyar kir:

–Qey tu na axifê? Te zimanê xwe qurpand, çi ma?

Kund:

–Siltanê min rêya axaftinê ji min re ne hişt, heya ez bi axifim.

Siltan:

–Bêje!... Tu ji bo ku bêjê hatiye vir. Divê tu çareseriyê jî bibêjê.

Kund:

–Rast e!... Ez ji bo dexaletê hatime dîwana Siltanê xwe. Bo çûkan teva!... Bo bendê Siltanê xwe teva!... Min xwe avêtiye tor û bextê Siltanê xwe. Gere Siltanê min qerareke xêrê bidê.

Siltan:

–Min qerara xwe da ye.

Kund:

–Ezbenî serî, qerara te li ser serê me û bavê me. Helbet tê qeraran bidê. Qerar karê siltanê min in. Pêk anîn karê bendê Siltanê min in. Doh, pêr te yek da, îro tu karê yeke din bidê.

Siltan bi hêrs bû, sekinî, di ber xwe de:

–Ez xwe li derewê bi qelibênim? Çawa, Çawa?...

Kund bi zorê dengê wî kir.

Kund jî bi dengekî nizim:

–Haşa Siltanê min. Rê û şivîle hene!...

Siltan car din di ber xwe de:

–Çi rê?... Çi şivîle?...

Kund:

–Bere hekîmek herê li birîna Key Banû ya min bi nêrê. Wê derman bibêjê, ev rêyek bê gazin û lom e.

Siltan:

–Çima hinek ji çûkên din jî nayên ku em ve sedemê di navbera xwe de safî bikin?

Kund, bi kêf û degel:

–Siltanê min, xilbeyiya çûkan xwe da ne rex



www.arsivakurd.org

Çûkê Beytik, em bikin nekin bo pirtikandinê kes xwe nadê pêş. Em li çareserIyek din bi gerin.

Siltan bi tirs:

–Ev hejandina seltaneta min û kûrsIyê min e.

Kund, destê xwe hejand:

–Ezbenî serî wilo ne fikire. Tu Siltanê cîhanê tevayî. Wilo bike ku her kes bêjê her bijî Siltanê min.

Siltan Silêman, ji ya xwe ne hate jêr:

–Qendê delal, bere hin ji wan bên xwe bidin pirtikandin. Bo gotina mi jî cî bigrê. Na xwe!...

Kund peyva wî ji devê wî girt:

–Ezbenî serî, tu Siltanê cîhanêyî, tu pîrozIyê xwedêyî. Tu ne bazirganî, bo tu bazarê bikê. Va Çil hat, heya niha pirtikandine jî, lê ku ne pirtikandi bin hê baştir e. Bere ev bibê sedema veger û rakirina leşkerê li Newala Mîruwa. Kes wê li ser teslîm bûna Çilê bi axivin, heya hekîm herê li birîna Key Belkîs bi nerê, dermanekê din, çareseriyek din bibînê. Hinga safî kirin hêsanî dibê. Bendê siltanê min teva wê bi dad û dadgeriya siltanê min xweş bibê. Siltanê min wê kertekî bikê situwê Şahmaran de jî. Ber qasidê wî niha gihaye cem, gotinên te jê re gotine. Gotinên te li dîwana Şahmaran bên dikirandin wê li cîhanê teva bela bibin. Berî ku gotin ji devê biyaniyan bê bela kirin, tu leşker bikişîne.

Kund diva bû Siltan bi gotinekê, bi karekî pêwistî dagera fermanê bikê. Gotin û kirin bela bibê, Siltan hew dikarê tê vegerê.

Serê sibehî, bi roj hilat re Çûkê Beytik rabû,

hate devê qulikê. Guhên xwe pêl kirin. Bû taştiya pala, hefrît li devê Qesrê ber bi tewlê bezîn. Dengê xwe li seyis û qerqaşan kirin. Hesp dane hazir kirin.

Heya hesp hazir bûn, li devê derî ji hev re di gotin:

—Siltan Silêman ferman da, bo leşker ji Newala Mîruwa rabê.

—Çilê xwe teslîm kir heya kû ev ferman da.

—Bi teslîm bûna Çilê gere ev ne kiribane.

—Gere ewê din jî teslîm bûbane.

—Çil bi firê hat, şilp zelût ji qesrê derket, di ber anîşk û dîwaran re, bi dizî vegeriya.

—Di girî!... Li nav serê xwe dida!...

—Qenc pê hat, dev jê ber de, xwezî ewê din jî hatibane.

—Ew çûkên din jî hatibane, heya Siltan ferman dabane, emî wan safî bikin.

—Teva sucê Kund e!...

—Ne bes ê Kund bi tenê ye!...

—Kî din?

—Kesî din ne hatiye dîwanê.

—Ma hewceye ku bêne dîwanê?

—We kengî Şahmaran li dîwanê dîtiye?

—Şahmaran çima?

—Ew jî li ser çûkan xeyidî.

—Na bê?...

—Bû çû!...

—Siltan bi gotina wî di fermana xwe vegeriya.

—Waaaa!...

—Lêêêê!...

X X

X

Çûkê Beytik bi wan galgalên navbera hefrîtan teva agahdar bû. Ji kêf û eşqa ew bû ku dilê wî ne sekinî. Di cihê xwe de xwe hilda, li erdê da. Raqisî!... Xwe hilda li erdê da. Ket û rabû!... Ket û rabû!... Zîtirk dan!... Bi kotek xwe digirt. Dilê wî dixwest. Deng bikê!... Bakê!... Qîra bidê!... Wesif û pesin bidê!... Tejî dibû, vala dibû!... Dengê xwe bi Cîhanê teva bixê. Şabaşa bo Qendê Çûkan Kund bidê. Şahiya dilê xwe agahdarî merivan teva bikê. Şabaşa heya bi Çiyayê Bagokê, payîtexta Şahmaran bidê. Dengê xwe bigihênê Çilê. Nîv pirtikandî bê jî, bêjê, bi reve, bêjê, xwe ji destên wan hova xelas bike. Tê poşmam bibê. Piştî pirtikandinê fêde nakê, tu çi bikê hew xêr dikê. Xwe nede pirtikandin. Emanet û qîyamet!... Biner ha!... Biner ha!... Vê bi xwe neke!... Tebayî gelê xwe be!... Bi kuştin bi hiştin tebayî gelê xwe be. Mirin mirin, mayin mayin, berxwedan berxwedan!... Şer şer!... Aşîtî aşîtî!... Heyf û mixabin!... Mixabin, çû, filitî. Çil heya sax e, bi xwe ve, bi tuxmê xwe ve bû girtiyê şev û tariyê. Xwe bi destên xwe kuşt. Tirba xwe bi destên xwe kola. Ne



www.arsivakurd.org

bes tirba xwe bi tenê, tirba zar û zêçên xwe, nebîçirçirkên xwe teva kola. Teva bi saxîtî xistin tirbê de. Di nava reşên di nava tarîyê de veşartin. Heya roja qiyametê, hew rûwê Şeşimstan yê bi xêr û bêr dibînin. Tav li wan bû hesret. Roj li wan bû hesret. Gera nava kes û kusan, gera nava dar û deviyan, nava bexçan, rez û werzan, seyrana bi heval û hogiran re, ref û nêçîra bi şan û şeng bû hesret. Çil û tuxmên xwe bû ne malê şevê. Bû ne malê reşê. Bû ne malê tariyê. Bû ne malê qul û qewêran. Bû ne malê nawîs û şikeftan, xeşîm û xirrêman, xerabcih û berihan. Mixabin!... Heyf û mixabin!... Sed mixabin!...

Ji şahiya dilê xwe hew dizanîbû çi bikê.

Herê devê qulikê, bangî hefrîtê zîndanê bikê, wan agahdarî mizgîniya xêrê bikê. Metroziyên xwe bi wan bikê. Bangî girtiyan bikê, dilqewîniyan bidê wan.

Bêjê!... Bêjê hey bêjê!...
Bêjê û bi belênê!...
Bi dengekî pirr bilind!...
Bakê!... Bakê hey bakê!...
Bakê û bi welênê!...
Bakê û bêjê: Berxwedan bingeha jiyanê ye!...

Bakê û bêjê: Ber xwe bidin!... Gidî li ber xwe dest hilênin!...

Qet û lilleh xwe teslîm nekin.

Roj wê bê, gunehkariya kesî, zilm û zordestiya kesî ji wan re na mênê.

Ku ew kes Siltan Silêman bê jî...

Jêre na mênê...

Di nava wê şahiya germ de, hate heya bi devê qulikê. Li hindirûwê zîndanê nêrî. Girtî di halê xwe de, her yekî li deverekê melisî bûn. Lik-lika hefrîtan bû. Di kenîn, metroziyên xwe dikirin. Hayê wan ji bayê felekê tune bû. Di kar û barê rojê de, di hûnerê zorê de xwe hûnda kiribûn.

Vegera!...

Ewder ne cihê wî bû.

Jiyana ciwanik du gava jê wêde ye.

Berepaş, ber bi jiyana ciwanik vegera.

Hate paşiya qulikê.

Cîhana gewrik hemberî wî bû.

Di girtiya fikirî. Dilê wî şewitî. Pêtên agir bi ser dil û kezeba wî de hêrivtin.

Jiyan hewqasî nêzîkî wan e, destên xwe dirêj bikin wê zemt bikin. Mixabin, hewqasî jî dûrî wan e!..

Cîhana gewrik, bi wê tevgera geş û germ du gava dûrî wan e. Gava pêşî na, ya duduwan wê bikevine nava wê de. Mixabin, hewqasî jî dûrî wan e.

Jiyana ciwanik, bi rewşekê xwe li merivan di pêçê, cîhana gewrik, bi rewşekê xwe li merivan di pêçê!... Her yekî ji hêla xwe de, bi awayekî germ û pirr şêrîn. Çawa xwe di pêçin? Merivan çawa bi xwe ve girê didin? Çawa girê didin? Çawa xwe hewqasî şêrîn û delal dikin, nayê gotin, nayê wesifdan.

Nêrî!... Li cihê ku hefrît lê, çavên xwe gerand.

Çûbûn!... Temterûs li wandera nebû.

Çavên xwe qenc gerandin, pêjinî. Benderih ne dît, pêjna kesî jî nekir.

Da hişê xwe. Gere Kund, deşta Harranê, xwişka heft bira xelas kiribê. Hefrîtên ber bi Newala Mîruwa çûwî jî, gere ji bajêr derketibin. Bi revê, bi reva wî agahdar bibin jî, hew xêr dikê. Heya Siltan Silêman fermanê bidê, qasidan bi rê bikê; leşker jî wê kar bibê, dest bi vegerê bikê, Kund jî wê mizgîniya xêrê bigihênê çûkan. Cîhan wê ji sedemê agahdar bibê. Veger nema!... Hew di karê. Hew dikarê!...

Xwe li erdê bixê, bang û hawar bikê, tevgereke nûh bikê, berê leşker bidê ser çûkan jî hew xêr dikê. Çû, ji destên wî derket. Hew dikarê!...

Ma ew!... Divê ku ew jî kêlîkê berî kêlîkê bi revê herê. Xwe xelas bikê!...

Di devê qulikê de xwe hilweşand.

Şewteke dijwar bi lingê wî ket. Bi êşê re qeydûmerbet hate bîra wî. Di cihê xwe de rûniştin. Dilê wî sar bû. Mizgîniya serxwebûn û serfiraziyê, qeydûmerbeta lingê wî, êşa laşê wî teva dabû ji bîr kirin. Birînên laşê wî parîkî baş bûbûn. Lê qeydûmerbetê lingê wî di xwarin. Birîn di ser gûzeka wî de vekir bû. Her cara xwe di lebitand, qeydûmerbetê cihê xwe kûr dikir. Agir bi kevçika dilê wî diket.

Bêhnikeke xweş wilo ma.

Hêdî hêdî rabû ser xwe.

Dêhnê xwe da qeydûmarbetê!... Hûrik hûrik tê fikirî. Çirîskek ronahî di serê wî de pê ket. Kêfa wî hat. Destên xwe palandin. Tayê tevnepîrkê ber bi

xwe kişandin, yeko yeko ji hev vekirin, sisê sisê li hev hûnan û li ser qeydûmerbete qenc şidandin. Heya jê hat girêkên kor li wan dan. Kir ku qeydûmerbet bû parçek ji lingê wî. Lê nikarîbû gava xwe bavêjê. Bo bi rê ve biçê, divabû xwe cotik bi qavêzê. Qaydûmerbetkirî bê jî, çêtire ji esîrtiya reş û tariyê. Heya roja qiyametê qîma xwe bi rêvaçûna hilkûtka cot di anî, qîma xwe bi pirtikandina xwe, bi êsîriya şev û tariyê ne di anî. Xwe ceriband. Perên xwe hejandin. Xwe zer kir. Baş bû. Perê wî jî karê xwe dikirin. Di revê de ew fedîkar der ne dixist. Car din xwe ji cih hilweşand. Ji qulikê derket. Çû wiyalî û vegeriya. Sê cara wilo kir, firî çû der, du-sê gûr dane xwe û vegera, hat kete cihê xwe de. Hin li demedoran di nêrî, hin xwe di ceriband. Cara çara, ya dawî bû, haziriya xwe û çûn û ne hatinê dikir. Rabû ser xwe, car din li dora xwe nêrî, kes nebû. Kir ku bi firrê, ji binê qulikê ve, barên bi hefrîtekî ket.

Lal bû, şelişî, hew dizanîbû çi bêjê.

Heya jê hat kira barbar.

–Çû-çû-çû-kê Be-be-bey-tik!... Ji, ji, ji, zî-zî-zîn-da-da-da-nê baz, baz da-da ye. Baz, baz da ye. Çû-çû-kê Be-Be-Bey-tik!...

Heya jê hat, her du destên xwe bi jêr ve dikir.

Çûkê Beytik li xwe da.

Hin ji tirsa. Hin ji hêbetê barbara hefrît...

Tîr ji kevan derket!...

Deng ji zerikê çû!... Hefrît xurihane ber hêtê

zîndanê. Hatin hey hatin!... Ewder, serdor, kolan û meydan tejî hefrît bûn.

Heydênî bi zîndanê ket.
Heydênî bi Qesra Siltan Silêman ket.
Bajar teva rabû ser xwe.
Kes û kus xurehane kolan û meydana.
Tevgera têr galgal û lom dest pê kir.
Her kesî, ji dehma xwe de gotinek got.
Hina bi dizî, hina hişkere.
-Kî bû, çi qewimî?
-Çi bû, çi kiriye?
-Kê baz da?
-Di bêjin ji zîndanê yekî baz da ye!...
-Ma rast e?...
-Kî karê ji wê zîndanê baz bidê?...
-Bawer nakim!...
-Gelo ew kî ye?
-Çawa bazda ye?
-Di bêjin Çûkê Beytik e!...
-Xwe li nava hefrîta daye!...
-Her yekî bi deverekê de daye erdê!...
-Xweş mêranî kiriye!...
-Gelo rast e!... Revî ye?..



www.arsivakurd.org

X X

X

Galgal û peyva li ber derî û kolan û çarçiyan domand. Şev û rojê kes ne çû mala xwe. Kom bûn ha kom bûn. Şev hat kes neçû mala xwe, bû sibeh kes neçû, roja din jî kes neçû mala xwe. Kom bûn ha kom bûn!... Galgal û peyvan li ber derî, kolan û çaryanan domand. Hat li qunax û xanûmanan sekinî. Kom giran bû. Xilbe bû!... Kom bûn ha kom bûn!... Gotin ha gotin!... Bakirin ha bakirin!... Çiqasî zêde bûn, hawqasî axaftin û gotin zêde bû.

Çiqas kom bûn hewqasî gotin û axaftin zêde bû. Kom hin bi hin ber bi zîndanê hat. Hatin, hatin li hemberî zîndanê sekinîn. Mil dane hevûdin. Kom bûn û mil dane hevûdin. Hefrîtan Siltan Silêman agahdar kir. Siltan Silêman derkete devê qesrê, li qerebalixê nêrî. Himmên û gummên ji derya merivan dihat. Himmên û gûmmêna têr merem bû. Nêrîna têr xerez û heyfê bû. Li wezîrê xwe zivîrî, lê nêrî. Bi nêrîneke têr pirs!... Wezîr bi çavên vala lê nêrî, bê bersiv û bê çareserî.

Wezîr devê xwe xiste guhê siltan de:

-Bere delêlî derkevin nava bajêr!... Bo wan agahdarî fermana duduwan bikin. Lê, pêlên vê qere-

balixê wê bi ser qesrê de bên. Em teva dibinde di mênin.

Siltan jî guhêxwe da galgalên derya merivan.

-Çûkê Beytik ji zîndanê revî ye.

-Çawa, çawa revî?

-Ji zîndanê çawa derket?

-Nabêêê!...

-Bûûûû!...

-Ecêba kes nedî ye!...

-Ecêb ne ecêb revî!...

-Revî çû!...

-Sed car aferim jê re!...

-Sed carî bijîîîî!... -Ew jîîî doza wî jîîî bijîîî!...

-Xwe xelas kir!...

-Qenc û xweş kir!...

-Heya kengî zor û zilm?...

-Heya kengî?...

Ferman da, delêlî berdana nava bajêr û kes û kus ji azadiya çûkan agahdar kirirn.

Siltan Silêman keserek ji nîvê kezeba xwe berda.

Bi kesera xwe re:

-Beytik!... Beeyyttiiikkk!... Lingek ji kursiyê seltanetê şikand...

www.arsivakurd.org

X X

X

Beytik dizanîbû wê Hefrît kevine duv de. Siltan bêjê ne bêjê ferq nakê. Wê kevine ser şopa wî. Hefrît bêbavê Şamê ne!... Dizê Misrê ne!... Pêxwasê Amedê ne!... Teşqelçiyê Sêrtêne!... Li hember kesan di gotina Siltan de ne, wekî din biya xwe dikin. Seltanat di destên wan û Key Belkîs de ye. Asil ew in, çi bikin, çi bêjin weke wan e. Girtina wî û kûştina wî wê bibê yek. Wê carê avê lê na vexwin. Cara dawiye. Xelas bibê, baş e, xelas ne bê, çû. Mirina wî ye. Mirinek ne hêsanî jî. Têr derb, têr birîn, têr merez, têr galgalên qirêj, gemarî û êşa têr merem. Mirineke têr gemar, lewitî!... Heya jê hat lezand û şopa xwe hûnda kir. Fetil da ne xwe. Anîşk li xwe badan. Zinar û mesîl dane duv xwe. Çiya û diyar xistine bûwara xwe. Gih xwe ber bi azman di hilda, gih xwe diberda jêr, di ser rûwê erdê re di çû. Di kete nava cok û xetê cot de. Di kete nava sitirî û gutîna de.

Xwe ber bi çiya kişand.

Warê berxwedanê!...

Hefrîtên ji xwe qayil û li Çûkê Beytik bi merem dane duv.

Bûne neh-dẹh qefl û li rê û şivîla bela bûn.

Ha li vir ha li dera din, di ser Sinceqê re pêjna wî kirin. Nêta Beytik di ser Çiyayê Bagokê re herê, xwe bigihênê Çiyayê Cudî. Keliha serhildanê!... Ku bêhn lê teng bibê, rê ji ber bê girtin jî, xwe bavêjê tor û bextê Şahmaran. Sitara meriv, rawîran!... Sitara jiyana bi rûmet û xîret!...

Hefrît, ji dûr ve dîtîn.

Zanîbû hefrît jê xurttirin. Wê zu bigihinê de!... Ku ne bi xap û rîpa bê ji ber wan xelas nabê. Xwe hilda û berê xwe da Şeşimstan. Siltanê şemiyan!... Ku roj bi navê wê tên nas kirin. Ku bi dana wê, bi rehm û xêra wê têr ronahî dibin. Hawar kire Şeşimstan. Hêviya Beytik ma bû nav pêtên ronahî û sitara wê. Çavên xwe korîk kirin û rast û rê li nava çavên Şaşimstan nêrî. Bendê ku dikaribê rast û rê li nava çavên Şeşimstan bi nêrê, ku çavên wî li çavên Şeşimstan ket û miç nekê, ne kût-kûtênê, di nava xêra wê de dimênê. Heya kûrê kûra di bin himbêza dayîka xêra, dayîka ferxa de ye. Dergehê xêra jêre divebê. Çi bi xwazê, çi daxwaza wî hebê tê cî. Na tune ye!... Beytik ji şewq û şemala Şeşimstan, ji ronahî û rengên çavê Şeşimstan gêj bû. Li ber xwe da, çavên xwe ne revandin, miço-belo ne kirin. Heya jê hat çavên xwe vekirin û li nava çavên Şemîstan nêrî. Ne pirr di domênê. Ku te kêlîkê xwe girt, ew dijwariya çavên Şeşimstan di çê, nermayî ya xemla rengan tê. Te di pêçê, te di hilgirê, te di parêzê.

Şeşimstan li ser textê xwe pal da ye. Li bûka xwe cîhanê di nêrê. Li gorî dilê xwe xemilandiye, navê ku çavên xwe jê qut bikê. Şax û perên xwe bi ser de pêl kirine. Tîrêj li duv tîrêja din bi ser de reşandine.

Beytik car din hawar kire Şeşimstan.

Hêvî kir û beland.

Qurban hejmartin. Gotin û galgalên kevnare sipartine hevûdin.

Qewl û duayên şêxanî xwendin.

Hefrîta nêzîkayî lê kir.

Pêşî hawar û qîrên bi Derya Sipî ket. Pêla da ser hevûdin. Xuşxuş û himmêna pêlan kete ser rûwê stana Asya. Belabû!... Hat li serê çiyan sekinî, çû deşta Harranê bela bû. Hat giha Sinceqê, mezin bû, giran bû, kete nava rewa axê de, kete nava şilaya avê de, bizir da, kat da, bi şax û per bû!..

Sed û çil tovî bû.

Bû heydênî!...

Kete nava meriv û rawîran de!...

www.arsivakurd.org

X X

X

Şeşims!... Şeşims!... Şeşims!...
Şeşims!... Şeşims!... Şeşims!...
Min ava kir!... Tu bi xêr û bêr bike!...
Min tevger kir!... Tu bi haveyn û kel bike!...
Şeşims, Şeşims!... Şeşims!...
Bila destpêk û dawî navê te bê!... Yekem navê te, duyem navê te, sêyem navê te, çarem navê te, pêncem navê te, şeşem navê te!...
Şeşims!...
Xasê nava dilê Qubehê!...
Ku bi navê min di çirisê serê sibehê!...
Ya dawî jî bila bara min bê!...
Rabe nobedarê kaîm!...
Dest pê bike!...
Ez bi ter her daîm!...
Avaniyê bi tevger bike!...
Ala jiyanê ber bi ba bike!...
Bûka gerdûniyê bi xemle bike!...
Dergehên Ganzînayî Zerzemîn veke!..
Veke û kar bike!...
Gavek li paş, yek li pêş!...
Têhna kûra dilê xwe der bike!...



www.arsivakurd.org

Ax û avê sar û germ bike, tîrêjên xemla xwe zer bike. Bo gerdûna vala bi avaniyek geş, reş û beş bikê.

Valayî tuneyî ye!...
Pûç e!...
Xela ye!...
Cela ye!...
Avabike û rizgar bike!...
Rabe!...
Daw û dêlên xwe berbide...
Min bi dar da!...
Min têr ger da!...
Min ax û av dà nav hev da!...
Min hilda û daxist konê şîn bi ser da!...
Tu rab e cîhanê bi xemilênê bi delalî!...
Keda xwe di ser ke bi helalî!...
Kar û bar tê de bike da berbar bibê bi zelalî!...
Yezdan î pak î dilovan û mehreban!...
Tu rêberî!...
Ez bi terî!...
Tu hed û sed û med î!...
Ez xeml û bejn û ked î!...
Ne xwarin hebî!...
Ne vexwarin hebî!...
Tu çi bî ez weke tebî!...
Tu çi dibêjê!...
Ez her û her bi tedî!...
Tu yê her û herî!...
Berî not û neh hezar salî!...
Tu hebî!...

Ez jî li têbî!...
Bo her ava bikim dest û gav û serî!..
Bi xemle bikim deşt û berî!...
Yezdan î pak!...
Te bar da ser mil!...
Barekî pirr giran!...
Ferece bide bo dil nebê wêran!...
Bo destpêkek têr gorî û heyran!...
Bo tu bikê xweş temaşa û seyran!...
Yezdan î pak î mehreban û dilovan!...
Hawar û mecala erd û azman!...
Hertim tuwî dawiya aman!...
Ez agir im, zor im, hêrs im!...
Te got, ez pêk tênim!...
Ji kûra dilê xwe didim xalek!...
Dawî gunehbar nebim?
Ya Yezdan î pak!...
Tu heyî ez heyî!...
Tu tuneyî ez tuneyî!...
Lê her ez û tu di ber hevî!...
Dawî gunehbar nebim?

Yekem car, Yezdan li sirrê xwe î xoş awistî. Rahêşte guharekî sipî da Şeşims.

Ya Yezdan î pak î dilovan û mehreban...

Te navê xwe yên şêrîn da min. Min rahişte guharê sipî kire xelek, kire teliya xwe. Teliya min ma di bin bar de. Ew bar li ser dilê min e!... Ew bar li ser çav û gavên min e!...

Ew durrê sipî!...

Bû mohra kahniya jiyanê!...
Jiyan navê min e!...
Ew wê bibê xalek!...
Bo bidê mal û mewdanek!...
Bo bidê cins canek!...
Ew guharê durra sipî!...
Bû barê qelenderî!...
Êzdahî da!...
Êzdahî got!...
Got û da!...
Ew gotin û dan!...
Di dilê min de bû bangîwarî!...
Divê kar pêk bê bi her nîrx û hûnerî!...
Herî hayî herî hayî!...
Ez hazir im!...
Cîhanê bi xemla xwe didagirim
Bo avanî!...

Nava gerdûna vala berbar bikim. Rizgar bikim. Her tim sar û germ bikim. Her çar rexê wê tevger û binbar bikim. Geş û reş û beş bikim...

Yezdan î pak î mehreban û dilovan...
Cîhan ava kir!...
Bi av û ax kir!...
Bi deşt û mesîl, bi diyar û çiya kir!...
Têhn û nîgara ronahî bi ser danekir.
Yezdan runişt û li xwe rexne kir.

Yezdan runişt û punijî!... Wext û dem tevger nekir!... Kin kir, dirêj kir fêde nekir!... Qalin kir, zirav kir xêr nekir!... Hûrik kir, gir kir çare nekir!...

www.arsivakurd.org

Bangî Şeşims kir.
Şeşimsê navê duyemîn!...
Galgal û peymane kir!...
Ya dilê xwe bi der kir!...
Ne kin kir, ne dirêj kir, ne kêm kir ne zêde kir!...
Bo delalî û wensa cîhanê têhne kir!...
Bo cîhanê got, bi reng û nîgar û tevgera rawîr û merivan got û temaşa kir!...
Şeşims guhdarî kir û deng nekir!...
Ji gunehbariya dawî tirsa devê xwe venekir!...
Yezdan got:
-Şems, çavên xwe bel bike, dergehê Ganzînayî Zerzemîn veke!... Têhna kûra dilê xwe zer bike.
Şeşims deng nekir...
Yezdan got:
-Hûnerên xwe bi der bike, keda xwe di ser bike...
Şeşims deng nekir...
Yezdan got:
-Şeşims min cîhan ava kir, bi ax û av kir, nizim û bilind kir, tu têhnê bide xemle bike...
Şeşims deng nekir...
Yezdan got:
-Têhne bide ax û avê bi haveyn bike...
Şeşims deng nekir...
Yezdan got:
-Têhne bide, haveyn tirş bike, can û canan şiyar bike...
Şeşims deng nekir...
Yezdan got:



www.arsivakurd.org

-Şeşims, têhne bide roj û wextan bi nav bike...
Şeşims serê xwe rakir, dengê xwe kir...
-Yezdan î pak î mehreban û dilovan!... Roj hat û şev pê re!...
Yezdan got:
-Bûka delaliyê di nava gerdûna vala de hate dalaqandin.
Şeşims got:
-Ya Yezdan!... Ber çi nav yê min e?...
Yezdan beşişî û got:
-Nav navê te ye!... Herî hayîî, min got û te deynekir Şeş car qediya... Herî hayîîî!... Qey tu nizanî ez têhna kûrê bi derim. Ez û te bi hev re heyî!...
Şeşims got û beland...
Yezdan î pak...
Tu her meferî!...
Ez her di ber tere me bi seferî!...
Tuyî her û herî, ez her û her bi terî!...
Tu li kursiyê jorî, ez dadikevim taqê jêrî!...
Herî hayî, herî hayî!...
Tu babî pîr î!...
Xwediyê darq û tac î!...
Ez bû me xwedayê qurban û bac î!...
Roj wê bê ez ê bibim hêvî û banga hawarî!...
Şeşims!... Şeşims!... Şeşims!...
Min pirs kir, te got pirsên bi xwe bawerî?...
Şeşims got:
-Ya yezdan î pak!... Rast e, min dey nekir û got gotinên bawerî... Ji te xef nabê!... Merivên şîrê

xaf bi mijê dil sar e, rawîrên lal û ebkem dar e!... Di avabûna cîhanê de wê navê min hildê, di ronahiya şevê de wê agirê min parêzê û her dadê, di wextên salê de wê şaş û gêj bibê, rê nabê!... Wilo jî gunehbar dibê!... Gunehbar!...

Yezdan got:

-Destpêka bi bawerî, tê de hebê ked û hûnerî, tuccar nabê gunehbarî!...

Yezdan î pak î dilovan û mehreban:

Tevger giran e!...

Jiyan ciwanik e!...

Cîhan gewrik e!...

Evîndariya bendan nazik e!...

Dilovaniyê ranagirê!...

Qinyat nayê, dil û hewn danagirê!...

Yezdan got:

-Şeşims ew jî wensa me ye!...

Şeşims got:

-Ya Yezdan î pak î dilovan û mehreban!... Te got û min weke dilê te kir.... Heft kûrên Ganzînayî Zerzemîn pêxistin!... Heft kelihên dilovanî, bi heft surihên evîndarî bi karxistin!... Heft gavên mirovanî avêtin!... Da pîrê çil pîran parezgehê bi navê Yezdan î pak î dilovan û mehreban bi rawistin!...

Yezdan got:

-Avakirin ne bes e, domandin hêja ye!...

Şeşims got:

-Jiyan kurê min e, cîhan jî bûka min!...

www.arsivakurd.org

X X

X

Cîhan bûka Şeşimstan e.

Jiyan jî kurê Şeşimstan e.

Jiyan li ber dilê bav şêrîn e. Bi wê pêwanê pirr hej ji cîhana gewrik dikê. Dergehê xêrê li ber vekiriye. Xêr û xêratên mezin bi hezar û hin texlîtî bi ser de di reşênê. Tiştekî jê kêm nahêlê.

Her dem û wext cîhanê bi rawşekê di xemilênê.

Beharê bi şiklekî, havînî bi şiklekî, payîzî bi şiklekî, zivistanî bi şiklekî!... Her şiklê xemla cîhanê bi hezar lewniye. Şîn e, şînê ocaxiye; kesk e, keskê zeytûniye; sor e, sorê sosiniye, sorê mîraniye; zer e, zerê gewraniye; reş e, reşê tariye, reşê hewraniye; gewr e, gewrê evîndariye; xemrî ye, xemriyê dilovaniye; qehweyî ye, qehweyê delaliye; sipî ye, sipiyê rengiye, ji rudêna Şeşimstan pêketî, gerdûnî ye!... Bende jê têr nabin. Bi fêkî ye!... Bi teng û bertangê şemaliye!... Şêrîn û meyxweşiye!... Tehl e, tehlîşk e, tûj e, dijwar e, tirş e, radîşo ye, mirr e, germ e, sar e!... Lê her xweş e. Her xweş û geş e!... Felek çiqasî tov û bizrê reş û nexweşiyê bi reşênê jî, dilxwaziya merivan bi jiyana cîhanê hunda nakê. Şeşimstan ji cihê xwe qeliqî... Dengê Beytik kir.



www.arsivakurd.org

Awira xwe berda nava çavên wî. Nêrî ku çavên Beytik bêhtir vebûn. Hawar dikê, hêvî dikê. Hêviya wî qebûl kir. Di cih de bersiv da. Daw û dêlên xwe bi ser bûka gewrik de hejandin. Pêtên rengîn bi ser hevûdin de reşandin. Dayîka mirada ye!... Kesî bê dan û bê qismet nahêlê. Hêviyên kesî hûnda nakê. Sitara bêçaran e. Hawara ketî û şikestîka ye. Hawara bawî û tawiyan e!... Çav û gavên ji rê ketiya ye. Xwezî li cem Şeşimstan tune ye, her hêvî ye. Hêvî navê wê ye!... Bingeha comerdiya xwe li ser hêvî û avakirinê daniye. Dergehê hêviyê her tim vekiriye. Derdan bê derman na hêlê. Kesî di reşê de, kesî di devera teng de na hêlê. Rê ye, şivîle ye!... Qut e!... Mewdan e!... Zal û zewade ye!... Qunaxa jiyana berdewam e. Bo navê jiyanê, kesê hawar bikiyê de, bê bersiv na hêlê. Dayîka jiyanê ye. Bêhtir ji her kesî jiyan li ser dilê wê şêrîn e. Bi navê jiyanê di hilê, bi navê jiyanê diçê ava. Bi navê jiyanê çavên xwe di vekê, navê jiyanê gavê di avêjê. Çirisandina çavên Çûkê Beytik, ew hawar û gazî, ew hêvî û neçariya dijwar dît. Şeşimstan çavên xwe xemiland, ew xeml teva ber bi Beytik dirêj kirin. Tîrêjên xêrê lê pêçan, kire nava reng û germa dawûdêlên xwe de û ber bi xwe kişand. Ji rexêkî ve jî, tîrêjên dijwar berdane pêşiya Hefrîtan. Tîrên rojê bi ser wan de reşandin. Kor û kûloke kirin. Rê li ber wan girt. Agir û şewata têr hilm û bixûr bi ser wan de rijand. Hilm û bixûra fetisandinê xwe li wan pêça. Hefrît li hevûdin qeliptin. Şaş bûn, lal bûn, kerr û gêj bûn. Kor

bûn, şelişîn. Ser hev û bin hev e ketin. Şeşimstan daw û dêla xwe kire pêpelûk ji Beytik re. Perda jiyanê avête ser. Di nava dêliya ronahiya têr reng û ber bi xwe kişand.

www.arsivakurd.org

X X

X

Qend, salifa Siltan Silêman û Çûkê Beytik xelas kir. Li zarokên dora xwe nêrî. Devê teva mabû ji hev. Çavên wan fere bûbûn. Li devê Qend di nêrîn, her galgala ji nava lêvên wî derdiket di nava mêjîyê xwe yên hêj ne sitewehayî de di cemidandin. Ji dil û mirada li salifê gûhdarî dikirin. Her yekî ji wan bûbû Çûkê Beytik. Dilê wan di sebeta sînga wan de mezin dibû. Hêrs dihate wan. Bi Çûkê Beytik re eziyet û dilêş di dîtin, pêre hemberî hefrîtan derdiketin, pêre di firîn, pêre diketin qulûqewaran de, pêre di revin xwe di hilandin, pêre şerr û ceng dikirin. Devê Qend qenc ziwa bûbû. Zimanê xwe li dora lêvên xwe gerandin. Têhna wî ne şikest. Tifa xwe di devê xwe de da hev. Tif jî di devê wî de ne ma bû. Zimanê wî bi şikefta devê wî ve zeliqî. Destê xwe dirêjî sewîlkê avê kir. Ber bi xwe kişand. Rahişte zerikê, av berdayê.

Li zarokan nêrî, tas di dest de:

–Kî ji we wê avê vexwê?

Zarok teva tî bûn, lê kesî deng nekir û destê xwe dirêj nekir.

Qend fam kir ku qedir digirin, berî wî na vexwin.
–Her bi jîn hûn, xwarin ya mezina, av ya biçûkan!...

Zaroka tiştek fam nekir, li devê wî nêrîn.

Qend gotina xwe vekir:

–Di tola Kurda de, ku xwarin tê ser sifrê, kesên mezin xwe didine pêş, di çine ser sifrê, zarok xwe didine paş. Lê kû av bê, li ku bê, pêşî gere zarok, kesên biçûk vexwê. We fam kir?

Zarokan serê xwe hejand:

–Belê ezbenî me fam kir.

Yên kêleka wî rastê destên xwe hejandin, serê xwe tewand:

–Bi bexşîne Apo, lê ez berî te venaxûm. Şerm e!...

Kenî.

Teva kenîn.

Qend zerik bi ser xwe dakir, du-sê qurt vexwarin.

–Hûn teva mîna avê pîroz û lezîz bin.

Zarokan tiştek fam nekir, lê her dem ev gotin dihata gûhên wan. Dengê xwe nekirin. Qend zerik dagirt û dirêjî ê biçûkê wan kir. Yek bi yek av da wan, heya hemûçkan vexwar domand. Hin zerika avê dirêjî wan dikê, hin pirsa ji wan dikê.

Berê xwe da zaroka hemberî xwe:

–Te çîroka Siltan Silêman û Çûkê Beytik eciband?

Zarok lebitî, singa xwe ber bi pêş derxist, dengê xwe qalin kir:

–Belê Apo, pirr xweş bû. Bi navê Şeşims kim Çûkê Beytik xweş mêranî kir. Ji îro pê de ez hew Çûkê Beytik di kûjim, berê qewsikê xwe hew didimê de. Aha, soz ji te re Apo.

Qend destê xwe li milê wî da, kenî:

-Bijî lawooo!... Xwedê umrê te dirêj bikê.

Zaroka kêleka wî şor ji devê wî girt:

–Pirr kêfa min jî ji Çûkê Beytik re hat. Ezê bes Qijikê bi kûjim, ew xayîn e.

Ê kêleka wî:

–Ez jî ezê Sîsyankê Keçel kûjim. Ew jî xayîn e!...

Qend lê wan nêrî, her du lêvên wî ji ser hev çûn. Taximê devê wî çirisand:

Li zaroka tenişta xwe zîvirî:

–Tu çi dibêjê lawê min?

Zarok, hêj zerik di destê wî de bersiv da:

–Gotina Rastem e, Çûkê Beytik xweş mêr e. Ez jî hew berê qewsikê xwe didimê de.

Nebiyê Qend şor kir:

–Kalo, îcar Çûkê Beytik qeydûmerbetkiriye yan na? Revî çû, dawî çawa bû?

Nebî pirr cara ev salife ji devê kalikê xwe bihîstibû. Dawî dizanîbû, divabû hevalê wî jî bi bihîzin, bo gotina wî rast derbikevê.

Qend bi wê beşûşbûna têr ronahî li nebiyê xwe zîvirî.

–Ezê bêjim lawoo, ezê bêjim!... Sebir bike!...

Ji nebiyê xwe pirs kir:

–Te av vexwar?



www.arsivakurd.org

Nebî:
–Belê Kalo!...
Qend:
–Te çi ji çîrokê fam kir kurikê min?
Nebî, her cara ku kalikê wî salife jêr gotiye ev pirs jê dikir. Wî ji bersiva her car da:
–Kalo Çûkê Beytik mêr e, li ser xwe qebûl nekir. Doza gelê xwe anî ziman. Serkêşiya mafê gelê xwe kir. Xweşmêrê çê ye!... Bo merivan, bo kesên bidest mînak e.
Qend serê xwe hejand:
–Erê lavoo, rast e. Mafê gelê xwe parast.
Sewîlkê xwe danî cihê wî. Li zaroka vegera û salifa xwe domand.
Dawî çawa bû?
Çawa bû?...
Ez çi serê we ne êşênim!...
Gelî xortên delal!...
Gotina dawî pirr li xweşa zarokan çû. Ji xwe ketibûna nava tevgera çîrokê, di nava qewaman de her yekî ji dehma xwe de Çûkê Beytik bûn. Başoke bûn!... Kewê Ribat bûn!... Yekcar ketin darî çavên xwe. Birhê xwe tewandin, çavên xwe tuj kirin li nava çavên Qend nêrîn.
Qend yek bi yek li wan di nêrê û di beşişê.
Salifa xwe domand.
Erêê gelî xortên delal!...
Siltan Silêman hêrs bû. Xwe li erdê da. Car kir!... Bar kir!... Gotin li ser gotina din got. Bêhna



www.arsivakurd.org

xwe teng kir. Di nava dîwanê de rabû rûnişt, geriha, destên xwe hejandin, ferman li duv fermana din da. Zirt kirin. Ehd li duv ehda din xwendin. Li civata dora xwe hilat:

—Ji îro pê de kes ser çûkan tiştêkî hêvî nekin. Tu pirsa ji min ne pirsin?

Di ber xwe de bû min mina wî.

Cîhan li serê min civandin. Bende li serê min kirin kom. Rawîr hemberî min rakirin. Textê min hejandin. Kezebêmin qetandin. Kes hew bawerîyê bi min û gotinê min tînê. Çi fermana ez bidim, derheqa kê de bê wê hemberî min derbikevin. Qedir û qîmet ji min re nema!... Qedir û qîmet ji min re nema!... Bajarê Qutsê bi ser min de xureha. di dem û dewrana de tiştekî wilo ne qewimiye. Ne kesî dîtiye ne bîna ye. Çi tofan rabu!... Gidî çi tofan rabû!... Textê seltanetê ji qurm hejiya. Ev çi tofan bû!...

Civata dora wî nêrî ku wilo çê nabê. Ji hêrsan wê dîn bibê. Ji xwe û mere di ber dilê wî re çûn hatin.

-Siltanê min bêhna xwe fere bike.

-Çûkan teva bi yek darî majo.

-Çûkan teva bi agirê Beytik ne şewitêne.

-Ew yek e, çûk hezar û hin in.

-Xwe aciz neke.

-Duv tiştê bûrî ne keve, li yên mayî bi pirse.

-Tu Siltanî!...

-Siltanê ins û cin î!...

-Îro rewş wilo ye, sibe dusibe çawa dibê kifş

nabê.

-Ne nere li koma merivan!...

-Ne berfa beharan, ne bê serî yên koma meran!...

-Guh nediyê de!...

-Her gotinek ji ê te bi sed Beytikî ye.

-Li wê gorê, gotinên ne baş, ne layiqê devê te ne.

De û de haşt kirin.

Bêhna wî hate ber.

Lê di derheqa Çûkê Beytik te, hişkiya wî domand. Fikrê xwe ne guhert.

Vekirî ji got:

-Bere kes di derheqa sergerdeyê Beytik de tu hêvîyan nekê. Qet!... Qet!... Qet!...

Wezîrê milê rastê nêrî ku Siltan pirr xwe aciz dikê, temenna kir û got:

-Siltanê min xwe aciz neke. Ser yekî sergerde xwe ne qeherê ne, ew mohra li pê çavê wî heya qiyametê hûnda nabê. Ew çi bikê bila bikê. Wi di halê wî de bi hêle.

Siltan ji cih qevist:

-Mohra çi wezîrê min?

Wezîr car din temenna kir.

-Siltanê min, Çûkê Beytik qeydûmerbetkirî revî ye. Kilîta qeydûmerbeta di lingê wî de di binê bîra bê binî de ye. Ev jî nîşan didê ku heya roja qiyametê Beytik nikarê weke tuxmê xwe bi rê ve herê. Divê her du lingê xwe cot bi cot bavêjê, heya dikaribê bi rê ve herê. Ev cezayê wî!... Nebîçirçirkê wî jî wê wilo bi rêve herin. Tu ji min re sax bê!...



www.arsivakurd.org

Siltan kenî.
Bu tiq-tiqa wî û dilşahî ducarî kir:
-Ev cezayê wî!... Ev cezayê wî!..
Dengê kenê Siltan li Cîhanê bela bû.

Ji wê rojê û virde çûk teva azad in. Lê Çûkê Beytik ji teref Siltan Silêman bi qeydûmerbet hat gunehkar kirin, wilo hişt. Ew jî ku bi rê ve diçê, lingên xwe bi cot di avêjê.

Erêê, erêêê, gelî xortên delal, azadî bê bedela giran çê nabê. Bê bez, bê rebenî, bê perçiqandin, mixabin bê xwîn nayê dest.

Û hûn teva ji min re sax!...
Zarokan teva:
-Tu jî sax be Apo!... Her bi jî!...



www.arsivakurd.org



Pirtûk, di hepisxanê de, bi navê
WELATÊ ÇÎROKÊ bi Tirkî hatibû nivîsandin.
Roman e. Hêj ne hatiye weşandin.
Mixabin, teva ji destên leşkerê roma reş
xelas nebû. Hin beşê wê peyda bûn,
mixabin piraniya wê kêm e.
Min, car din ew destnivîsar bi Kurdî nivîsî.
Parîkî ji hev cuda ne. Naverok yek e!...
Cuda bûn, di rewşa avayiya pirtûkê de ye.
Kes, tevger, dabaş yek e!...
**Pirtûk parçek ji efsana (mîtolojî) Kurda ye.**
Heya îro sedema aborî mefera weşandinê neda.
Hêvî ji îro pêde ye. Hêvî tovê jîyanê ye,
hûnda nabê!... Gelê Kurd jî,
di dem û dewrana de hêvîyên xwe,
bo jîyanek azad, serfiraz hûnda ne kirine.
Ew hêvîyên mezin bi salifên
mîna BERXWEDANA ÇÛKAN didan zar û zêçên
xwe. Ev daxwaz û hêvî,
giha **berxwedan jîyan e!...** Heya roja Kurd
û Kurdistan azad bibê jî armanc ev e.

www.arsivakurd.org